# AFIRÎNERÊN JIYANA PÎROZ



Muzaffer Ayata

# AFIRÎNERÊN JIYANA PÎROZ

***"Demeke wiha ye ku diviyabû ji sedî sed gavên diyar bên avêtin… Jixwe şêwazên çalakiyê jî têra bi heybet bûn. Di wê nuqteyê de Mazlûm peyameke. Ferhat Kûrtay, Necmî Oner, Mahmût Zengîn, Eşref Anyik (Çaran) şoreşa alê ne. 14'ê Tîrmehê tê maneya mirov pêvajoyê vediguherîne maratonekê."***

**Muzaffer Ayata**

**WEŞANÊN KOMÎTEYA XEBATÊN ŞEHÎDAN A PKK'Ê**
**2016**

# AFIRÎNERÊN JIYANA PÎROZ

**Çavkanî: "Zindana Amedê/Ji Dîrokê re Rûpelek ji Agir-Muzaffer Ayata"**

**Amadekar: Yekta Şoreş**


**Cihê Çapê: Çapxaneya Azadî**
**Dîroka Çapê: 2016**

**WEŞANÊN KOMÎTEYA XEBATÊN ŞEHÎDAN A PKK'Ê**
**2016**

# NAVEROK…

Pêşgotin.....................................................................................5
Kawayê Hemdem ê Tarîtî Çirand Mazlûm Dogan ..........................9
Kurtejiyana Mazlûm Dogan...........................................................27
Di Tarîtiya Zindanê de Afirandina Berbangê ...............................29
Kurtejiyana Çaran ........................................................................49
Roja Beriya Rojiya Mirinê ya Mezin...........................................55
Mirovê li Salona Dadgehê Bilind Bû: Xeyrî.................................67
Kemal Pîr; “Vê Carê ez ê ji Sedî Sed Bimirim” ............................75
Kemal Çavên xwe Winda Dike.....................................................85
Xeyrî di Hucreya Mirinê de ye ....................................................101
Encamên Rojiya Mirinê ya Mezin ..............................................113
Kurtejiyana Şehîdên Rojiya Mirinê ya Mezin .............................129

## Pêşgotin



"(...)

Eger mirov li ser berxwedêriya zindanê pir zêde bifikire, wê bê dîtin ku xisûsa ev berxwedan ber bi pêşerojê ve tê pêşxistin bûyereke mezin a rêxistinbûnekê ye. Eger em vê pêşketinê di serî de wek xebateke siyasî û çekdarî, bi her cure amûran temsîl bikin, em ê bibînin parçekirina vê xelekê bi esasî derbkirina xedar a despotîzmeke zêdetirî hezar salan e. Û ev tê maneya yek ji van şerên herî mezin li ser navê gel û azadiyê ji aliyê partiya me te qezenckirin jî. Bêguman dîsa di vê mijarê de weke me berî niha jî diyar kir, em kesên berdevkên wan e, eger em vê wezîfeyê wer fêm bikin û bikin ev wiha ye.

Aşkera ye tişta herî rast a di nav şertên demê de em bikin ew e ku berxwedanê hê zêdetir xurt bikin û navbera xwe û şehîdan hê zêdetir venekin, ji bo vê jî hê zêdetir hêza xwe veguhezînin welêt, şerê xwe yê çekdarî pêşde bibin. Jixwe pêngava me tevî her cure astengiyan pêk tê. Ev pêngava me bi qasî

şehîdên me yên destpêkê, berhema feraseta deynê wezîfeyeke nayê taloqkirin ê dilsoziya bi bîranîna şehîdên me yên zindanê re ye. Hemû xebatên me yên din tenê amadekariyek e. Yanî, gurçûpêça çekdarî, perwerde û hemû wezîfeyên rêxistinî yên din ji bo mirov van bîranînan tevayî zindî û berçav bijî wezîfeyên pêwîst e mirov bi cih bîne.

Mirov bibîne ku dema nû, bi tena serê xwe jî ji bo rizgariya neteweyî merheleyeke xwedî girîngiya herî bingehîn e û bêguman ev jî li ser esasê dilsoziya bi bîranîna şehîdan îzahkirin a herî rast e. Jixwe ya tê kirin jî ev e. Hinekan xwest vê pir cuda fêm bikin, pêk bînin û şîrove bikin. Lê bi hemû hêza xwe ku em bi vî awayî çûn ser vê bûyerê, tevî mînaka herî rast a dilsoziyê nîşan da, careke din pêşiya pêşketinan vekiriye. Heke em nexwazin van şehîdên xwe di tarîtiya zindanê de winda bikin, bi rastî diviyabû karên herî manedar hatiba kirin. Vaye yek ji karên herî manedar ê hat kirin ev e. Heta ku nirx dan maneya mezin a berxwedana şehîdên zindanê, li derve nirxandinên kesên di nav de jî nikarîbûn bikin kirin, ji vê encam derxistin, wezîfe tespît kirin, rexneyên li cih jî kirin û hwd. ev hemû tên çi maneyê? Nîşan dide berxwedêran çalakiyên xwe zindî zindî jiyan û di diyarkirina wê de çi qasî nêzî rastiyê ne.

Îro weke di dîrokê de tê dîtin, KT'ê bi milyonan mirov qetil kirine, devê hemûyan girtiye, di dîrokê de şop jî nehiştiye.

Li hember xisûsa ku KT'ê rastî ev qasî nixumandine, heta dema nêz sosyalîst û kesên pêşverû jî bêdeng mane. Yanî KT'ê hesabê tiştên kirine nedane. Vaye ya em li vir dikin ev e ku cara yekemîn rawestandina herikîna dîrokê ya di lehê faşîzmê de ye û em nîşan bidin ku tişta vê rejîmê kiriye li cem namîne. Bi vî awayî jî mirov dawî li berevajîkirina li dîroka mimkun e bi salan e li ser gelan hatiye meşandin, hem jî bi rengekî devê wan girtine û çavên wan kor kirine pêş xistine, bi dawî bike. Mirov îspat bike ku zarokên gel ên jiyana xwe ji dest dane, şehîdên wan nirxên gelan didin jiyîn û qet têk naçin. Bêguman ev jî tê maneya yek ji wezîfeyên şoreşgerî ên herî cidî tê biserxistin. Heke faşîzma 12'ê Îlonê serketineke mîna wê dîroka kalikên xwe yên

bi wan ve girêdayî, li hemberî me bi dest xistiba, ne tenê li ser navê PKK'ê, li ser navê gelan jî wê windahiyeke pir mezin pêk hatiba. Dîsa heke berxwedêriya zindanê, hemû hewldanên têkildarî wê û di bin bandora wê de pêş dikevin jî fetisîbana, wê faşîzma 12'ê Îlonê tenê di qada siyasî de bi ser neketiba, wê despotîzma tenê ji tarîtiyeke kor, her cure neheqî û zilmê pêk tê jî bi serketî dewam kiriba. Wê ev jî biba sedem ku wek mînaka herî nêz hewldanên mirov nikare biçûk bibîne yên tevgerên ciwanan ên pêşverû yên Tirkiyeyê û yên me jî di tarîtiyan de hatibana windakirin.

Hema niha em mijarekê bînin bîra xwe: Li ser bîranîna van şoreşgeran, hem jî kesên herî nêzî wan ku ketine nav tesfiyekeriyê, heta lanetê li paşeroja xwe tînin, gotinên weke; "Terorîst ev qasî zêde çûn, em kirin rewşeke zehmet, jiyan li me kirin jehr" dikin, bi faşîzmê re heman zimanî diaxivin û heta bi awayekî rezîltî teslîmî wê dibin û mîna poşman dibin ku dibêjin, "Demokrasî pêş dikeve, me di dema bihurî de şaşî kir" jî hebûna kesên xiyanetê li hebûna xwe dikin pêşketineke çavsor e. Xisûsa ku me derfeta serketinê neda faşîzmê, li hemberî bîranîna şehîdan dema tîpên jirêderketî derketin holê, me derfeta dijderketinê pêk anî û îro me ew anî nuqteyeke girîng jî serketineke mezin e ya li ser her cure nirxandinan e."

**RÊBER APO**

**(Kanûna 1987, Têkildarî Berxwedêriya Zindanê)**


***“Ev çalakî (ya heval Mazlûm); çalakiyeke protestoyî ya muezem e ku hovîtî, îşkence, zilm û xiyanet kiriye hedef û armanc dike bala raya giştî bikişîne ser Amedê.”***

***M. Xeyrî Dûrmûş***

***“Ne tenê li Girtîgeha Leşkerî ya Amedê, yek ji çalakiyên herî bi heybet a di dîroka me ya gel û partiyê de çalakiya Mazlûm e.”***

***Muzaffer Ayata***

## Kawayê Hemdem ê Tarîtî Çirand Mazlûm Dogan



Me bi gotina, "Mûcîzeyeke me ji teslîmiyetê rizgar bike pêwîst e" bê rewş çi qasî xeter e pênase kiribû. Ji bo mirov ji vê rewşa zor û zehmet rizgar bibe ji bilî ku mirov îrade û afirînertiyeke tûj nîşan bide tu rêyeke din tune bû. Dema destnîşankirin bû, "Em jiyan û bedenên xwe ji çekeke ku li hember me tê bikaranîn derxin, li hember dijmin bi kar bînin", wê ev çek çawa bê bikaranîn tê afirînertiya xwe pêş bixî. Tu di destê xwe de du guleyên êgir digirî. Di yekê de mirin, di yekê de xiyanet. Tu li ser rêveqetînekê yî. Parçeyên êgir ên di destê te de bê çekeke çi qasî şewitîner e tu di hişê xwe de hîs dikî. Çekeke wiha ye ku tu kîjanê bi kar bînî, bi kar bîne, li qada berê xwe didiyê di hedefa wê lê bide de, qewarên mezin vedike. Dema tu alternatîfa mirinê biavêjî ser dijmin ê derbê dixwe û winda dike dibe ew. Lê eger tu mafdariya alternatîfa xiyanetê biavêjî ser hevalên xwe tu di refên şoreşê de qewarê vedikî. Di heman demê de weke miriyekî sax tu jî tune dibî. Yanî di yekê de tu alternatîfek e ku bimirî, lê timî bijî û bidî jiyandin î. Di ya din de tu dijî, lê dema ber bi xiyanetê ve gav diavêjî bi awayekî rastî tê bibî kesekî ku bimirî. Bi kurtasî ya tê bi "bi saxmayînê" mirinê tercîh bikî, yan jî bi mirinê jiyanê. Êdî her tişt girêdayî te ye. Tu dipîvî, hesaban dikî, îrade, serwextbûn û hêza xwe ya

berxwedanê dinirxînî. Wan rojan di me de rewşeke ruhî ya balkêş hebû. Me hesta mirinê derbas kiribû.

Hesteke mirov bixwaze bijî nîn e. Ji ber şert û mercên tu di nav de hezar carî ji mirinê xerabtir in, te mirin avêtiye rexekî. Lê tê çawa bimirî? Yanî di wê nuqteyê de eger tu mirinê bi ser nexînî, îradeya te di nîvê rê de bihêle encama tu pêre rûbirû bê te ditirsîne, diqutifîne. Li cihê tu li hemberî mirinê têk diçî xiyanetê kemîn daniye, ji bo te daqurtîne disekine. Di rojên destpêkê de cudahiya, "teslîmiyet-xiyanetê" me tam aşkera nekiribû. Bi demê re hê baştir hat fêmkirin, em ketin ferqa wê. Eger teslîmbûyîn bi xiyanetê re weke hev be, gelo çima dijmin di asta herî jor de hovîtî li ser mirovekî xiyanet kiriye dimeşand, ji bo wê hewl dida? Heke ji bo me her tişt qediya be, çima bi temamî di nav hewldaneke tunekirinê de ne? Naxwe di me de hê tiştekî ku neqedandine heye, "Ew tişt" her çi be, dijmin ji bo wê ji holê rake ew qasî bêrehm tê ser me. Dema me ew ferq kir, tişta xwe da ferzkirin ev bû ku em li cihê herî dawî yê em lê rawestin, ji wê wêdetir neçin. Me yê di wê nuqteyê de li ber xwe daba, herî kêm em ê li wir sekinîbana, ji bo em neçin xiyanetê her tişta ji destê me hatiba me yê kiriba. Dema mirov nejî naveroka têgînan û hin tercîhên mecbûrî bi hêsanî nayên têgihiştin. Li şûna çûna ber bi xiyanetê ve, di nuqteyekê de rawestandina teslîmiyetê carinan wek tercîhekê -hem jî tercîheke dijwar- derdikeve pêşberî mirov. Bi rawestîna di nuqteya teslîmiyetê de, tu datînî pêşiya xwe ku hê zêdetir zerarê nedî gel, partiyê û nirxên sosyalîst, jehra xiyanetê neqlî civakê nekî.

*************

Eger ji destê wan bê wê hemû girtiyan qetil bikin. Eger bi ya wan be wê destûr nedin kes ji me bêhnê bistîne. Ew şêweyê mirinê ya pêşkêşî te dike ku gav bi gav di jiyanê de bi cih dike, ji derveyî armanca xwe di girtîgehê de mirinan naxwaze. Lewma ketin nav hewldanan ku şert û mercên girtî dawî li jiyana xwe bînin ji holê rakin. Li qawîş û hucreyan her tişta ji bo vê

armancê bê bikaranîn kom kirin. Hiştina li cem xwe qedexekirin. Eger tu dijî tê di nav lepên wî de bî, tê xizmetê ji armancên wî re bikî, eger tê bimire jî wiha ye. Ji bo tunekirina siyasî eger kuştin hewce kiriba diviyabû wan kuştiba. Jixwe ji bo vê armancê gelek mirov hatin qetilkirin. Bi gotina, "Eger hûn wer dihizirin ku em nakujin hûn xwe dixapînin. Binihêrin, em çawa dikujin!.." bi dehan mirov qetil kirin û wek amûrê tirsandina gel bi kar anîn. Heta ew nexwazin û nekin tu nikarî bimirî!.. Lê tiştek ji destê îrade û afirîneriya mirov xelas nabe. Dema te bi îrade û hişmendiyê dawî li jiyana xwe anî, wê nikaribe bi kar bîne. Wê zerarê bide armanca wî. Wê demê mirina ji derveyî dijmin a tu bi xwestek û serwextbûna xwe pêk tînî qedexe ye!.. Ji ber şêwazê wê çi dibe bila bibe, wê derfet neyê hiştin ku mirov dawî li jiyana xwe bînin, li ser wan hovîtî û xiyanetê pêk bînin. Yanî li Girtîgeha Leşkerî ya Amedê tişta mirov dema sax e nikare bike, bi mirinê dikare bîne cih! Dikare rêzikên teslîmiyetê serûbin bike! Ev jî bi rastî serhildaneke esîl e.

Belê mirin, tu jiyana xwe mîna guleyekê didî ber çekê û dixwazî li dijmin bidî. Lê tu amûrên ji bo bi kêrî tu xwe ji holê rakî nabînî. Kesên mirinê dixwazin hene, lê di wê mijarê de jî tu hatiyî dorpêçkirin. Demeke derman didan girtiyan. Hinekan derman kom dikirin, paşê hemû bi carekê re vedixwarin û wek amûrê mirinê bi kar dianîn. Tu dibînî girtî bang li gardiyan dike, dibêje ku hevalê wî hewl daye xwe bikuje. Carinan rojê 3-4 kesan hewl didan xwe bikujin. Derman vedixwe, zendê xwe qut dike, xwe dadiliqîne yan jî serê xwe li dîwar, kalorîfer û caxên hesînî dide, hewl dide bimire.

Ez "întîhar"ê bi kar nayînim. Ji ber bersiva rastiya me ne ev e. Ji derveyî hin îstîsnayan, hemû hewldan çalakiyên naveroka wan siyasî, protestokirina dijmin e. Rewşeke dojehî ye. Êgir bi ser mirovan de dibare. Pêvajo her diçe giran dibe û di aleyhê girtiyan de pêş dikeve. Ji ber çalakiya bi rêxistinî pêş neket, mirovan dest pê dikirin ku îsyanên xwe yên şexsî, protestoyên xwe bi dawî anîna li jiyana xwe nîşan bidin. Lê ji ber dijmin ji derveyî îradeya xwe mirin nedixwest, mudaxeleyî kesên hewl

didan xwe bikujin dikirin, ew radikirin nexweşxaneyan. Her roja diçû mudaxeleya li pêvajoyê bi awayekî hê dijwartir xwe ferz dikir. Divê mirov vê rawestîne lê çawa?

************

Êdî di wan rojan de pevrenivîsîn û têkilî pir hatibûn sînordarkirin. Derfet her diçûn kêm dibûn, dorpêçkirin têra xwe kûr bibû. Ji derveyî îstîsnayên acil, bi qatên din re pevrenivîsîn û notdayîna hev nedihat kirin. Êdî ji nuqteyekê û şûn ve tiştekî ku me ji hevdu re nivîsandiba û gotiba jî nemabû. Her tişt aşkera û zelal e. Ji bilî ya pêwîst e bê kirin, tavilê bikeve pratîkê tiştekî din tune bû. Dihat payîn ku rojiya mirinê dest pê bike. Lê roj û bûyer wer bi lez û cuda pêşketin ku, plana me ya destpêkirina çalakiyê, ketina nav berxwedanê di pratîkê de weke em fikirîn nemeşiya. Dijmin pêvajoya ji teslîmiyetê çûna ber bi xiyanetê heta jê hat bi lez kir. Ji bo tavilê bigihêje encama dixwaze, bi hemû bêperwatiya xwe, xwe da ser pêvajoyê. Êdî tehemûl nemabû. Diviyabû mirov acil tiştekî bike û bend bikişîne pêşiya xiyanetê. Şert û mercên pêşxistina çalakiyên girseyî ji holê rabibûn, mijûlbûna bi vê re wê hewldaneke vala bûya, diviyabû em cidî bin. Di dema ku dijmin serweriya moralê bi dest xistibû, ne mimkun bû mirov girseyê bixe nav çalakiyê. Bêyî mirov çalakiya girseyî û pêşiya wê vekiriba rabûna bi karekî wiha re dibû xeyalperestî û bêçalaktî. Diviyabû ji nû ve bawerî û cesareta rabe çalakiyê daba girseyê. Dorpêça bi tirs, panîk û qutifandinê hatibû avakirin, pûçbûn û şikestin bû. Di demeke ku her tişt bi awayekî lezkirî û hatiye dijwarkirin hê zêdetir dibû û pêş diket, her wiha îtîraf dihatin ferzkirin û neqlî dadgehan hatibûn kirin, ji vê çûna serberjêr re mudaxeleya yekemîn bi çalakiya Mazlûm pêk hat.

Vegotina hevalên weke Mazlûm, jiyana wan destnîşankirin, mirov bide xuyakirin bê mirovên çawa ne, bi awayekî weke mirov behsa dîroka PKK'ê û şoreşa Kurdistanê bike. Kesayetên wiha yên têkoşêr bi awayekî nîşaneya nasnameya partiya me,

xeta me ya şoreşgerî û nirxên gel in. Di cewhera xwe de hevalên weke Mazlûm mirovên ku xwe derbas kirine, bi partî û welêt re bûne yek, bi nirxên şoreşa cîhanê re xwe gurçûpêç kirine, her yek bûne parçeyek ji wan. Hevrê Mazlûm, gelê Kurdistan veguhezandiye serdemê, di têkoşîna serxwebûna neteweyî û têkoşîna azadiyê ya partiyê meşandiye, di serê berxwedanê de cih girt, bi şerê xwe yê bêtawîz ku ji aliyê dost-dijmin ve dihat zanîn, kesayeta xwe ya dîrokî îspat kiriye. Mazlûm ji nav gel derketiye, nirxên gel ên berfireh bi kesayeta xwe ya sosyalîst a saxlem û hevgirtî re kiriye yek. Taybetmendiyên şexsî yên Mazlûm, jiyana Mazlûm a kurt lê dewlemend, feyde û tevkariya Mazlûm a ji têkoşînê re xwedî wê hêzê ye ku dikare rê nîşanî şervanên rizgariya neteweyî ya Kurdistan û hemû şoreşgeran bide. Di rêya şoreşê de ku partiya me nasnameya xwe ya rast dît, bi xisleta şervanan xwe gurçûpêç kir, bi Mazlûman tê îfadekirin. Heke em karaktera partiya xwe û bi merheleyên li Kurdistanê gihiştinê bigirin dest, Mazlûm wê demê bi rastî dê werin îfadekirin. Lewma bi rastî jî vegotina wan pir zehmet e. Zehmetî ji mezinbûna asta wan tê. Wergirtina wê mezinbûnê û di destnîşankirina wan astan de em zehmetiyan dikişînin. Em gelek tişt deyndarê wan in. Deyndariya li hember wan, deyndariya li hember xeta partiyê, şoreş û gel e. Ew bûn haveynê van rojan, bi şêwazê herî saxlem xîm danîn. Mirov tenê bi temsîl û hewldanekê dikare bibe layiqî wan. Eger mirov wan bi gel nede fêmkirin, negihîne gel, tê maneya mirov wezîfeya xwe ya dîtin û nîşandana nirxên herî esîl, herî xurt û herî baş nayîne cih. Dema gel li wan dinihêre mîna li eynikê dinihêre xwe dibîne, dibîne ku nirxên wî yên herî erênî di wan kesayetan de xuya dike.

Li derve û hundir em bi hev re man. Kesekî bi ken û bi kêf bû. Ji jor ve li mirovan nedinihêrî, ji têkiliyên burokratîk nefret dikir. Eleqe, zeman û hezkirina xwe wekhev û bi heq belav dikir. Peyvşîrîn bû. Hevalan xwe li cem rehet hîs dikirin. Bi hostetiya xwe ya analîzkeriya mezin bi pirsgirêkên partiyê û hevalên xwe re eleqedar dibû. Hurmetekî wî ya xwezayî ya kesayeta wî ya xurt ava kiribû hebû. Ji bo hêmanên derveyî partiyê jî wiha

bû. Tevî wê rewşa giran a hovîtiya bi cop û kalasan kesê herî zêde em kêfxweş dikir, esprî dikir, atmosfera heyî belav dikir û dikenand dîsa ew bû. Çi beriya Îlonê çi jî dema berxwedan û teslîmiyetê, têkildarî Mazlûm bîranînên hevalan ên dewlemend hene. Em nikarin behsa hemûyan bikin. Ez bîranîneke xwe ya di hişê min de herî mayînde û şop hiştiye vebêjim: Herî dawî rojeke ziyaretê min ew dît. Beriya şehadeta wî bi du rojan bû. Wê rojê ji ziyaretê dihat. Gardiyanekî jî ji pişt ve timî ew dehf dida, jêre digot ku zû bimeşe. Dema di ber hucreya min re derbas bû çavên me li hev ketin. Ji ber meş bi lez bû lihevnihêrîneke pir kurt bû. Li min nihêrî lê berê qet wiha li min nenihêrîbû.

Tarîfa wê ne mimkun bû, di hundirê wê de her tişt hebû. Awira wî bi maneyeke pir kûr a min berê qet nedîtibû tijî bû. Sî ketibû ser rûyê wî. Di çavên wî de qîrîneke dişibe dayikeke ku ji zarokên xwe, ji can û kezeba xwe hatiye qutkirin hebû. Awirekî ew qasî masûm û mazlûm. Fêmkirina wê ji mirovên pir hez dike were qutkirin û wê careke din wan nebîne. Lê qîrnekirin û bangnekirina xemgîniya ew çêkiriye. Giraniya hesta ku mirov cara dawî nikare hevalê xwe hembêz bike. Her tişt li awira di carekê de hatibû barkirin. Rewşa Mazlûm ez pir bandor kirim. Ez hejandim. Û di nav wan du rojan de jî li ber çavên min awira wî ya dilê min kun kir û derbas kir hebû. Divê ez îtîraf bikim ku ew birîna di dilê min de qet nehat girtin. Heta ez sax bim jî wê neyê girtin. Bêguman min wê demê maneya awirê tehlîl nekiribû. Hê zêdetir min wer şîrove dikir: Li hember tiştên li dijî me tên kirin ku dibe şahidê şert û mercên em tehemûl dikin wî xemgîn dike, diqehirîne. Di nav wê çembera êgir û wê dojehê de zarokên bijarte yên wî gelî ev qasî bi êşan re rûbirû tên, her diçe xiyanet tê ferzkirin, merheleya em têde bêguman bi awayekî me dike berpirsyar. Wek rêberekî ku Mazlûm ji vê teslîmiyeta mirov mehf dike, hê zêdetir berpirsyarî hîs dikir normal bû. Min ew awira Mazlûm hê zêdetir wek xemgîniyê şîrove kir zêde neketim kûrbûna wê, min ew rastiya li pişt wê xemgîniyê nedîtibû. Ji ber Mazlûm di wan hemû nîqaşan de têkildarî mijara wê çalakiyeke xweser pêş bixe, tu agahî nedabû kesî. Di aliyê

cih de derfetên me ji hev re nivîsandiba hê zêdetir bû. Ew di hucreya 9'ê, ez di hucreya 7'ê de bûm. Eger xwestiba agahiyan bide, dikarîbû notê binivîsîne û biavêje. Dikarîbû xwe bigihîne Mûstafa Karasû jî, hema li hucreya jera wî dima.

Ez wer texmîn dikim. Ji ber zanîbû heval çi diparêzin, çalakiyeke çawa tê fikirîn. Didît ku heval bi taybet jî Xeyrî û Kemal wê razî nebin bi tena serê xwe biçe mirine. Di navbera Mazlûm û Xeyrî de dilsozî, hezkirin û hurmeteke mezin hebû. Wer fikiriye ku dema mijar bê nuqteya mirinê Xeyrî û Kemal wê wî tenê nehêlin. Sedema esasî ya ew bir mirinê ew bû: Divê acil ji sedî sed tiştek bê kirin, qewarên ku dijmin di nav refan de vekirine bên girtin. Êdî tehemûla wî ji rawestînê re nemabû. Wê ev çûna bi tehlûke çawa hatiba rawestandin? Ev ne diyar e, tam xitimandinek e; qesta min a mûcîzeyê ew bû. Mazlûm difikirî ku wê bi mirinê re rêya diçe derketinê bê vekirin, ji bo her îhtîmala wî ji wê wezîfeyê werbigire ji holê rake bêdeng dima û agahî nedida tu kesî.

Me tiştek fêm nekir, lê di navbera Mazlûm û Karasû de hin axaftinên bibin delîl çêbûne. Gotibû ku îdareyê li ser dîwarên hucreyê nivîs dane nivîsandin. Ev ji bo me rewşeke pir giran bû. Têkildarî nivîsandinan Karasû ji Mazlûm re dibêje, "Di dawiyê de ew jî bi me kirin. Wê ew halê me çawa be?" Mazlûm dibêje: "Herhal ji vê rewşê xerabtir tiştek nabe." Nivîsandin ji bo Mazlûm bibû tehemûla dawî. Karasû, dîtibû ku nivîs bi Mazlûm dana nivîsandin sînorê herî dawî bû yê mirov ketibayê. Mazlûm rewşeke hê xerabtir nedifikirî. Tê fêmkirin ku piştî wê nivîsê çalakiyê difikire. Piştî demekê di navbera Karasû û Mazlûm de axaftineke bi pispepist çêdibe. Bi dengekî ku êdî diyar dike tehemûla wî nemaye dibêje: "Ev wer nameşe, divê mirov hin tiştan bike, ez hin tişt difikirim." Karasû jî mirinê qest dike û dibêje, "Ez jî." Lê Mazlûm jî bi gotina, "Tişta ez difikirim tu ji ku dizanî?" Tiştekî çalakiyê piştrast bike nabêje. Dîsa beriya çalakiyê bi 4-5 rojan Karasû dibihîze ku ji hucreya Mazlûm hin deng tên. Du şevan hema piştî xwarina êvarî li pey hevdu dengekî madenî yê li dîwêr dikeve tê bihîstin. Şeva duyemîn Karasû

pirsa, “Tu çi dikî?” ji Mazlûm dike. Dema bersiva, “Tiştek nîn e” werdigire careke din pirs nake. Heke wê demê me ev dane anîbana gel hev, em li ser fikirîbana me yê fêm kiriba ku Mazlûm di nav amadekariyên çalakiyê de ye. Ji bo pêşî li berxwedanê hatiba vekirin, bi mecbûriyeta divê êdî mirov bedenan deyne holê, Mazlûm diyar dike bê wê kengî û çawa bimire. Çalakiyê li gor 21’ê Adarê Newrozê plan dike. Tê fêmkirin ku beriya wê dest bi amadekariyekê kiriye. Waneyeke avê ya li dîwarê hucreyê hatiye bicihkirin heye, ez ne şaş bim ji dîwêr 1.50-1.60 m bilind e. Her çi qasî ne mimkun e mirovek xwe ji wê bilindbûnê daliqîne jî Mazlûm a îhtîmala wê nîn e bi ser dixe.

Bejna Mazlûm nêzî 1.70 cm ye. Bejna wî ji erdê ji bilindbûna waneyê bilindtir e. Bi rastî jî pir zehmet e xwe ji cihekî wiha daliqîne. Çi bike bila bike wê lingên wî bigihêjin erdê. Ji bo biserxistina çalakiyê divê beriya wê gelek caran ceribandinan bike, li ser bixebite, vî şêwazê zehmet ê mirinê bi awayekî ku encam bigire divê amade bike. Her wiha zehmet e çalakiya xwe bi roj bi serketî encam bike. Hucre bê ku saniyeyekê vala bên hiştin, di bin kontrolê de ne. Li dawiyê îhtîmala bi şev bike dimîne. Dema deriyên qatan tên girtin, her kes radize bêyî deng derxe ji bo çalakiyê pêk bîne, kî zane çend caran ceribandiye, hesabê wê kiriye?.. Piştî çalakiyê em li waneyên li hucreyên xwe nihêrîn, me xwest em fêm bikin bê Mazlûm xwe çawa daliqandiye. Bi awayekî normal ne mimkun e, mirov wî karî pêk bîne. Tê lingên xwe ji çokê bitewînî. Tu kîjan şêweyî hilbijêrî hilbijêre, dema tu ji ser hişê xwe çû yan jî masûlke sist bûn wê dîsa lingên te bigihêjin erdê. Heta mirov tedbîrên taybet negire derfeta çalakiyê nîn e.

Heta tu bigihêjî nuqteya mirinê em bêjin herî kêm 2-3 deqeyan tê daliqandî bimînî. Jixwe di rewşeke wiha de demeke hê zêdetir divê. Ji ber derfet tune ye mirov hemû giraniya beden bi kar bîne û xwe daliqîne. Ji bo mirinê herî kêm pêwîstî bi 4-5 deqeyan heye. Her wiha aliyê îradî û fizîkî yê pirsgirêkê jî heye. Dibe ku kêliyek wer bê ku tu li ser îradeya xwe ne hakîm bî,

lingên te li erdê, li çep û rastê bikevin, careke din deriyê jiyanê ji te re veke, ji derveyî wê dema tu ji hişê xwe çûyî deng derkeve, hinek bibihîzin, asteng bikin. Tavilê tê fêmkirin ku Mazlûm detaya herî zirav jî fikiriye, gelekî serê xwe pê êşandiye. Wer xwe amade kiriye ku di nuqteya ji ser hişê xwe biçe jî dengekî herî biçûk negihêje Karasû yê hema li bin hucreya wî ye û me. Jixwe wê şevê ne me, ne jî kesên li jêr ji hucreya wî dengek jî nebihîst. Bi şev li qawîşan bêdengiyeke mirinê hebû. Eger bi roj bûya, dengê sirûdan, qiyamet radibû, lê bi şev eger korderziyek jî ketiba dihat bihîstin. Amadekariyên Mazlûm ev nîşanî me da; divê çalakiya wî qet nîvçe neyê hiştin, ji sedî sed bigihêje serketinê. Bi vê biryardariyê her tişt bi awayekî ku şeva 21'ê Adarê bi 22'ê Adarê ve girê dide bi encam bibe amade kiribû.

************

Sibeha 22'yê Adarê deriyên qatan vebûn, şorbe hat. Surmelî Çelîk derxistin. Surmelî şorbe belav dikir, ez derbas kirim. Çû ber hucreya Mazlûm. Ew nedît, hinekî sekinî, paşê bang kir got, "Kek Mazlûm, ma tu şorbeyê nagirî?" Deng nîn e. Bersivê nade. Wer hiziriye ku mimkun e li beşa tuvaletê be, lewma ew nebihîstiye. Ji ber vê carek-du carên din jî bang kir. Dîsa bersiv negirt. Gardiyan hat, çend caran wî jî bang kir. Deng tune ye. Me jî êdî fêm kir ku tiştekî seyr heye. Di qawîşê de hewayeke gumanê ya dil diêşîne çêbû, gumanek ket dilê me. Xeyrî ji hucreya xwe bang kir û got: "Keko. Keko. Çima tu deng nadî Keko?.." (Me ji Mazlûm re digot "Keko") Min êdî fêm kir ku Mazlûm ne sax e. Min ji Xeyrî re got: "Tu vala bang dikî, Mazlûm êdî nîn e!.." Kesên di qawîşê de êdî fikirîn ku şehîd ketiye. Dîsa jî hêviya ku mimkun e sax be hebû. Mînak dibe ku bi giranî nexweş be, dema diçe tuvaletê mimkun e ji ser hişê xwe çûbe. Yanî hevalan êdî xwe dispartin hêviyên wer biçûk.

Gardiyanan dema fêm kir tiştek heye, hema tavilê Surmelî kirin hucreyê. Di korîdoran de tenê gardiyan man. Yek diçû yek dihat. Ji hucreya Mazlûm li derve dinihêrîn. Ji aliyekî ve ku

wirewira îdareyê dewam dikir, li aliyekî jî di nav guman û xemgîniyeke bêterîf de me rewş dişopand, li aliyekî din jî dihat xwestin ku çerxa li Girtîgeha Leşkerî ya Amedê bêyî bê sekinandin bizîvire. Saeta "perwerdeyê" hatibû. Gardiyan xwest em bikevin "nîzama perwerdeyê" û dest bi sirûdan bikin. Em derbasî nîzama perwerdeyê bûn, me dest bi sirûdan kir. Wek kesekî ku ew kêlî jiyaye vegotina wê zehmet e. Di qonaxeke herî dîrokî ya pir zor û zehmet a têkoşîna me de, rêberekî me xwe feda kiriye. Kesekî wiha ye ku mirov li pêşberî wî bikeve nîzama silavdayînê, bi sirûd û dirûşmên xwe oxir bike. Nirxekî mezin ê gelekî yê pêwîst e mirov di nav dengê çekên me yên erd û asîman dihejîne de rêwî bike. Mirovek ku ji bo rizgariya gelê xwe û hevalên xwe yên dozê dawî li jiyana xwe bîne bûyereke bi heybet e, lê em ji derfeta ku şehîdê xwe bi şêweyekî şoreşgerî bi rêwî bikin bêpar in. Berevajî em sirûdên nîjadperest ên dijmin dibêjin!..

Tevî xemgîniya ku me ew winda kiriye, yek jî em qehra oxirkirineke wiha jî dijîn. Giraniya wê mirinê me dipelçiqîne. Çavên me şil dibin, girêk dikeve qirika me, lê em xwe digirin. Em rondikên xwe diniqutînin hundirê xwe, em naxwazin nîşanî dijmin bidin. Lê ne mimkun e mirov nede hîskirin? Em kesên li qata 4. birin hucreyên 36'ê.

Mazlûm hê li hucreya xwe ye, hê qet destê xwe nedanê. Diçûn û tên dinihêrin. Agahî ji dozger re şandine. Agahî dane Esat Oktay. Li 36'ê bi awayekî ku di navbera me de hucreyek vala bimîne, em li hucreyên 36'ê bi cih kirin, li ber caxên hesinî di sekna amadeyî de man. Gardiyan qet ji cem me nediçûn. Ji bo em bi hev re neaxivin, tiştekî ji hev re nebêjin li cem me sekinîne. Di wê navberê de ez ne şaş bim, serê kesekî cigareyek belav kirin. Haya wan ji aciziya me ji îsyana me ya dil dişewitîne heye. Li rûyê me binihêrin têr dike, her tişt tê xwendin. Bi vî awayî em demeke dirêj hatin rawestandin, saet 10.00'ê derbas kir. Hatin Xeyrî birin. Piştî demekê hat û rewş ji me re got. Dozger hatiye, gotiye ku Mazlûm xwe daliqandiye, serî li îfadeya Xeyrî daye. Xeyrî jî fikra xwe gotiye. Xeyrî gotiye,

Mazlûm ne kesekî wiha ye ku ji ber sedemên şexsî xwe daliqîne, bi vê çalakiyê re îşkence û hovîtiya li girtîgehê tê pêkanîn protesto kiriye, ji mirina wî rêveberên girtîgehê û kolordû berpirsyar in, eger îşkence bidomin wê hê gelek cenaze derkevin. Di dawiyê de jî bi gotina, "Ev hê destpêk e" bala wan kişandiye. Piştî Xeyrî dozger hewce nedît bang li me bike. Bêguman di wê navberê de hatine li Mazlûm nihêrîne, girtek amade kirine. Piştî kar û bar qediyane di nav betaniyeya leşkerî de dadixin jêr.

Piştî bûyerê çawîşê 35'ê (kurê xwişkê Ferdî) hat nîvê qawîşê. Got: "Bila her kes min guhdar bike! Hevalê we Mazlûm Dogan vê şevê xwe daliqandiye. Heyf bû. Zilamekî merd bû. Ez rêz û hurmetê didimê." Daxuyaniya fermî ji devê Ferdî bû. Ji ber gumanên di dilê wan de hatin gotin: "Hûn dixwazin hucreya Mazlûm bibînin?" Xeyrî bersiva erênî daye. Destpêkê Celalettîn birin, nihêrî û hat. Paşê Kemal derxistin. Paşê Xeyrî. Em naxwazin bên pêşberî hevdu. Em dixwazin ji xemgînî û kûrahiya mîna çiyayan a awiran rizgar bibin. Çi qasî hewl didan xwe bigirin jî hemû heval bi çavgirî bûn. Em hezar qatî ji mirinê xerabtir in. Dest bidin me, em ê bi awayekî kûrekûr bigirîn. Dema Xeyrî derxistin, xwe negirt, dest bi girî kir. Em jî ji bo li cem gardiyanan negirîn xwe digirin. Me nedixwest kêfa dîtina giriyê me bibînin.

Em hê xwe digirin. Em li ber caxan di sekna amadeyî de ne. Xeyrî bi girî di ber min re derbas bû, nihêrî û zîvirî. Ez derxistim. Bi waneya min behsa wê kiribû parçeyekî qerewateke qutkirî girêdayî bû. Çalakiya xwe bi qerewatê pêk anîbû, dema ew daxistine li şûna qerewatê vekin jêkirine. Li ser lavaboyê, li erdê xwîna hişk bibû hebû. Herhal ji difin û devê wî hatibû. Tiştekî din tune bû. Wê navberê doşeka wî dan vekirin, pembûyê wê rijandin erdê, hemû li hev xistin, kontrol kirin. Xwestin fêm bikin, bê peyam hiştiye yan na. Piştî ew çûn me jî dest bi girî kir. Li qawîşê hewayeke wer giran heye ku, xwe digihîne çavên her kesî, neçar dikir mirov weke sûlavê bigirî. Min dest bi girî kir. Min nexwest bi vî awayî min bibînin. Ez çûm beşa tuvaletê

û bi temamî min xwe dayê. Bêîstîsna hemû hucre digiriyan. Hevalan çi qasî hewl didan xwe bigirin jî dengê girî hemû qawîş dagirt. Qet nedihat bîra min ku di jiyana xwe de ez ev qasî bêçare, xemgîn bûm û ew qasî dilê min diêşiya. Cihê Mazlûm ê di nav me de nayê nîqaşkirin û dagirtin. Dema Mazlûm dihat gotin, çavên girseya me bi roniyên hezkirinê tijî dibûn. Windakirina kesekî ku bi awayekî yekpare mirovatî û nirxan diparêze, mirov li pey dimeşin, baweriyê dide dihat wateya derbxwarinê. Di nav hewayeke ku bi her tiştî neyênî ye, veqetîna rêberekî ji nav me, hê zêdetir derb li me da. Li hemberî wan ku me wezîfeya xwe neanî cih, bi awayekî layiqî wan me ew oxir nekirin, em hê zêdetir birîndar kir. Û bi taybet Mazlûm di wê mijarê de bû derbek giran! Dema me agahiya mirina Xeyrî û Kemal di Rojiya Mirinê ya Mezin de bihîst em ew qasî giran bandor nebûn. Ji ber amadekariya ji çalakî û mirinê re hebû.

Hema piştî çalakiyê Xeyrî noteke kurt ji me re nivîsand. Diyar dikir ku Mazlûm çalakiyeke di asta dîrokî girîng û mezin pêk aniye, rêya derketinê nîşanî me daye, pêşdeçûna di rêya nîşan daye de wê serketinê bîne. Paşê jî dida xuyakirin ku mimkun e hin mirovên bûyerê fêm nekin û xwedî niyetên xerab dikarin, hewl bidin çalakiya Mazlûm weke çalakiyeke întîharê nîşan bidin, cewhera wê reş bikin. Lê destnîşan kiribû ku pêwîst e em bûyerê rast fêm bikin, peyama Mazlûm daye me, baş têbigihêjin û nivîs wer temam kiribû: "Ev çalakî; çalakiyeke protestoyî ya muezem e ku hovîtî, îşkence, zilm û xiyanet kiriye hedef û armanc dike bala raya giştî bikişîne ser Amedê."

Heval Xeyrî bi esasî bi fikra hewce ye aliyê siyasî yê çalakiyê bê fêmkirin pêwîstî bi nivîsandinê dît. (Hey cihê wê hatiye ez bal bikişînim ser hin taybetmendiyên Xeyrî. Şert û merc û pirsgirêk çi qasî neyênî çi qasî giran bin bila bin, tu carî xwînsariya xwe winda nedikir û di kêliyê de mudaxeleyî pratîkê dikir. Mirovekî xwedî xisleteke afirîner ê timî, difikirî, fikir diafirand û çareserî didît. Ew taybetmendiyên wî ew qasî bawerî dida me ku, me digot qey me pişta xwe daye çiyayan. Me digot, "Xeyrî hebe qet pêwîstiya me bi fikir û nîqaşan nîn e!" Me di sohbetekê

de tiştek got. Gotin: “Kê got?” Me got: “Xeyrî.” Kemal got, “Heke Xeyrî gotibe rast e. Jixwe ew li şûna me hemûyan difikire.”) Dibe ku girseya me bi wê rewşa ruhî naveroka çalakiyê tam nedîtibe. Di wê nuqteyê, wê rewşa giran a ew derba mezin hat xwarin de, Xeyrî bûyer li ser esasekî rast girt dest, xwest astên wê bigire dest, encamên zelal û aşkera yên di asta herî jor de xizmetê ji vekirina mejiyan re veke pêş xist. Pêşkêşî me kir. Fikra me jî di vî alî de bû. Me çalakiya Mazlûm li ser navê partiyê wer girt dest û nirxand.

Mazlûm bi çalakiya xwe weke şûrekî tûj ket pêvajoyê. Êdî tu tişt ne mîna berê bû. Û em êdî cipcuda bûn. Hesta ku em bi xwe re nelihevkirî bûn rabû ser piyan. Amed hatibû qirêjkirin. Mazlûm hewl dabû bi xwîna xwe paqij bike. Dor a Mazlûmên ku ew temam kiribana bû. Hest û fikrên me bi temamî ber bi cihê hewce ye bi lez herikî. Me bi Mazlûm re pêvajo careke din terîf kir. Ew qonaxeke girîng e. Mazlûm mîlada Amedê bû. Encam ew bû: “Wê pêvajo bi mirinan xwe careke din xwedî bike, pêş bikeve. Kesên ji xwe bawer, singa didin ber mirinê wê li ber xwe bidin û fitîla serketinê pê bixin.” Êdî pirsgirêk şêwaz û zemanê çalakiyê bû. Xeta ku wê pêvajoyê ew şopandiba bi şêwazê ku mirinê tîne wê pêk hatiba. Ji aliyê girtîgehê ve ku rewş ew bû, em naveroka peyama têkildarî Kurdistanê ya dema Mazlûm şehîd ket da, destnîşan bikin. Wek roja çalakiyê Newroz hatibû hilbijartin. Newroz, li Kurdistanê sembola ji nû ve vejîn û berxwedanê û roja nû ye. Li ser vî esasî tê bîranîn, pîrozkirin. Jixwe wek efsane jî ku heta roja me ya îro hatiye kuştina Dehaqê Zalim ji aliyê Kawayê Hesinkar ve, çirandina zilm û tarîtiya Dehaq, ji aliyê gelê Kurd ve wek destpêka gelbûyîn, bicihbûna li ser axê, pêvajoya azadiyê tê bîranîn. Di pêşengiya Medan de gelên herêmê li hemberî Împaratoriya Asûr a koledar şer pêş xistin. 612 B.Z. paytexta Asûr Nînova hat hilweşandin û ev keleha zilmê ku ket, şer bi serketinê bi encam bû. Li çiyayan agir tê pêxistin û bi vî awayî mizgîniya serketinê ji gelên Rojhilata Navîn re tê ragihandin. Îro Newroz ji aliyê gelên Rojhilata Navîn ve wek cejn tê pîrozkirin.

Belê mîna destaneke Prometeus e. Yanî veguhastina agir ji mirov re yan jî azadî bi êgir re veguhastina mirovan. Maneya Newrozê ya di dîroka me de ev e. Gelê me bi hezarê salan e di 21'ê Adaran de cejna xwe ya Newrozê pîroz dike. Agiran pê dixe, bi hesreta azadiyê, bi coşa şerê ji bo wê govendê digerîne, kilaman dibêje. Li Girtîgeha Leşkerî ya Amedê tarîtiyeke gip-girtî hebû. Dijmin dixwest me di wê tarîtiyê de veşêre bifetisîne. Yekemîn meşaleya derketina ji vê tarîtiyê bû Mazlûm. Ew Kawayê Hemdem bû yê bi fikra cîhana sosyalîst xwe gurçûpêç kiribû. Berî niha bi hezarê salan zilma Kurd dijiya, di hilweşîna tarîtiya Asûr a li ser gelên Rojhilata Navîn çawa derketinek, ji nû ve vejîn, rabûna ser piyan, azadî û gelbûnê de pir girîng e; ji bo me jî li Kurdistanê ku gelê me ji nû ve bi gelek tehlûkeyên hebûnê re rûbirû ye, bi taybet li Amedê bi Kawayê Hemdem re çirandina wê tarîtiyê ji bo dîroka gel û partiya me xwedî heman girîngiyê ye. Girtîgeha Leşkerî ya Amedê, di şer û pevçûna gelê Kurd ê şerê rizgariya neteweyî pêş dixe û KT'a mêtinkar de bû navend, di rojên ku şer di asta herî jor de pêş ket, Mazlûm bi çalakiya xwe şeklekî nû da şer.

Belê, li wir pêxistina meşaleyê, rê nîşanî me da, sînorên girtîgehê derbas kir û bû Kurdistanî, xwegihandina çiyayên me, di roja me de jî ku bû gerîla dijî, peyamên mezin ên gelan bangî berxwedanê dike, digire nav xwe. Di encam de bi pêxistina meşaleyê re li Zindana Amedê her ku çû senceqa berxwedanê, ji nû ve vejîn, hebûn û azadiyê hat çikandin. Çalakiya Mazlûm di dîroka Kurdistan û partiya me de qonaxeke nû ye, ji nû ve vejîn e. Kawayê Hesinkar di Mazlûm de bi nasnameya xwe ya hemdem ji nû ve vejiyaye.

Du hêmanên Newrozê hene: Ya yekemîn cejn û mizgîniya parçekirina zilma di efsaneya Kawayê Hesinkar de tê îfadekirin; a duyemîn jî roja meşaleya Mazlûm di tarîtiya zilmê de çikandiye pêketiye. Em êdî Newrozê bê Mazlûm, Mazlûm bê Newroz bi bîr nayînin. Newroz wek rojeke ku gel bûye Mazlûm, Mazlûm bûye gel, gihişt maneya xwe ya herî bi heybet. Êdî li hemberî zext û tehekûmên ji sedê salan ve didomin Newroz,

wek salvegerên bersiva bi bîranîna Mazlûm tê dayîn tên pîrozkirin. Ji ber wê hêmanên nû yên tevlî cewhera Newrozê dike wê bide, em pasajek ji nirxandina Rêbertiya Partiyê ya Newroza 1988'an di vir de bigirin dest:

"(…) Şehîdê me yê berxwedana mezin hevrê Mazlûm Dogan xwe vala vala nekir beyreqdariya şehîd a berxwedana 21'ê Adarê. Wî, di nav şert û demeke herî dijwar de girîngiya pêkanîna berxwedana herî mezin a mirovên me dixwazin bifikirin û pêş bixin, di me de wek mirov eger tê xwestin mirov li xwe xwedî derkeve, di nav şert, dem û zemanekî ku kes nikare bêhnê bistîne, dizane tenê û tenê bi rêyeke, li ser navê neteweyekê, li ser navê gelekî berxwedan bi vî awayî dikare bê nîşandan, bi vî awayî di kêlî, cih û zemanê fêm dike wê feydeyeke girîng li dîrokê bike, dizane şehîd bikeve. Kawatiya Hemdemî, Newroza hemdem, bi netewe re rizgarîxwazî xwedî gaveke wer mezin e jî. Hemû salên bihurî yên me û partiya me wiha ne. Me bi Newrozê bingeha vê partiyê danî. Me xwest bi ruhê PKK'ê bersivê bidin ruhê mezin ê rengarengî, ronahî, germahî, hêvî, gurûgeşiya biharê aniye xwezayê. Ji wê rojê ve ew jî her diçe vedibe, gurûgeş û xurt dibe, berxwedanên herî mezin timî di van rojan de dikeve rewşeke hê zêdetir têk naçe, nayê girtin. Her sal bûye mizgîniya rizgarîxwaziya sala pêş. PKK'ê ev sal kir, rêzesalên ku dema şertên dijwar ên zivistana Kurdistanê diqedin, hêviya mezin radibe ser piyan û bi coş dibin. Şehîdên me hene; di van salan de şehîdên her Adaran hene. Û em her 21'ê Adara nû bi dayîna şehîdan pîroz dikin. Ev hemû ji bo afirandina sedemên berxwedana me bên afirandin û ji bo em veguherînin biryardariya gelê me yê hesabpirsê rastî. Îro Newroza 1988'an jî navê gelê Kurdistanê radigihîne cîhan û herêmê, vê biryara xwe bi çalakiya bilind di jiyanê de bi cih dike. Aşkera ye ev sala me ye, me ev nuqte wergirtiye û em ê dest jê bernedin.

(…)

Hosteyên mezin ên jiyanê, dibêjin, 'Şoreş cejna gelan e.' Û ev rastiyek e. Jixwe hemû cejn ji bo bîranîna rojên ku şerên me-

zin hatine qezenckirin tên îlankirin. Em tenê roja ku şerek hatiye qezenckirin wek cejn îlan nakin. Dibe ku Newroz kevneşopiyeke wiha be, lê kevneşopiyeke pir di paşde de ye. Me di van salan de çi kir? Li hemberî xwezayê û zordar me kîjan serketin bi dest xistin ku me ji xwe re kir cejn. Ev bîranîneke, em nikarin bi bîranînê têr bibin. Em niha muxtacî cejneke rastî ne û cejna me ya herî mezin şerê me yê mezin e. Dîsa rêberên mezin ên gelan dibêjin, 'Gel hostetiyên xwe yên bêhempa di nav şeran de nîşan didin, ev roj û salên şer, roj û salên kesên mafên wan ên jiyanê hene û tune ne tên cihêkirin, kesên divê bên bilindkirin û bên xistin, xwediyên rastî yên ked û axê, xerîb û mêtinkar tên cihêkirin, serwextbûn bi tarîtiyê re dikeve nav hesabpirsînê û kesê mafdar bi ser dikeve' Ma ji vê hê baştir cejn dibe? Û hema ji gelekî hê zêdetir em ne muxtacî cejneke wiha ne? Dema em dikevin şer çiyê me yê em biparêzin û winda bikin hene? Dibe ku hinek bêjin gelek tiştên em winda bikin hene. Na! Ma çiyê me heye, bihostek axa me ya azad jî tune ye.

(…)"

************

Destpêkê ya girîng cewher û maneya çalakiyê ye. Şêwaz piştî wê tê. Eger Mazlûm derfeta xweşewitandinê dîtiba wê ew tercîh kiriba. Lê di wan rojan de ne mimkun bû mirov kelûpelên xweşewitandinê peyda bike. Me behs kiribû; hin heval derman digirin, hin heval serê xwe li dîwêr didin. Ji bo astengkirina mirinekê, dorpêçkirin têra xwe hatiye kûrkirin. Bi fikra wê di têkilî, pevrenivîsandinan de bê bikaranîn tayê dirûtinê jî hat qedexekirin. Jixwe ne mimkun bû mirov madeyek şewatê di hucreyê de ragire. Rojnameyek jî nîn e. Eger Mazlûm bixwaze xwe bişewitîne wê bi çi û çawa xwe bişewitîne? Nikare xwe bişewitîne. Eger bi derfetên heyî bi vî karî rabe wê pir dema wî bigire. Eger bê dîtin wê bê vemirandin û çalakî nîvçe bimîne. Lê tê dîtin ku Mazlûm qet naxwaze çalakiyê bixe rîskê. Plana xerakirina hemû pirên paşde vegerê pêş dixe. Herhal ji ber vê

xweşewitandin tercîh nekiriye. Xwedaliqandin, pir zehmet be jî rîskê nahêle.

Mezinbûna esasî ya peyama heval Mazlûm di vir de ye ku 21'ê Adarê çalakiya xwe pêk anî. Metneke nivîskî neket destê me. Jixwe wê demê her tişt aşkera bû. Tarîtiyeke gipgirtî û xiyaneteke hatiye ferzkirin heye. Ji bo wê derbas bike û gavavêtinekê bike, bedena xwe danî holê. Dema têkçûna 1981'ê dihat nîqaşkirin Mazlûm gotibû: "Aliyê me yê kêm ma mirin bû." Wî, bi çalakiya xwe ev kêmasî derbas kir, çirûska yekemîn di tarîtiyê de pêxist. Ji bo me peyamek ji wê mezintir tune bû. Mazlûm bi çalakiya xwe ji me xwest ku em ji nû ve gav biavêjin nav berxwedanê. Peyam ev bû. Û ya hat xwestin me rast fêm kir. Dibêje, "Bi mirinê gavavêtinê pêş bixin!.." Di wê nuqteyê de em nikarin serî li revoktî û sextekariyekê bidin. Em nikarin maneya çalakiyê bi şêweyekî cuda bigirin dest. Eger em teoriya teslîmiyet û nokertiyê bikin, tenê wê demê em ê nexwazin peyama tê xwestin bê dayîn fêm nekin an jî ji bo em tehemûlî encamên derxe holê nekin em ê bixwazin ser bigirin. Lê me nikarîbû em wer tevbigerin. Di çalakiya wî de kîjan peyam barkirî be diviyabû me girtiba û bi her tiştê wê re kiriba ya xwe. Kesekî durist, ji dil tevdigere, girêdayî rêberên xwe û gelê xwe li hemberî peyamê nikarîbû serî li şîrove û helwestên cuda daba. Dijmin jî hêmanên rastî yên çalakiya Mazlûm tavilê fêm kir. Hesab kir ku mimkun e ji nû ve ji berxwedanê re bibe çirûskek û ji bo bigihêje armanca xwe ya jiyandina xiyanetê pêvajo hê leztir kir. Çerxa xwe bi awayekî hê bêrehm da xebitandin. Bi tirs û panîka di rêya Mazlûm vekiriye de dibe ku ji bo valaderxistina pêvajoya xiyanetê li pey hevdu mirin û çalakî pêk werin, hovîtiyeke hê mezintir pêş xist. Bi kurtasî çalakiya Mazlûm têr nekir ku wan rawestîne. Li giştî girtîgehê teslîmiyet bi hemû giraniya xwe dewam kir. Piştî çalakiyê rabûneke girseyî çênebû. Lê agirê ku fitîl pêxist, bû beyreqdarê çalakiyên bi heybet ên paşê. Piştî meheke bi bêdengî derbas bû, Gulanê çalakiya Çaran pêk hat.

Ji ber tecrîda giran qawîşan heman rojê girseyê çalakî nebihîstin. Hinekan paşê bihîstîne. Xeyrî di dadgeha yekemîn a

piştî çalakiyê de mafê axaftinê werdigire û diaxive. Hewl dide derbasî girtekan bide kirin ku Mazlûm ji bo protestokirina zext û îşkenceyan dawî li jiyana xwe aniye, bi vî awayî agahî belav dibe. Bi giştî rê li ber xemgînî û bandoreke mezin vedike. Di serî de kadroyên me û girseya me pir bandor dibin. Ji xwe hêrs dibin. Bandor û lêgerînên li 35'ê li wan deran jî didomin. Nîqaş û lêgerînên "ev wer nameşe, divê em tiştekî bikin" li wir jî xurt dibe. Lê li qawîşan jî gavavêtin û çalakiyeke ku veguhere helwesteke fiîlî, berçav a menzereya giştî ava bike nîn e. Bandora wê ya herî mezin a li qawîşan ev e ku heke bi awayekî berçav nekevin nav tevgerê jî baweriya divê hin tişt bên kirin xurt dike. Bi kurtasî çalakiyê li qawîşan bandoreke mezin afirandiye.

## Kurtejiyana Mazlûm Dogan

Heval Mazlûm sala 1955'an ji dayik bibû. Ne zewicîbû. Ji navçeya Depê ya Elezîzê bû. Di temenekî ciwan de ji nav me veqetiya. Xwedî wê tecrûbeyê bû ku jiyaneke tijî, gurûgeş û zindî û bi tevger di wê jiyana xwe ya kurt de bi cih bike. Mazlûm bagerekî ku Kurdistana sist û sekinî hejand.

Mazlûm yek ji kadroyê kakil ê tevgerê bû. Kesên di merheleya yekemîn a komê de wezîfeya aktîf wergirtin, damezrînerên partiya me bûn. Li Enqereyê Zanîngeha Hacettepe Beşa Ekonomiyê dixwend. Sala 1975'an Serok Apo nas kir û di nav têkoşînê de bi awayekî aktîf cihê xwe girt. Di merhelaya koma îdeolojîk de têra xwe bi hosteyî xwe pêş xist. Xwe bi teoriya sosyalîst gurçûpêç kir. Di nav kadroyên kakil ên pêşeng ên xebatên komê neqlî Kurdistanê kirin de cih girtiye. Li her cihê xebat meşand, pêşketin û avakirinên xurt afirand, rêxistin kir û kir nav tevgerê. Bi aliyê xwe yê rêxistinî jî xwedî tecrûbeyeke xurt bû. Hostetî û pêşketina xwe ya îdeolojîk-polîtîk-pratîk, kesayeta wî ya şoreşger a zelal û sade, jîrbûna wî ew anî asta ku heq dike.

Sala 1978'an li gundê Fîsê yê girêdayî navçeya Licê ya Amedê tevlî Yekemîn Kongreya partî hat avakirin bûye, bûye endamê Komîteya Navendî, paşê jî derxistina organa weşanê ya navendî girtibû ser xwe. Dema xebatên wê yên amadekariyê dimeşand hat girtin. Di lêpirsîna polîs de tiştek qebûl nekir, nasnameya wî ya rastî derneket holê. Ji asteke ji rêzê ket girtîgehê. Dema beriya têkçûnê di rêxistinbûna girtîgehê ya partiyê di asta navendî de cih girt. Dema li qawîşan ma di perwerdeyên girseyê de tecrûbe û danehevên xwe xist xizmeta partiyê. Her wiha tecrûbeya xwe ya teorîk, siyasî bi qismî be jî nivîsand û ji partiyê re şand. Taybetmeniya herî diyar û bingehîn a Mazlûm evîna wî ya ji zanistê re bû. Lêkolînerekî mukemel bû. Di xebatên xwe de xwedî xwestekeke mezin bû û ji xebatên xwe têr nedibû. Ji ser pirtûkan ranedibû, yek ji mejiyê partiya me û gelê me bû. Her ku teoriya şoreşgerî fêm dikir, dizanî di şexsê

xwe de nîşan bide. Ew ne kesekî ku di gotinê cuda jiyanê de cuda bû. Di jiyan û têkoşîna xwe de pir hevgirtî û bi rêgez bû. Pênûsa wî jî pir xurt bû. Bi awayekî kûr ku muceredkirinên teorîk dikir, xwedî wê sadebûnê bû, dikarîbû wê bi mirovên herî nezan bide fêmkirin. Ji bo meşandina têkoşîna şoreşgerî dizanîbû ji derfeta herî biçûk feyde bigire, pêşkêşî şoreşê dikir. Mazlûm bi qasî aliyên xwe yên din bi helwesta xwe ya bi rêgez a di mijarên rêxistin û disîplînê de jî rêberekî ku timî wê were bîranîn. Di nav şert û mercên herî zehmet de jî şêweyê jiyaneke girêdayî rêxistinê û disîplînkirî bi hostetiyeke mezin dimeşand. Di têkiliyên hevaltî û hevrêtiyê de ji dil bû. Dilnizm bû. Tu carî asta xwe li hemberî kadroyan û girseyê bi kar neanî. Bi jiyan û fikra xwe rênîşanderekî mezin û mamostayek bû. Dema mijar berjewendiyên partiyê û gel bûn hêza îradeyê ya xurt bi kar dianî, bêyî bisekine mudaxele dikir.

Hemû taybetmendiyên min behsa wan kirin, li her cihê ku bêhn distend jiyanî bibûn. Di Mazlûm de têkildarî feydeya ji têkoşînê re cudahiya hundir, derve tune bû. Şoreşgerek li her cihê lê divê şêweyê jiyana şoreşgerî bidomîne. Kesên bûn şahidê jiyana Mazlûm a girtîgehê, dîtine bê çi qasî ji dil, bi biryar, disîplîn û fedakar tevgeriyaye.

## Di Tarîtiya Zindanê de Afirandina Berbangê

Ferhat-Necmî-Mahmût-Eşref

Tov
dema dikeve axê
çawa di hembêza axê de
germa zer a rojê dimije
çawa şitil dide
û şitil jî kulîlkê
û kulîlk fêkî
vaye, çar canên bi çirûska Mazlûm pêt
wergirtin û şewitîn jî wer hûnandin jiyan
li Mahsena 33.
Di wexta tarîtiyê de
Bi hibra ji agir, xwîn û barûdê
Hûnandin dîroka gelekî
ew qasî egîd
ew qasî ji dil
Çar canan nivîsandin: "Dostno; Ev
DESTANA VEJÎNÊ YE"

************

Em ê behsa pêvajoya heta rojiya mirinê jî bikin. Em dizanin bê Mazlûm çi dixwaze. Pêşketinan, rewşa dawî ji bo mirov berê xwe bide çalakiyeke hê encamgir, sedem ji holê ranedikir. Şert û mercên di aleyhê me de bi hemû giraniya dewam dikirin. Çirûskekê têr dikir ku mirov girseyê bixe nav çalakiyê. Zemîna çalakiya girseyî hê tune bû. Ji ber teslîmiyeta giran a piştî têkçûna 1981'ê hat texrîbata di girseyê de hê kûrtir kiribû. Ji bo girse careke din bigihêje asta rabûna ser piyan, diviyabû hin gavên diyar bên avêtin. Diviyabû mirov yeqîn kiriba û dîtiba ku wê berxwedanên nû serketinê bînin. Sala 1981'ê di wan rojên ku erozyon hê ev qasî ne mezin bû, me nikarîbû girseyê bi-

kişînin nav berxwedanê. Li derveyî berxwedanê mabûn. Armanca me ya esasî afirandina berxwedaneke nû û daîmîkirina wê bû. Lê xeleka esasî ya wê kêliyê ya diviyabû bê têgihiştin jî ne ew bû ku mirov berxwedaneke girseyî derxe holê, rawestandina xiyanetê bû. Piştî çalakiya Mazlûm, ev hewldana me hê xurttir bû.

Têkildarî mijara ku me yê fikir û biryar di jiyanê de bi cih kiribana û di valaderxistina polîtîkayên dijmin de çi hewce kiriba me yê kiriba. Lê diviyabû em vê jî bibînin; li cihekî ku xiyanet ev qasî bêperwa bûye, eger heza te ya ku tu teslîmiyetê bi awayekî yekpare bişkînî tune be û tu bi wî halê xwe di rewşeke ku tenê dikarî li dijmin bixe de bî, tu rabî berê xwe bidî hedefên hêza mezin pêwîst dike û bixwazî lê bidî tê encam negirî. Ji bo te hêza di destê xwe de xerc kiriye tu nikarî li hedefa nêz jî bidî, tê belawela bibî. Pêwîst e taktîkên rast bên diyarkirin, hêz bi zanebûn û plan neqlî meydanê bên kirin. Li gor karaktera pêvajoyê hilbijartina şêwazê tevgereke rast mecbûrî ye.

Di wan rojan de hedefa nêzîk rawestandina xiyanetê û astengkirina wê bû. Ji ber tehlûkeya herî girîng a dihat ferzkirin ew bû. Li aliyekî li girtîgehê pêvajo wek kombûna van têkilî û nakokiyan pêş diket, li aliyê din jî mirov derdiketin dadgehan. Îfadeyên îtîraf û xayînan hêdî hêdî digihiştin dadgehan, di rûniştinan de dihatin xwendin. Li hemberî îfade û sûcdariyên xayînan, diyarkirina helwestan, parastina partiyê û li ser navê partiyê bersivandin, peyama ji girseyê re herî zêde karê Kemal û Xeyrî bû. Ji bo çalakiyê em ê li benda dema hatibû fikirîn nemabana. Di vê pêvajoyê di merheleya bersiva ji îtîrafan re wê çalakî hatiba destpêkirin. Bi vî awayî em diketin Gulana 1982'yan. Yildirim Merkît di îtîrafên xwe de şîfre û belgeyên li cem polîsan nehatibûn analîzkirin deşîfre kiribû, di wê navberê de asta rêxistinî ya Ferhat Kûrtay jî derxistibû holê. Jixwe beriya îtîrafên Merkît, Ferhat bi îhtîmala dibe ku tehliye bibe yan jî kêm ceza bigire parastina siyasî nedikir. Esat Oktay, li ser esasê îtîrafên Yildirim Merkît, Ferhat tehdîd dikir. Jêre digot: "Tu di komîteya eyaletê de yî. Binihêre çawa her tişt derket holê. Êdî

kesek nikare te ji destê min xelas bike." Piştî van tehdîdan li hemberî kesên di qawîşê de asta îşkenceyê zêde dibe. Her wiha qawîşa 33. cihekî ku îdare nikare îspiyonkeran derxe, yek ji qawîşên herî baş a girtîgehê ye. Hê zêdetir tê hedefgirtin. Zext û îşkence ku didome, Ferhat bi hevalên ji wan bawer dike re diaxive, dixwaze nêrîna wan fêm bike. Bi gotina, "Ev wiha naçe, divê xiyanet û teslîmiyet bê derbaskirin" bala wan dikişîne ser vê mijarê. Hewl dide rewşa siyasî timî zindî bihêle. Di dawiyê de bi komek heval re têkildarî nêrîna pêvajoyê li hev dikin û hewl didin pêvajoyê bi girseyê bidin fêmkirin.

Em hemû di nirxandinên xwe yên têkildarî pêvajoya Girtîgeha Leşkerî ya Amedê de, xeta îdeolojîk û siyasî ya partiyê esas digirin. Em pêvajoyê bi têgînên giştî, şêwazên heman rengî dinirxînin. Her wiha tiştên pêwîst e bên kirin jî em dibînin. Lê di asta fikrî de tevî em nagihêjin hev jî, di navbera me de qutbûneke organîk rû dide. Em nikarin ji hev re binivîsînin, têkilî deynin. Ji lewra wan çawa nîqaş dikir, gihiştine kîjan encaman, helwesteke çawa wê bigirin em nizanin. Lê ew di dadgehan de helwest û peyamên Kemal û Xeyrî esas digirin. Texmîn dikin ku wê 35 ji sedî sed mudaxeleyî pêvajoyê bike, tiştekî bike. Xeyriyan ku di asta herî jor de parastina siyasî dikirin, li hemberî xayînan helwest digirtin, ew bi awayekî mafdar dixist nav bendewariyekê. Hela piştî çalakiya Mazlûm û li hemberî xiyaneta ku bi awayekî herî dijwar dihat ferzkirin, baweriya wan a ji sedî sed heval xwe ji kêliyeke ku wê bêjin raweste, re amade dikin hê zêdetir xurt dibe. Ev hêvî ne tenê li 35'ê li qawîşan jî pir diyarker bû. Di çavên her kesî de îfadeyên, "Ji sedî sed wê hin tişt bên kirin" hebûn. Vê baweriyê liv û tevger, lêgerîn û hewldanên çareseriyan a li qawîşan hê xurttir kir. Kesên dixwazin di aliyê berxwedanê de helwest bigirin, di nav hewldana tavilê bicihanîna wê bendewariyê de, li rêyên ku ya ji destê wan tê pêk bînin digerin. Di nav fikra: "Ez ê çawa karibim feydeyê li berxwedanê bikim" de ne. Tişta Ferhatan dixwest bikin, encama fikra xwe tevlîkirina pêvajoyê bû. Kesên ji hev yeqîn dikin, piştî çalakiya Mazlûm ji dil nîqaş dikin bê wê bibin

xelekeke pêvajoya berxwedanê, nuqteyên hevpar werdigirin. Encama digihêjinê dibe berhemeke kesayeta kamil û sebra mezin a Ferhat.

Ya rastî Ferhat, pîrê qawîşa 33 ye. Bi her kesê di qawîşê de baş li hev dikir, jê hez dikirin, rêz û hurmet didanê û jê bawer dikirin. Wê kîjan şêwazê çalakiyê hilbijêrin bi hevalên ku wê bi wan re çalakiyê pêk bînin nîqaş dikin. Ev heval; Necmî Oner, Eşref Anyik, Mahmût Zengîn in. Ya rastî ji bo mirov tiştên li qawîşa 33 rû didin fêm bike divê mirov hinekî wir fêm bike. Qawîşa 33., ji kesên ku di berxwedana 1981'ê de cih girtibûn, lê li 36'ê dest ji berxwedanê berdan û teslîm bibûn hatibû avakirin. Ferhat, Necmî, Eşref, Mahmût jî di nav wan de bûn. Heval piştî diçin qawîşa 33, heta demekê bi awayekî fedikoyî nêzî hev dibin. Her ku şoqa rojên destpêkê û teslîmbûnê tê derbaskirin, têkiliyên di navbera wan de ji nû ve rast dibin. Helwesta di berxwedanê de nîşan dane lêpirsîn dikin û hewl didin encaman jê derxin. Li wir jî hin hevalên teslîm bûne, lê asta xwe nikarin terîf bikin û xwedî niyeta baş in dibêjin: "Em teslîm bûn, me xiyanet kir! Partiya me, me efû nake, em berevajî bawerî û fikrên xwe ketin, ji bo me her tişt qediya." Di wan rojên destpêkê de dema fikrên wiha giraniya xwe çêkirin, tam belavbûnek tê jiyîn. Têkilî li ser esasê ferdperestiyê bilind dibe. Têkiliyên hemşerîtî, herêmcîtî, ehbap-çawîştiyê pêş dikevin. Heta kêliyeke wer rû dide ku, êdî mirovên heman dozê bi deyn pereyan didin hev.

************

Mudaxeleya herî mezin û bi kok a ji neyêniyên wan rojan re ji aliyê Ferhat ve tê pêşxistin. Ji bo hê zêdetir jirêderketina nirxên şoreşgerî pêk neyên, dikevin nav hewldana xwe komî ser hev bikin. Ji bo vê jî destpêkê di plana fikir de têkiliya teslîmiyet-xiyanetê tê destgirtin. Ferhat bi nirxandinên rast ên weke; "Belê, em teslîm bûn, em li hember fikir û rêgezên xwe berevajî tevgeriyan, lê me hê xiyanet nekiriye, teslîmiyet ne xiyanet e.

Serê rêya ku diçe wê ye. Di vê rêyê de gava yekemîn e. Heke em xwe komî ser hev bikin, em dikarin ji xiyanetkirinê rizgar bibin, bi vê gava şaş a me avêt, em dikarin ji nav wê kirêtiya ketine nav derkevin, em dikarin bibin layiqî partî û gelê xwe. Xwekomîserhevkirin tê maneya; em hêza xwe bikin yek, bi zanîn, tecrûbe û hostetiyên xwe berê xwe bidin şikandina zincîra teslîmiyetê" mejiyan zelal dike û hevalan îqna dike. Bi vî awayî derbasî jiyana rêxistinkirî dibin. Destpêkê komun tê avakirin, paşê di navbera hin mirovan de xebata perwerdeyê didin destpêkirin. Piştî demeke din jî otorîteya şoreşgerî bi cih dikin. Ew rewşa erênî ya ruhî û piştevanî bandora xwe li derveyî qawîşê jî dike. Ji pêdiviyên komunê qut dikin, ji bo tevkariyê li berxwedana 35-36'ê bikin pereyan kom dikin. Yanî 33, di demên destpêkê yên teslîmiyetê de komî ser hev dibe.

Bi qasî em dizanin bi giştî pêkhateya qawîşê erênî ye. Yek ji qawîşên ku îdareyê di kontrolkirinê de zehmetî dikişand. Timî bi pîvan nêzî wir bûn. Demek dirêj e ji bo wir bixe bin kontrola xwe pir hewl dide, îşkence dike, lê ji ber di qawîşê de kontrola şoreşgerî tê pêkanîn encam nagire. Bi taybet îşkenceyê li kesên ku li hember lêdanê zeafa wan heye dike û dixwaze wan bike îspiyonker. Lê xebatên Ferhatan ên ronîker ên têkildarî perwerdeyê, desteka pêşkêş dikin lîstika îdareyê xera dike. Di qawîşê de piranî PKK'yî ne, ji tevgerên din ên siyasî jî mirov hene. piranî ciwan in, lê kesên 60-70 salî jî hene. Di qawîşê de piştevaniyeke bedew hatiye pêşxistin, di 33'yê de zemîneke baş heye, pêşketinên hundir û derve yên siyasî tên nirxandin û nîqaşkirin. Encama herî diyarker a nirxandinên têkildarî girtîgehê ew e: "Teslîmiyet, bi zext, îşkence û zorê hat sazîkirin. Tenê dikare bi zora şoreşgerî ya girtiyan bê rakirin." Ferhat êşa kûr û neqebûlkirina teslîmbûnê wer tîne ziman: "Mirov bibîne ku pêkanînên hovîtiyê ji aliyê îdareyê ve hatine rakirin wê ji bo me bibe hilweşîn. Em ê careke din bi hêsanî nikaribin pişta xwe rast bikin. Eger îdare, rojekê hemû pêkanînan rawestîne û bêje: 'Êdî ez tiştekî ji we naxwazim' em ê çawa li rûyê hev binihêrin? Di rewşeke wiha de eger em derkevin derve jî em ê çi ji gel re

bêjin? Ma wê ji me pirs nekin û nebêjin; ‘Çima we ev fikra xwe di zindanên mêtinkaran de qîr nekir, lê we sirûd timî qîr dikirin. Eger sibe dîsa we kom bike, hûn ê Kurdistanê jî, şoreşgeriyê jî ji bîr bikin?’ Lewma pêwîst e em zincîra teslîmiyetê bişkînin…” Qawîşeke ku xwe komî ser hev dike, têkiliyên bi tenduristî pêş dixe. Xwezayî ye ku di cihekî pêvajoyê de wê bibe xelekeke berxwedanê.

Roja şehadeta heval Mazlûm kesên ji qawîşa 33 diçin dadgehê çalakiya Mazlûm dibihîzin. Di vegera dadgehê de kesên rewş fêr bûne bi fikra wê şehadeta Mazlûm bibe sedema neyênî û bêhêvîtiyê hewl didin veşêrin. Lê çi qasî veşêrin jî bêmoraliya kesên rewşê dizanin bala mirovên din dikişîne, dixwazin sedema wê fêr bibin. Wê rojê piştî xwarina êvarî agahiyê didin qawîşê. Her kes dest bi girî dike. Agahiya diçe qawîşê ji ber fêmkirineke şaş weke bi awayê “Mazlûm xwe şewitandiye” diçe. Mirovên herî ji rêzê jî êdî dibêjin, “Êdî bes e, divê mirov dawî li vî karî bîne.” Agahiya mirinê di nav hevalan de ne neyênîtî û bêhêvîtiyê, berevajî pêşxistina berxwedanê zêde dike. Bertekên destpêkê wiha ne, “Piştî ku Mazlûm xwe feda kir, em ê ji çi bitirsin, canê me ji yê wî ne bi qîmettir e” û hwd. nirxandinên hestyarî tên kirin. Fikra îsyanê û pêşxistina berxwedanê bi bi awayekî zêde tê nîqaşkirin, nêrînên nû û cuda tên pêşxistin. Ez behsa yek ji pêşniyarên balkêş bikim: “Bila qawîşa 33. îsyan bike, gardiyanan teslîm bigire, tevahiya korîdorê deriyên qawîşan veke, girtiyan jî tevlî îsyanê bike û piştî deriyên hucreyên 35’ê vekin, bila yên din rêberên me hal bikin.” Mahmût Zengîn hema çawa, Mazlûm dibihîze dibêje, “Pêwîst e em jî weke Mazlûm îspat bikin ku em dikarin ji bo dozê canê xwe feda bikin!..” Pêşxistina zext û terora îdareyê li 33, bi awayekî aşkera tê dîtin. Wê demê çend kesan ji qawîşê dibin û bi zorê kaxeza îtîrafkariyê bi wan didin îmzekirin. Lê ew jî li dadgehê diyar dikin ku bi zorê bi wan dane îmzekirin û red dikin. Di wan rojan de Ferhat, Necmî, Mahmût û Eşref hê zêdetir nêzî hev dibin. Her ku firsendê dibînin, li ser çalakiya wê pêk bînin bi dizî diaxivin. Ji ber zêde tên cem hevdu hin kes gumanan dikin,

lê nizanin sedem çi ye. Necmî heman demê berpirsyarê qawîşê ye. Nobetên şevê jî ew bi xwe eyar dike. Di hundirê qawîşê de li beşa pişt beşeke dûkêşa mutfeqê lê heye. Li ser koşebendên hesin ên di ber dûkêşê re derbas dibin qazana kalorîferê hatiye danîn. Di bin qazanê de jî dema mirov ji deriyê derve û kunên zereqeyê dinihêre beşeke biçûk a nayê dîtin heye. Ji ber di qawîşê de îspiyonker tune ne, girtî wir ji bo kesên ne rehet û nikarin perwerdeyê bibînin carinan îstirehet bikin bi kar tînin. Dîsa di rojên ku Çaran amadekariyên çalakiyê dikirin, Eşref û Mahmût ji kantîna derve re 15 kg. tîner dinivîsinin. Ji ber li girtîgehê kelûpelên boyax û tînera ji bo nivîs-xêzkirinan ji aliyê girtiyan ve tên kirin, li 33'yê jî gelek deverên bên nivîsandin û xêzkirin hene, nivîsandina tînerê bal nakişîne. Lê mîqdarê hatiye nivîsandin pir zêde ye. Ya rastî kelûpelên weke boyax, tîner û qirtasiyeyê piranî di kontrola gardiyan de ye. Hela tiştên weke tînerê li qawîşan nayên girtin, piştî tê bikaranîn derdixin derve. Lê Necmî hinekî ji ber berpirsyarê qawîşê ye, bi hewldana xwe, hinekî jî ji ber bêbaldariya leşker dikare kelûpelên boyaxê di hundir de bihêle. Bi kîloyan tîner bala îdareyê nakişîne, lê bala hevalê ku lîsteya kantînê amade dike dikişîne! Diçin ji Mahmût û Eşref re dibêjin, "We 15 kg. tîner da nivîsandin, lê ma ev qas ne zêde ye?" Ew jî dibêjin, "Me ji Ferhat xoce pirs kir, got dibe. Tu li gor xwe binivîsîne." Heval ji ber nizane bê ev qas tîner wê ji bo çi bê bikaranîn, hinekî jî aciz dibe û diçe cem Ferhat. Dibêje, "Ferhat xoce, jixwe pereyên me kêm in, hevalan 15 kg. tîner dan nivîsandin. Ma ne pir e? Em çend kîloyan bikirin ne bes e?" Ferhat jî dibêje, "Tu ya tê xwestin binivîsîne, wê pêwîst bike." Tîner tê kirîn. Mahmût û Eşref ji ber bi karê boyax û nivîsandinê re eleqedar dibin, tînerê digirin. Mahmût vedişêre. Piştî demekê jî tînera hatiye qawîşê tê jibîrkirin. Bi kurtasî Ferhat, Necmî, Mahmût û Eşref xwe ji bo pêkanîna biryara ku pêwîst e meşaleya Mazlûm pêxistiye venemire amade dikin.

Ferhat, Necmî, Mahmût û Eşref demeke dirêj di nav xwe de lidarxistina çalakiyê nîqaş dikin. Lê hê di aliyê şêweyê çalakiya li dar bixin de biryar nedane. Piştî haya wan ji çalakiya Mazlûm

çêdibe, di mijara şêwaz de zelal dibin. Dibêjin, “Mazlûm meşale pêxist. Gavavêtin û ya pêwîst e em bikin nîşanî me da. Niha dor a me ye. Divê em meşaleyê dewr bigirin.” Paşê jî şêwazê çalakiyê diyar dikin. Ji bo xiyanet û tarîtiyê kun bikin, berxwedana bi Mazlûm re dest pê kiriye xurt bikin, agir hê zêdetir gur bikin biryara xweşewitandinê digirin.

Mirov dema bi karekî wer radibin, ne der heqê hin kesên din, lê der heqê xwe de ku biryaran digirin, bi şewitandina bedena xwe yek ji şêwazê herî zehmet ê mirinê hildibijêrin tu bikî nekî mirov bandor dike, dihejîne. Ji ber mezinbûna biryarê li holê ye. Biryareke wiha tenê mirovên dozên mezin dikarin bigirin. Ne mimkun e mirov di bin wê mezinbûnê de nepelçiqe, hurmetê nede biryara wan, xweziya xwe bi îradeya wan neyne!.. Lê dema mirov li gor dem, pêvajo, encamên derxe holê û mezinbûna dozê digire dest, her tişt maneya xwe dibîne. Şeklê mentiqa wergirtina biryara xweşewitandinê, hilbijartina vê rêbazê hê zêdetir dide fêmkirin. Ewrên tarî ser Kurdistanê girtine, teslîmiyet û pasîfîkasyon li ser gelê me hatiye ferzkirin, pir pêş de çûne. Li girtîgehê jî bi awayekî zêde tê pêkanîn. Gavên girîng jî hatine pêşxistin. Em di pêvajoyeke pir zor û zehmet û tarî re derbas dibin. Em di nav hewldana hebûnê de ne. Diviyabû mirov maneya dîrokî ya Mazlûm bide jiyîn, kevneşopiya Newrozê berdewam kiriba, derbeke giran li tarîtiyê xistiba, wek gel pêşiya pêvajoyeke nû vekiriba û ketiba wê rêyê.

Di dîroka Kurdistanê de wek şêwazekî çalakiyê “xweşewitandin” em nabînin ku bûye wek kevneşopiyekê, mînak di Japonan de harakîrî; kevneşopiya xwetunekirinê heye. Lê di me de kevneşopiya ku bi Newrozê tê neqilkirin, meşaleya azadî û ji nû ve vejînê agir e. Agir, tenê ne amûrekî coşê yê ji çiyayan ber bi çiyayan tê pêxistin e. Ola berê ya gelê me Zerduştî ye. Di vê olê de agir pîroz e. Tevgera me jî şîrovekarê hemdem e yê hesreta azadî û serxwebûna bi agir tê sembolkirin e. Agir di me de bûye zimanê banga şer û pevçûnê. Ji Mazlûman dest pê kir, ber bi Ferhatan, Xeyriyan û ji wan jî ber bi çiyayên Kurdistan Karasûngûr û Mahsûman dirêj bûye.

Daîmî bûye û venemiriye. Di wan rojên ku hema hemû rêyên derketinê hatibûn xitimandin, çalakiya xweşewitandinê encameke bi taybet a me ye û ya demê ferz dikir. Ji bo reşetarî hatiba parçekirin, mirov komî ser hev hatibana kirin, rêya derketinê hatiba nîşandan diviyabû beden weke meşaleyê hatibana pêxistin. Tenê bi çalakiyeke wiha mimkun bû mirov girtiyan ji xewa mirinê şiyar bike û wan bîne ser hişê wan.

Me diyar kiribû ku em hatine tecrîdkirin. Ev mijar ji agahî dayînê re hatiba hiştin wê bi mehan ajotiba. Lê di wê pêvajoyê de Ferhat piştî asta xwe ya rêxistinî datîne holê di rûniştina dozê de mafê axaftinê werdigire û diaxive. Dema derdikeve kursî ew û Xeyrî hevdu dibînin. Xeyrî bi awirekî gelek tiştan jê dipê li Ferhat dinihêre. Lê Ferhat bêyî parastina siyasî bike têkildarî îdîayan çend tiştan dibêje û ji kursî dadikeve. Dema vedigerin qawîşê Ferhat hestên wê kêliyê bi vî awayî ji hevalan re radigihîne, dibêje: “Xeyrî bi awayekî ku bêje, bi esasî ez dixwazim tu parastinê bikî, li min dinihêrî. Dema Eşref parastin kir pir kêfxweş bû. Lê ji ber min nekir, ew pir xemgîn kiriye, mîna pê birîndar bû. Kêm nabû li hember awirên wî yên bi israr min ê parastin kiriba, lê min nekir.”

Ji ber sedemên me behs kiribû, Ferhat ji serî de parastina siyasî nedikir. Lê di wê nuqteyê de dema parastina siyasî nedikir, di mejiyan de dibû sedema pirsnîşanan. Ev jî pir xwezayî ye. Xeyrî li Ferhat dinihêre, ji ber hêviyên wî jê hene; kesayeta wî, xisleta wî ya milîtanî dizane. Ferhat difikire ku pêwîst e parastinê bike, lê eger bike wê îdare wî ji qawîşê derxe bibe 35’ê. Eger ji qawîşa 33 veqete wê çalakiya ku bi rojane plan dikin betal bike. Lewma bêdeng dimîne, naxwaze çalakiyê bixe rîskê. Dîsa heta pêkanîna çalakiyê biryar digire ji kesên li qawîşê re behs nekin û vê heta dawiyê pêk tînin. Bi giştî û bi taybet li qawîşê zext û ferzkirina îtîrafkariyê bi hemû leza xwe ku didome, dîroka çalakiyê jî diyar dikin. Şeva 17’ê Gulana bi 18’ê Gulanê ve girê dide. Yek ji rojên manedar ên dîroka partiya me ye. Hakî Karer 18’ê Gulana 1977’an ji aliyê ajan-provokatoran ve û 19’ê Gulana 1978’an Halîl Çavgûn ji aliyê çeteyên feodal

ve hatin qetilkirin. Ferhat, Necmî, Mahmût û Eşref wê rojê bi zanebûn hildibijêrin. Ji bo kevneşopiya berxwedanê ya partiyê daîmî bibe, têkoşîna li derve û ya li girtîgehê bê yekparekirin biryar digirin wê rojê çalakiyê li dar bixin. Piştî Mazlûm dixwazin çalakiyê bînin rastî rojeke herî watedar.

Ferhat, Necmî, Mahmût û Eşref ji bo mane û girîngiya çalakiya Mazlûm bi kesên li qawîşê bidin fêmkirin bi rojan nîqaşan dikin. Bal dikişînin ser mijara ku bivênevê divê çalakî bê lidarxistin û bi vî awayî qawîşê ji çalakiya xwe re amade dikin. Lê ji bo çalakiya xwe nedin ferqkirin hesas nêz dibin. Kesên li qawîşê dibînin ku rojên dawî di tevgera Çaran (Ferhat, Necmî, Mahmût û Eşref) de germahî, gurûgeşbûneke hê zêdetir heye, lê nikarin maneya wê analîz bikin. Carinan peyamên ku kesekî baldar tavilê fêm bike didin. Mînak îdare rojekê lîsteya kantînê dixwaze. Ferhat dixwaze fringî, xiyar û hwd. jî bê nivîsandin. Hevalê lîsteyê amade dike dema dibêje ku sebze hê teze ne û pir buha ne, Ferhat dibêje, “Tişt nabe, tu binivîsîne bila heval cara dawî fringî û xiyaran jî bixwîn.” Lê heval nafikire bê “cara dawî” tê çi maneyê. Dîsa rojekê dema Eşref bi hevalekî re diaxive dibêje: “4-5 kes eger xwe bişewitînin, li gor te wê çawa be, wê tesîra xwe bike?” Dibêje ku mimkun e çalakiyeke wiha di çirandina tarîtiyê de bibe amûrekî bi bandor. Her wiha Ferhat, Necmî, Mahmût û Eşref wan rojan di astên awarte de hestyar in. Ji bo kesî neşkînin, pir hewl didin, bi xweşbînî nêz dibin. Tiştekî din a bala hevalan dikişîne jî ev e ku Ferhat, Necmî, Mahmût û Eşref beriya çalakiyê eşyayên xwe yên “bi qîmet” belav dikin. “Hema di carekê de” ku eşyayên xwe wek diyarî belav dikin, hinekan dide fikirandin. Çend rojên dawî hinekî din aşkera diaxivin. Di her axaftina xwe de behsa girîngiya alîkariyê, piştevaniyê, baweriya bi pêşeroj û partiyê re dikin. Her ku derfetê dibînin koman ava dikin, di gelek mijaran de nêrînên xwe tînin ziman, girîngiya dilsoziya bi şoreş û nirxan re tînin ziman. Di nav rewşeke mirovên wê warê xwe terk bikin, ber bi rêwîtiyeke dirêj ve bikevin rê, şîrêtên xwe yên dawî dikin. Sohbet heta derengiya şevê didome.

Bi qasî tiştên ku me ji kesên li qawîşa 33, bûn guhdar kir; wê şevê li qawîşê hewayeke cejnê heye. Her çar jî pir aram û rehet in. Hundirê çavên wan dikene, timî rûken in. Ferhat axaftvanekî baş bû. Wê şevê hevalan pir hestyar û bi coş dike. Di axaftina xwe ya dawî de careke din behsa girîngiya maneya çalakiya Mazlûm dike. Pêvajoya xwe dinirxîne, teslîmbûna xwe ya sala 1981'ê rexne dike, diyar dike ku di wan deman de gelek erdhejên hestyar ên mezin jiyaye. Axaftina xwe wiha bi dawî dike: "Divê mirov ji çûna serberjêr a di dîroka Kurdistanê de bêje raweste, ala têkoşînê ji dest bernedin, bi çar destan dozê û hevdu hembêz bikin." Hevalên din jî axaftinên bi heman rengî dikin, civîna xatirxwestinê li dar dixin. Kesên guhdar dikin, dikevin nav hestên tevlîhev. Hîs dikin ku tiştekî awarte wek bagerê nêz dibe, lê tehlîl nakin bê wê çi bibe.

Ferhat, Necmî, Mahmût û Eşref ji bo bi ser bikevin, paşde veger çênebe her tişta gengaz e dikin. Mînak ji bo çalakiyê kelûpelên pêwîst, pir veşartî bi dest dixin û vedişêrin. Du kîs eşyayên ku di dema kontrolan de, leşkeran tevlîhev kirine, qetandine, bêxwedî û bal nakişîne kom dikin. Ji bo gurkirina agir, datînin cihekî. Karê nobetê jî Necmî çareser dike. Wê şevê Eşref, Mahmût, Ferhat ji bo nobeta saet 01.00-03.00 tên nivîsandin. Ji bo çalakiyê beşa di bin qazana kalorîferê de ya dema gardiyan, di derî û zereqeyê de binihêrin nebînin hildi-bijêrin. Ev amadekariyên pratîk in. Ya herî girîng û xwezayî jî ev e ku kes di aliyê fikrî de xwe amade bike. Kesekî ku yeqîn kiriye bûyer rast û mecbûrî ye û xwe îqna kiriye, rê û rêbazên dikare çawa pêk bîne jî dibîne. Çaran ji destpêkê ve biryardarî û dilsoziya xwe qet winda nekirine. Di têkoşîna derve de ruhê Apocî di kesayeta xwe de dane jiyîn. Min ew li derve nas diki-rin. Me bi Mahmût û Eşref re xebat meşand. Mahmût wê demê hevalekî pir ciwan bû. Necmî jî bi heman rengî. Min Necmî sala 1980'î li girtîgehê nas kir. Eşref jî ciwan, milîtanekî bi biryar bû. Daneketibûn kûrahiya polîtîkayê, lê kesayetên xwe bi ruhekî milîtan, meziyetên coş, samîmiyet û duristiyê gurçûpêç kiribûn. Xweşewitandin şêwazê çalakiyeke pir zehmet û giran e. Mirov

êşên mezin dijî. Divê îrade û baweriyeke ku bersiva wê çalakiya mezin bide û têk bibe hebe. Yan na pêk nayê. Ma karekî wer besît e mirov xwe biavêje nav agirekî pêxistî?.. Di nav êşan de mirov bibîne ku bedena wî dişewite, çermê laş radibe, goştê wî diqele, vê bi hemû dijwariya xwe bijî, lê tevî vê jî bigihîne encamê. Her mirov nikare vê bike. Ev karekî mezin e.

Pêwîst e mirov mezinbûn û xweseriya çalakiyê bi vî aliyê wê ve binirxîne û fêm bike. Tek tek şexs dikarin xwe bişewitînin. Ev bûyerên timî tên dîtin û rû didin. Lê çar kes ku xwe rêxistin bikin, bibin yek kes û bibin îradeyek, çalakiyê bi ser bixin û şehîd bikevin timî nayê dîtin. Di rojiya mirinê de jî pêvajoya biryara şexsî dimeşe. Di çalakiya Çaran de jî biryara şexsî heye. Lê pratîk û pêkanîn jî ji vê derdikeve, îrade û bedena çar kesan dibe yek. Xweşewitandina yek kesî û çar kesan ne heman tişt e. Bandor û maneya wê û nirxên lê bar dike hê mezintir in. Îradeya pola ya bi wan re di her kesî de peyda nabe. Di bihara jiyana xwe de bi bawerî û ezma xwe, bûn mirovên ku ew mezinbûn afirandin. Em bêdawîbûna sedeqeta wan a ji pêşeroj, baweriya bi gel û partiyê re dibînin. Di mirovên me yên bûn êgir, di pevçûna ku wan bi êgir şûşt, di qîrîn û dirûşmên li ser zimanê êgir derdikevin de têkneçûna têkoşînê dibînin. Ma ji bedenên ku bi saxî dişewitin hê mezintir biryardarî heye? Vî şerî, pêşeroja azad û serbixwe ji sedî sed, ji sedî sed ku em ê qezenc bikin, tenê ev bedenên dişewitin jî mizgîniya wê didin. Em di wan bedenên nav wî agirî de dişewitin, dibînin ku daneheva gelekî, şoreşekê û mirovatiyê bi gewde bûye. Çaran bi rastî bi cidiyeteke mezin û ji dil çalakî plan kirine û pêk anîne. Bi awayekî ku piştî bedena xwe bidin ber êgir, kes neyê wan xelas neke hewl dane her tiştî eyar bikin. Soza, serketin û qezenckirinê dane. Bi biryar in bi mirina xwe berxwedanê pêş bixin. Piştî her kes radize, di demeke guncaw a nobeta 01.00-03.00 de derbasî cihê çalakiyê dibin. Çi qas, eşya, rojname û kaxezên ku berê amade kirine li wir kom dikin, tînerê jî bi bedena xwe û bi ser eşyayan dadikin. Li derdora tiştên kom kirine bi awayekî çarmêrkî rûdinin. Dest û mil dikevin hev. Kibrîtê pê dixin.

Teqîneke mezin… Paşê êgir bilind dibe. Di nîvê êgir de Ferhat, Necmî, Mahmût û Eşref… Ên me… Dişewitin… Dest, zend û milên wan hê di hev de ne… Dirûşman qîr dikin… “Bimire mêtinkarî! Bijî PKK! Bimire zilm! Ji îşkence û zextan re bes e!..”

Bi teqîna tînerê re her kes ji nav livînên xwe radibe. Dixwazin fêm bikin bê çi bûye. Di carekê de bi wî agir û dûmana ku ji wê beşa biçûk bilind dibe rûbirû tên. Her kes matmayî ye, hê nehatine ser hişê xwe. Di carekê de dicemidin. Paşê bi panîk pirsa, “Ev çi ye, ev agir çi ye?” dikin. Piştre li qawîşê kaosek rû dide. Kes nizane wê çi bike. Em ji devê kesên ew kêlî jiyane vebêjin.

Gotinên hin hevalên bûne şahidê çalakiyê wiha ne:

“Dema ez rabûm her cih bibû dûman. Tişta yekemîn hat aqlê min ev bû ku dema nobedaran cigare kişandine şewat derxistine û venemirandine. Bi vê fikre bi armanca di vemirandina şewatê de bibim alîkar ji ser cihê xwe rabûm. Li ber deriyê qawîşa me bîdonên me yên avê hebûn. Tam dema ez ber bi bidonan ve diçûm, ji nav êgir dirûşmên, ‘bimire mêtinkarî’ min bihîst. Û sekinîm. Min nizanîbû ez çi bikim. Aşkera ev çalakiyek bû. Min biryar nedida ez wan xelas bikim an na.”

“Ji ber xewa min giran bû, min dengê teqînê nebihîst. Lê li ser dengê qîrîn û bangê şiyar bûm. Hê ez li derdora xwe nenihêrîbûm, bi dengê ‘şewat heye’ veciniqîm. Her cih bibû dûman. Tevî wê jî agir xuya dikir. Tişta destpêkê fikirîm ev bû ku ranze û qawîş dişewite. Û em ê bi saxî bişewitin. Hin girtiyan pencere dişkandin û bi gotina, ‘Li vir şewat heye!’ qîr dikirin. Demeke dirêj wer cemidî mam. Li derdorê nihêrîm. Tevî ku difikirîm em ê bimirin û weke mişkan em ê bifetisin jî min hewcedariya tiştekî bikim hîs nedikir. Ez hînî mirinê bibûm. Paşê bi dirûşmên ji nav êgir bilindibûn, hatim ser hişê xwe û ji ranzeyê daketim.”

“Ez bi dengê teqînê şiyar bûm. Bi şiyarbûnê re yekemîn tişta li ber çavên min ket agirê dijwar û gur bû. Ez difikirîm bê ev çi ye? Çi dibe? Û min hewl dida sedema agir fêm bikim. Hê min

tiştek fêm nekiribû çavên min li livînê Ferhat xoce ket. Vala bû û qet xera nebibû, weke xwe disekinî. Paşê dema min kaxeza vekirî ya li ser livînê wî dît, mîna min her tişt fêm kiribû. Di navbera wê kaxezê û tişta min didît de min pêwendiyek danî û kêm be jî gihiştim encamekê. Ez fikirîm min got, Ferhat xoce xwe şewitandiye. Min kaxez wergirt û xwend. Kaxezeke dosyayê bû kiribû du qat. Li hember rastiya ku min li dawiya nivîsê dît pir û pir matmayî mam. Di nav wî agirê dijwar de ne tenê Ferhat xoce, tam çar egîdên Kurdistanê ji bo 'ji vê çûna serberjêr a di dîroka Kurdistanê de bêjin bes e' bi saxî dişewitîn. Bi awayê ku ez wê kêliya dîrokî tespît bikim, li saeta xwe nihêrîm. Saet 04.30 bû. Paşê min belavoka bi serenava 'hevrêno' ya di destê xwe de careke din xwend. Her cih bibû dûman. Agir ev qasî dijwar bibû ku esreq dialast û di pencereya nîvvekirî de caxên hesinî derbas dikir û derdiket derve. Te digot qey har bûye. Dengê agir mirov vediciniqand. Bêhna goştê şewitî tevlî agir bibû."

Piştî girtî rewşa matmayî ji ser xwe diavêjin, hin girtî dibezin avê tînin. Hewl didin agir vemirînin. Li ser vê di nav agir de dengê hevalan bilind dibe: "Avê bi ser danekin, avê bi ser danekin! Agir pêxin, agir! Kesê avê bi ser dake xayîn e. Me bi zanebûn xwe şewitand! Ev çalakiyeke siyasî ye, çalakiyê neşkînin!.." Hevalekî din jî wer behs dike:

"(…) Ez cihê xwe rabûm, çûm ser êgir. Agir ew qasî dijwar e ku, qet diyar nabe kes di nav de heye yan na. Wê navberê di nav agir de dengê dirûşman bilind bû: 'Bimire mêtinkarî'. Wê demê çend kesên xwe winda kiribûn ji bo agir vemirînin ber bi bîdonên avê ve çûn. Heta tu çavên xwe bigirî û vekî, bîdonên avê anîbûn û ber bi agir ve dirijandin. Qehremanên me yên di nav agir de bi gotina, 'Avê bi ser danekin! Avê bi ser danekin! Agir pêxin! Agir pêxin' qîr dikirin. Li ser vê yekê em ji wir veqetiyan. Em ters ters li kesên av dirijandin nihêrin û me xwest em bidin hîskirin ku rijandina avê tiştekî xerab e. Jixwe dema qîrînên qehremanên me bihîstin wan jî dest ji rijandina avê berdan. Lê tişta kiribûn jixwe kiribûn. Agir hêdî hêdî vedimirî. Tir-

sa wê çalakî bi ser nekeve êşa wan dida jibîrkirin. Herhal ji ber vê bi gotina, ‘Xiyanetkarno, avê bi ser danekin, agir pê bixin!’ qîr dikirin. Ev qîrîna wan a dawî bû.”

Kesên av dirijandin bi tundî hişyar dikin. Agirê kêm dibe piştî demekê bi temamî vedimire. Têkildarî çalakiyê gotinên hevalekî din jî wiha ne:

“(…) Min kesekî ku kesên avê dirijînin hişyar dikin nedît. Berteka yekemîn ji nav agir hat. Lê dereng ketibû. Wan xatir ji me dixwest, lê bi awayekî layiqî wan me ew oxir nekirin. Tenê tişta me dikir ew bû ku ji kesekî dema temaşe dikir û digiriya re bêjin, ‘Bisekine, negirî!’ Me digot negirî, ji ber ne bûyereke girî bû, bûyereke ku mirov pê kêfxweş dibe. Mirovên me destana hebûnê ya gelê me diafirandin. Ev bûyereke ku mirov pê kêfxweş dibe. Di dema bûyerê de min hestên dijberî hev jiyan. Beriya her tiştî kesên di nav êgir de dişewitîn mirov bûn, hem jî mirovên ji aliyê hemû qawîşê ve dihatin hezkirin û hevrêyên gelek kesan bûn. Hesta mirov neçar e ji tunebûna wan re bibe temaşeker jî êş dida. Li aliyê din mirov nikarîbû li hember çalakiya hevalan li dar xistibû kêfxweş nebe. Ya rastî ev bû. Min du hestên dijberî hevdu bi hev re dijiya. Li qawîşê fikarên şexsî û civakî, kêfxweşî di nav hev de û heman kêliyê dihat jiyîn. Hejmara qawîşa me tevî ku di demên dawî de kêm jî bibû, qerebalix bû. Bûyer di qawîşê de bibû sedema panîkê. Kesên li deriyan didan û ji ser hişê xwe diçûn, kesên av bi ser agir de dadikirin. Kesên mîna tiştek nebûye ji ser livînên xwe ranedibûn, kesên temaşe dikirin. Me nikarîbû em wê tevlîheviyê bisekinînin. Me nikarîbû valatiya Ferhat, Necmî, Mahmût û Eşref dagirin. Halbûkî kêm ba jî pêwîstî bi dengekî aramkirinê hebû. Kî çi dike, çima dike ne diyar bû.”

Di dawiyê de bang li îdareyê dikin û dibêjin, ‘Mirov xwe dişewitînin!..’ Îdare destpêkê naxwaze yeqîn bike. Wer difikire ku girtiyan li qawîşê cihek şewitandine. Serbazê nobedarê wê şevê dixwaze kesên xwe şewitandine bibîne û emîn be, lê cesaret nake bikeve hundir jî. Ji girtiyan re dibêje, ‘Wan bînin cihekî dema ez ji zereqeyê binihêrim bibînim.’ Heval, Ferhatan ji cihê

xwe şewitandine derdixin û tînin cihekî serbaz wan bibîne. Li ser doşekan dirêj dikin. Hê her çar jî sax in. Bedena wan di asta yekemîn de şewitiye… Li gor vegotina hevalan; Eşref nikare biaxive, lê nebza wî lê dide. Mahmût timî dirûşman qîr dike. Necmî li ser doşeka hatiye dirêjkirin dema serê wî dikeve paşê balîfek ji hevalan xwestiye. Ferhat jî di wan kêliyên xwe yên dawî de navberekê çavên xwe vedike, destê xwe dirêjî Adnan Yilmaz ê li ber serê wî sekiniye dike û jêre dibêje: 'Hevalan bi tenê nehêlin, piştgiriyê bidin hev…'"

************

Cihekî wan ê neşewitiye nemaye! Çaran ji bo mirinê bi lez bikin, paşde vegerê ji holê rakin beriya çalakiyê eşofmanê naylon li xwe kirine. Naylon dema şewitiye hê zêdetir ketiye beden, şewat mezin bûye. Birû, mijang û porê wan bi temamî şewitiye. Beşên bedena wan ên bi niçik şewitîne û heliyane. Ji deverên şewitîne xwîn tê. Serbazê nobedar piştî hevalan di wê rewşê de dibîne ji rastiya bûyerê yeqîn dike. Gardiyanê qawîşê aveke zer a ji bo şewatê tê bikaranîn tîne di zereqeyê de diavêje hundir. Yanî piştî bûyerê bi saetekê îdare "mudaxele"yî bûyerê dike. Di wê navberê de Esat Oktay tê. Di zereqeyê li Çaran dinihêre. Îdare hinekî bi teredût nêz dibe, ji ber ditirse. Wer difikire ku mimkun e, bi îsyanekê re rûbirû were. Lewma nikarin bikevin qawîşê.

Me gotibû piştî belavok hatiye xwendin, îmha kirine. Li ser du pelên kaxezên ji lênûsa xerîte metod a mezin a karedar hatiye nivîsandin. Û serenava "hevrêno" hatiye danîn. Di naveroka wê de jî rewşa tevgera serxwebûnê ya Kurdistan, baweriya bi xeta PKK'ê re, nirxandineke giştî ya cîhan û Tirkiyeyê, girîngiya şoreşa Kurdistanê ya li Rojhilata Navîn, domandina şer û berxwedanê û hwd. mijar hene. Her wiha destnîşan kirine ku ji bo mehkûmkirina zext, îşkence û her cure tevgera derveyî mirovatiyê protestoyê li dar dixin, bi xweşewitandinê re dixwazin mîrasa Mazlûm dewam bikin, bi zanebûna vê wezîfeyê re çalakî

pêk anîne. Hatiye destnîşankirin ku divê yekîtî, yekparebûna rêxistinî bê parastin, li dijî faşîzm û mêtinkariyê şer bê pêşxistin, rûyê wan ê rast ji mirovatiyê re bê nîşandan û paşê jî bi dirûşmên, "Bimire mêtinkarî! Bimire emperyalîzm! Bijî PKK! Bijî têkoşîna me ya serxwebûnê!" bi dawî kirine.

Esat Oktay piştî hewayê tam fêm dike, têdigihêje ku li holê îsyanek nîn e, dikeve qawîşê. Talîmata, "Eger kesek nêzî min bibe bêyî hûn çavên xwe bimiçînin li wan bidin!" dide leşkeran. Ji girtiyan dixwaze ku derbasî beşa razanxaneyê bibin. Piştî fêr dibe bê kê xwe şewitandine, dibêje wan bibin revîrê. Çend heval Çaran bi betaniyeyan dibin beşa îdareyê. Paşê bi fikra dibe ku li pişt xwe peyamek hiştibin livînên wan, eşyayên wan ên taybet yek bi yek kontrol dikin. Serê sibehê saet nêzî 09.00 dozger û Esat Oktay bi komeke qerebalix tên qawîşê. Esat Oktay şikandina camên qawîşê, qîrîna girtiyan wek îsyanê dinirxîne. Dozger jî li hember wê nêrînê derdikeve; dibêje, "Baş e ku şikandine, yan na wê hemû fetisîbana.!.." Paşê jî dest bi lêkolînkirina cih dike. Dema parçeyên goşt ên şewitî yên bi koşebendên hesinî yên qazanên kalorîferê li ser dibîne demeke dicemide. Ji girtiyan dipirse ku dema Ferhatan xwe şewitandine çi kirine. Ew jî dibêjin ku dirûşm qîr kirine. Dozger heyret û heyraniya xwe venaşêre û dibêje: "Ew mirovên çawa ne! Îradeyeke çawa ye! Ez li hember îradeya wan mirovan matmayî dimînin!" Ji bo dozger li hember heybeta çalakiyê ji bilî ku heyraniya xwe îtîraf bike tu rê namînin. Paşê bang li çend kesan dike û îfadeya wan digire. Êvara heman rojê gelek leşker digirin ser qawîşê. Dixwazin kesên dirûşm gotine, qîr kirine, cam şikandine derkevin pêş. Îdare kaxez û pênûsê dide girtiyan û dixwazin îfadeyên xwe binivîsînin. Her hevalek bûyer li gor dîtine û dizanin dinivîsînin.

Sedema esasî ya ev qasî ji rê derketine ev e ku, li hemberî polîtîkaya wan a xiyanetê ya hatiye lezkirin derbeke din a giran hatiye lêxistin. Ev çalakiya mezin a wê bikeve pêşiya xiyanetkirinê, tirs û panîka di wan de hê kûrtir dike û dike heywan. Dema bersiva dixwazin nagirin bi kalas û copan êrîşî girtiyan dikin.

Operasyona hov a li hember qawîşa 33 dest pê dike. Komek diçe piştî wê komeke din tê, bi saetan îşkence tê kirin. Girtî ji ser hişê xwe diçin. Cam hincet in. Jixwe di wan rojan de ev hincet bi awayekî herî aşkera derdikeve holê. Girtiyekî dema cam şikandiye destê xwe biriye, birîn kiriye bi Çaran re dibin nexweşxaneyê. Bi vî awayî yek ji kesên cam şikandiye tê dîtin! Di wê tevlîheviyê de 6 camên qawîşê tên şikandin. Îdare digere bê 5 camên din kê şikandine!.. Armanca esasî pir cuda ye; dixwazin mirovan bitirsînin, nîşan bidin ku çalakiyên wiha ne çare ye, wê wan bandor neke û nede sekinandin. Yekemîn şeva operasyonê bi bîdonan avê li zemîna qawîşê dikin. Heta sibehê girtiyan di nav avê de li ser betonê didin razandin.


Heman rojê êvarî gardiyan tê qawîşê û eşyayên Eşref dixwaze. Her wiha girtiyekî ku wî baş nas dike ji bo teşhîsê dibin nexweşxaneyê. Girtî li morga Nexweşxaneya Leşkerî, Eşref teşhîs dike. Ji Çaran ê destpêkê şehîd dikeve Eşref e. Yên din paşê. Herî dawî Ferhat şehîd dikeve. Hema piştî bûyerê li tevayî girtîgehê boyax, tîner kelûpelên qirtasiyeyê yên di karê nivîsandinê de tên bikaranîn, bi awayekî dixin bin kontrolê. Lêgerîn hatin zêdekirin. Hewl dan li qawîşan tiştekî şewitîner nehêlin.

Îşkence sê rojan bênavber didome. Hin girtiyan ji qawîşê derdixin û lêpirsîn dikin, dixwazin pêkhateya qawîşê fêr bibin. Cop dixin girtiyê bi navê Bedîî Tan. Yek-du hêmanên ku nikarin li hemberî wê hovîtiyê li ber xwe bidin, îtîrafan dikin. Haya îdareyê ji rêxistin û komuna îdareyê çêdibe û qawîşa 33 belav dike. Di encama wê êrîşê de Bedîî Tan jiyana xwe ji dest da. Di nav wê rewşa giran a operasyona sê rojan de dikevin rewşeke wiha ku êdî mirinê dixwazin, li mirinê digerin. Di dema valakirina qawîşê de Fettah Yîgît zendên xwe dibire û xwe di bin ranzeyê de vedişêre. Îdare bi saetan wî nabîne, lê herî dawî tê rizgarkirin. Bi taybet diçin ser hêmanên milîtan ên di komunê de wezîfedar. Beşek ji wan anîn 35 û 36'ê. Hin kes birine cem kesên nexweşiya wan a weremê heye. Li qawîşa 33'yemîn çend kes dimînin. Îdare mîna qawîşa 33 fesh kir!

Belê, ji bo ji navê 33, rizgar bibin jî guhertin û kirin 34'ê. Em dikarin bêjin belavkirina navenda berxwedanekê ya hovîtiyê têr nekir bifetisîne. Îdare ji bo di bin selteneta zilma dest bi hilweşînê kiriye nemîne, bi panîka ketiye nav dixwest a di destê xwe de bi tundî hembêz bike, pergala xwe biparêze. Kawaye Hemdem start dabû. Çaran xelekeke esasî bi ser berxwedanê ve vekiribûn. Em hêdî hêdî radibûn ser piyan. Rêya berxwedana Zindana Amedê ya ber bi Mazlûmbûn û Ferhatbûnê ve diçû carekê hatibû vekirin.

## Kurtejiyana Çaran

**Ferhat Kûrtay**:



Ferhat li gundê Xursê yê girêdayî navçeya Qoser a Mêrdînê ji dayik bûye. 3 bira û 2 xwişk in. Bavê wan melatiya gund dike. Dema bi melatiyê re debara malbata ku her roj hinekî din mezin dibe nayê kirin, bavê Ferhat Mela Hesen li Qoserê bi cih dibe û dest bi bazirganiyê dike. Ferhat dişîne dibistanê. Dibistana seretayî û navîn li Qoserê diqedîne. Derfeta ku perwerdeya bilind jî bibîne çêbû. Li Zanîngha Teknîk a Karadenîz beşa Muhendîsiya Elektrîkê diqedîne. Di sala dawî ya xwendekariya xwe li Trabzonê de car caran dihat Enqereyê. Bi Xeyrî Dûrmûş re tên cem hev û der barê Şoreşa Kurdistanê de nîqaşan dikin. Ferhat ku ji herêmeke weke Mêrdînê ye, li wir mezin bûye, bi xwezayî hêmanên millî û welatparêz nas dike û xwe bi wan gurçûpêç dike. Hezkirina welêt û nirxên gel dawerivandibû. Di salên xwendekariyê de fikrên şoreşgerî nas kir. Ji tevgera ciwanan a şoreşger a li Tirkiyeyê bilind dibû bandor bû. Wê demê di nav çalakiyên girseyî yên şoreşger de cih girt. Ji ber yeqîn dikir ku pêwîst e rêya diçe şoreşa Kurdistanê pêwîst e, bi têkoşîna rizgariya neteweyî şekil bigire, tevger neqlî Kurdistanê bê kirin, ket nav lêgerîn û lêkolînên nû. Dema bi Xeyrî re tên cem hev û diaxivin li wan wextan rast tê. Li Enqereyê hevalên kamil û gihiştî nas dike, bi wan re nîqaş dike û hewl dide îdeolojiya me fêm bike. Dixwest tevgera me ji nêz ve nas bike. Têkilî hatin danîn û pêş ketin.

Lêkolîner û lêpirsîner bû. Di sekn û têkiliyên xwe de bi pîvan û kamil bû. Di têkilîdanîna bi mirovan re û dayîna baweriyê de pir serketî bû. Samîmiyet û duristiya wî di nêrîna destpêkê de xwe dida hîskirin. Mirovan rêz û hurmet nîşan di-

dan. Li cihê Ferhat lê timî cidiyet, pîvan, hezkirin û hurmet diyar bû.

Piştî zanîngeh qedand li Eskîşehîrê leşkerî kir. Paşê di dema ku hê PKK bi fermî nehatibû avakirin, bi formasyona îdeolojîk-teorîk ji bo di neqilkirina têkoşînê ya Kurdistanê de aktîf cih bigire vegeriya herêma Mêrdînê. Armanc û wezîfeya wî ya esasî ya ew bû ku PKK'ê li herêma lê rêxistin bike. Li TEK (Saziya Elektrîkê ya Tirkiye) a Mêrdînê wek muhendîsê bilind ê elektrîkê dest bi kar kir. Pîşeya wî derfet dida ku bi rehetî tevbigere. Bi rehetî dikarîbû biçe hemû gundên Mêrdînê. Di wê pêvajoyê de xwest li gundan hişyarbûna şoreşgerî pêş bixe. Pir baş bi Kurdî diaxivî. Ferhat bi saya serweriya li ser ziman, mijarên herî zehmet jî dida fêmkirin.

Cewher û gotina wî yek bû. Kesayet, zanebûn û tecrûbeya xwe bi temamî ji dil tevlî têkoşînê kir. Sala 1978'an di nav têkiliyên hê cidî û fermî de cih girt. Di rêxistinbûna PKK'ê ya Mêrdînê de cih girt. Bi awayekî layiq wezîfeya xwe anî cih. Feydeyên mezin li tevgerê kir. Rêgezên partiyê, îdeolojî û bernameya partiyê têra xwe fêm kiribû û xebatên serketî kiribûn. Di Komîteya Amadekar a Herêma Mêrdînê ya PKK'ê de wezîfe wergirt. Her ku têkoşîn pêş ket, asta PKK'ê ya li Kurdistanê xurt bû, Ferhat jî bi xebata xwe ya bi disîplîn û têkiliyên xwe yên bawerî dida, bû yek ji kesên ku pêş dikeve.

Dema dawiya sala 1979'an hat girtin, berpirsyarê Eyaleta Hêlîn a ji bajarê Amed, Mêrdîn, Wan, Sêrtê pêk dihat bû. Tevî vê ji bo organa weşana navendî ya partiyê li herêma Mêrdînê bi cih bike û rêxistin bike wezîfe wergirt. Lê bêwext hat girtin. Girtina wî ji bo partî û herêmê bû windahiyeke mezin. Di dema wî de PKK'ê li herêma Mêrdînê pêş ket. Berê li herêmê bi giranî tevgerên bûrjûvaya biçûk ên Kurd û teslîmbûyî yên weke DDKD, KÛK hebûn. Van tevgeran antî-PKK'tiya xwe nîşan didan. Ferhat bi xebata xwe ya hesas, bi helwesta xwe ya mînak a bawerî dida gel ji bo wan bêbandor bike, pir tişt kirin. Ber bi salên 1979'an ew êdî li herêmê rêberek bû.


Beriya bê girtin, bi mehekê Xeyrî li Qoserê wî dibîne. Wê navberê amadekariyên organa weşana navendî ya partiyê dewam dikirin. Ji bo çêkirina hin mohr û qaşeyên ji vî karî re pêwîst, kesekî dişînin Amedê. Kesê mohr û qaşeyan tîne Qoserê di rê de tê girtin. Polîs lêpirsînê berfireh dike. Digirin ser mala Ferhat û Xeyrî têde. Dema polîs malê dorpêç dike, agahî û belgeyên aîdî partiyê yên li cem xwe îmha dikin. Xeyrî nasnameya xwe jî dişewitîne. Beriya polîs bikevin hundir biryar digirin bê wê çawa îfade bidin. (Weke biryara girtine di lêpirsînê de Ferhat dibêje ku li Enqereyê Xeyrî nas kiriye, ji ber wê naskirinê hatine cem hev). Ferhat di lêpirsîna polîsan de helwesteke li gor endamekî partiyê nîşan dide.

Di Tîrmeha 1980'î de Xeyrî û Ferhat li Girtîgeha Leşkerî ya Amedê careke din tên cem hev. Ferhat li qawîşa 9'ê, Xeyrî li qawîşa 15'ê dima. Li girtîgehê ji bo derxistina rojnameyekê hat wezîfedarkirin. Ferhat navê rojnameya wê derxistiba kir "Hawar". Di rojnameyê de nûçeyên têkildarî girtîgehê, derve, şîrove, roportaj û nivîsên teorîk hebûn. Hawar li girtîgehê rastî eleqeyeke mezin hat.

Dilsozî û sedeqeta wî ya bi partî, gel û şoreşê ve muezem bû. Wî teslîmiyet qebûl nekir, hezm nekir. Rewşa xwe timî lêpirsîn kir, nîqaş kir û li rêyên çareseriyê digeriya. Ew pêvajoya lêgerînê bû ya Ferhat kir yek ji çar qehremanên nemir, şeva 17'ê Gulana 1982'yan kir gilokeke roniyê ya pêdikeve. Ji mirovan hez dikir, qîmet dida wan û ji her temenî mirovan rêz û hurmet didanê. Ferhat wek nirxekî ku bi nasnameya xwe ya rêberekî gel, tê bîranîn û jiyandin di hiş û mejiyan de bi cih bû. Gelek bûyerên mezin û tevkarî tevlî van salên kurt ên jiyana partiyê kir. Divê şoreşgerek çawa bijî, çawa bimire bi awayekî herî baş nîşan daye.

Ji jiyaneke kurt, bi cewher û manedar re bûye nav.

**Eşref Anyik:**



Li Wêranşarê zarokekî malbateke xizan û cenan bû. Malbatê tenê dikarîbû wî heta dibistana seretayî bide xwendin. Di zaroktiya xwe di karên herî giran de hat xebitandin. Bi malbata xwe re carinan li Çûkûrovayê karê paletiyê dikir. Wek karker diçû bajarên din jî.

Eşref beriya şoreşgeran nas bike li Rihayê karkerê kompresorê bû. Malbat û derdora wî ya nêz, welatparêz bûn. Malbata wî ji eşîra Millî bû. (Milliyan li hemberî Kemalîstan serî rakirine, rastî qirkirin û sirgûnê hatine.) Beşa xizan a Milliyan ruhê berxwedêr, kîna neteweyî ji nifşan neqlî nifşan kirine. Ev beş li hemberî hevkar, feodalên sîxur jî bi kîna çînî tijî ne.

Eşref, ji têkoşîna PKK'ê ya li herêmê li hemberî feodalên sîxur hatiye pêşxistin bandor dibe, têkoşîna li Hîlwan û Siwêregê wî pir bandor dike û dawiyê di nav refên PKK'ê de cihê xwe digire. Bi ruhekî milîtan û biryardariyeke naheje derketibû pêş. Ne mirovê wezîfeyên ne diyar û pasîf bû. Di rojên pevçûn herî dijwar bûn, bi dilxwazî hat Siwêregê. Li herêma Kirvar a pevçûn lê didomin wezîfe wergirt. Paşê jî çû herêma Hîlwanê û di pevçûnekê de hat girtin.


Xwedî kesayeteke jîr, kamil, giran û bawerî dida mirovan.

Ji atmosfera têkoşîna milîtanî bandor bû û bi awayekî herî aktîf di nav şer û pevçûnan de cih girt. Duristî û samîmiyeta wî, bi awayekî bêsînor a xwe dida têkoşînê bû sedem ku zehmetiyan derbas bike. Piştî ket nav têkoşînê jî ji bo jiyaneke layiqî partiyê bimeşîne çi ji dest dihat, hewl dida bike.

Di temenekî ciwan di nav hovîtiyê de bi ser ket ku bibe mînaka herî xweşik û bi heybet a soza ji gel, şoreş û partiyê re hatiye dayîn.

Ji jiyaneke kurt, bi cewher û manedar re bûye nav.

**Mahmût Zengîn:**



Ji Siwêregê ye. Li cem bapîrê xwe yê li Hîlwanê rûdinişt dima. Hîlwan baş nas dikir. Dibistana seretayî û navîn li Hîlwanê qedand.

Bi pêşketina têkoşîna li Hîlwanê di nav têkoşînê de cihê xwe girt. Bi çalakbûn û cesareta xwe derket pêş. Her çi qas kêm be jî di têkoşîna meşand bi biryardarî û fedakariya xwe hat naskirin û zanîn. Di nav beşa ciwanan de cih girt. Tevî ku ciwan jî bû bi dilnizmî, kamiltî û cesareta xwe bawerî dida derdorê, dihat hezkirin. Endamên partiyê jî jê hez dikirin û teqdîr dikirin.

Pêşketina wî ya bi lez a di nav têkoşînê de nîşan da ku mirovekî wezîfeyên cidî ye. Li qada bejahiyê bi Cûma Tak re di nav xebatên koma çekdarî de cih girt. Li vê qadê jî bi jîrtî û disîplîna xwe ku xwe bi her tiştî tevlî têkoşînê kir, bal dikişand ser xwe.

Sala 1979'an di pevçûnekê de hat girtin. Di lêpirsîna polîs de helwesteke bi rûmet nîşan da. Jiyana wî ya girtîgehê jî bi helwestên mînak tijî ne. Tevî ku di aliyê îdeolojîk-polîtîk de zêde pêş neketibû jî ji ber xwe fedayî dozê kiribû û xwe ji gumanên şexsî şûştibû ew kiribû mirovekî rêzdar. Ji derveyî pêvajoya teslîmiyetê ya giştî tu neyêniyek wî çênebûye, li qawîşa 5. a lê dima wek berpirsyarê qawîşê helwesta xwe ya erênî dewam kiriye, ji ber îşkenceyê lingekî wî seqet maye.

Zarokên muezem ên Kurdistanê, di kesayetên xwe de mizgînî dane ku wê bibin afirînerên esasî yên şoreşê. Mahmût û hevalên wî zanîbûn dîrokê binivîsînin û çêbikin.

Ji jiyaneke kurt, bi cewher û manedar re bûye nav.

**Necmî Oner:**



Necmî, wek zarokekî ji malbateke dewlemend û kevneperest li navçeya Çermûg a Amedê hat dinyayê. Di wê derdorê de mezin bû. Apê wî, wê demê Serokê Navçeyê ya AP'ê bû. Necmî, di salên lîseyê de fikrên şoreşgerî nas kir. Berê bibû DDKD'yî, lê piştî xebatên PKK'ê di nav refan de cih girt. Bi naskirina Ahmet Kûrt û Huseyin Dûrmûş tevlî nav refên tevgerê bû. Piştî di nav refên PKK'ê de cih girt, di nav ciwanan de xebatên xwe meşand. Beriya bê girtin di komîteya amadekar a xwecihî de wek berpirsyarê ciwanan xebat dimeşand.

Di nav refên partiyê de xebatên xwe zêde nemeşand, ji ber bûyerekê li dibistanê hat girtin. Di lêpirsîna polîsan de helwesteke bi rûmet nîşan da. Hê pir ciwan bû, lê xwe baş pêş xistibû. Li girtîgehê şert û merc baş nirxand. Bi awayekî cidî xwe da perwerdeya îdeolojîk. Ji destpêkê ve di nav hemû berxwedan û çalakiyan de cih girt. Ji derveyî teslîmiyeta giştî jiyana Necmî mînak bû. Kamil û di têkiliyên xwe de bawerî dida. Mirovekî ku ji aliyê her kesî dihat naskirin. Bi disîplîn û dilnizm, ji dil, samîmî û fedakar bû. Di temenekî ciwan de gelek taybetiyên erênî di kesayeta xwe de ava kir, pêş xist û bû mirovê demê. Li hundir û derve tevî di nav têkoşîn û xebatên partiyê de pir kêm jî ma, hemû nirxên me bi awayekî herî bi heybet bêmirin kir. Yek ji mînakên mirovên dozê yê ciwan, lê mezin û bijarte bû.

Ji jiyaneke kurt, bi cewher û manedar re bûye nav.

## Roja Beriya Rojiya Mirinê ya Mezin

Hey hevrêyên min ên hêja
Yên çavên xwe
Ji şêr neniqandin
Serê xwe ji gorê teqsîr nakin
Yên xwedî gavên pola
Artêşa birçiyan
Wext hat
Ha disekine ha wê bisekine bager
Di nav şivikan de
  di sorahiyên yekemîn de dişewite sergura sibehê
Em bişidînin diranên xwe yên ketine ser hev
  hinekî din hewldan
Di vê rêya dirêj û zirav
ya em bi van gavên pola têre dimeşin
Agirê me ji dojehê şand
naxwe gihişt
Guhdar bikin wîzîniyên kesk tên
  ji her cihî
  min guhê xwe da dîwêr
Vaye binhêrin bê çawa dişewite
  daristana mezin a gel
Çiya bi per dibin
  destan bi hevdu vekin destan
Heydê xwe amade bikin
  bi qasî dinyayê pêşeroj
  ji wê bihara mukemel re
Ez dizanim
Çav ziwa bûn
Hestiyên goşt ji ser wan rabûn
  wê bipekin ha bipekin
Lê ma jixwe ne ev e
Kerameta roniya çivîka mizgîniyê
Leza di peran de xurt dike

Agahiyê bidin her çar aliyan
Bila tu kes nebêje
me nebihîst
Tu perestgeheke zilmê
ya em gulebaran nekin nîn e
Tu çi tiştekî bereketeke muezem î
Hey gulebarana birçîbûnê
Ya bêserûber
Silav ji te re
hezar silav
Me gotina bi roniya xwînê herikand
wextekî seferê
Wextekî seferê
ji rehên xwe yên wêrek û comerd
Em ê ji dilê sor ê qerenfîl
ê şadiya mezin
herikîna di rehên xwe de
awira di çavan de
çirûska gotinan a li ser lêvan
nedin pelçiqandin
Her çi qasî niha dinya baran e
Ax herî ye
Polîs bi cop in, lê
Ez dibihîzim
dengê lingên şîrîn ên nêz dibin
yên me tên
ji hev belawela
Wê bi şivikan ve hilkişin û xwe bidin ser
Bi hezaran çavên pirlanta
Hey hevrêyên min ê hêja
Yên çavên xwe
Ji şêr neniqandin
Serê xwe ji gorê teqsîr nakin
Yên xwedî gavên pola
Artêşa birçiyan

Hema em bigihêjin vir
Tê maneya me vekiriye
deriyê serketina mezin
ê qaneya wê zîv
Hazir û amade li benda me ye
bi milên xwe yên birçîbûnê jiyîn
Jiyîn
Bi tehma dev a nehatiye tehmkirin
wê ji nû ve bide dîtin
Ji nû ve em ê karibin bidin
Tehma wê ya germ a pir xweş
Roja dibe hingiv
pirtûk, xwarinê
Mirovê vediguhere stêrkê

************

Em nabihîzin û nabînin bê li, qawîşa 33 çi çêdibe ji ber dûr e, li aliyê piştê ye. Tenê dema bi komî dirûşm tên gotin em dibihîzin. Tenê qawîşên li pêşberî wan dibihîzin, lê fêm nakin bê çi ye. Piştî demeke kurt haya wan ji çalakiya Çaran çêdibe. Ji bo tecrîd û tunebûna têkilî û ragihandinê hê baştir nîşan bide ez vê mînakê bidim: Min gotibû ji qawîşa 33 hin kes anîbûn cem me. Tevî em li heman beşê jî bûn, bi rojan haya min ji Çaran çênebû. Alî Çîçek wê demê xwarin belav dikir. Di wê çûn û hatina bi lez de min derfet dît û pirs kir: “Çi bûye, çima ev mirov anîne hucreyan?” Bi dengekî nizm bersiv da. Navê Ferhat derbas bû. Behsa “şewitandin”ê kir. Min tam fêm nekir bê behsa çi kir. Min peyva “şewitandin”ê ne weke maneya wê ya rast mîna kesekî Ferhat îxbar kiriye û bi vî awayî ew şewitandiye şîrove kir. Bi rojan ez pê nehesiyam. Piştî Alî û kesên di hucreya wî de, bi kesên di hucreya Yildirim Merkît de xwarin dan belavkirin. Min ji Vedat Alataş ê li wê hucreyê dima pirs kir. Bersiv nedan. (Wê demê Vedat jî di nav de kesên di hucreya Yildirim de bûn îspiyonker. Yildirim bi xwe re ew jî xistin.)

Heta Xeyrî not neşand haya min jê çênebû bê çi çêbûye û kesên di qawîşa 33 de çima anîne. (Di çûna dadgehê de hevalek bi dizî bûyerê ji Xeyrî re radigihîne.) Di heman nivîsê de divê em çawa tevbigerin, çawa mudaxeleyî pêvajoyê bikin dihat nirxandin, dixwest em nêrîn û fikra xwe jî jêre ragihînin. Di wan rojan de rastiya çawa polîtîkaya tunekirinê ya li girtîgeh û dadgehê hê zêdetir digihişt hevdu û dibû yek hê zêdetir derdiket holê. Dadgehên Îstîklalê bi awayekî çargavê dewam dikirin. Tam hewayeke şer hebû. Li aliyekî xiyanet dana kirin ku gihiştibû asta herî jor, li aliyê din jî dadgehê xala 125. kir dewreyê. Destpêkê koma bi ser a Mêrdînê ve hatibû zêdekirin ji xala 125'ê hat darizandin. Ne mimkun bû mirov nebîne ku dixwestin hewaya di qirkirina Dêrsim û Agirî de hatibû pêşxistin bidin jiyîn. Dîsa di wan rojan de li rûniştinan îtîrafên Yildirim Merkît dihatin xwendin, kolordûyê nûçegihanê Le Monde anîbû rûniştinê. Xeyrî di nota xwe de behsa vî kesê nûçegihan jî dikir. Min bi notekê ev bersiv jêre nivîsand; "Hey ku nûçegihanê Le Monde hatiye te dikarîbû rojiya mirinê ya berê hatiye plankirin aşkera kiriba. Heke careke din derfeteke wer çêbibe pêwîst e mirov bi kar bîne." Wî jî di bersiva şand de wiha nivîsandibû: "Ji bo biaxivim min pir hewl da, lê mafê axaftinê nedan."

Dema min nota Xeyrî xwend, ketim nav hestyariyeke pir mezin. Hevalên te ku bêyî tu berjewendiyên şexsî bidin pêş, ji bo çirandina tarîtiyê canê xwe danîne holê û tu wê dibînî bi xwezayî bûyereke bi heybet e. Ez pir bandor bûm. Pêvajoya bi Mazlûm dest pê kir pêş dikeve û mirov hîs dike ku wê hê zêdetir pêşde biçe, ez ber bi hestên bêterîf ve birim. Ez wer fikirîm, "serê tûnelê hat dîtin." Di vê çarçoveyê de peyama Çaran bi naveroka xwe ya rastî gihişt me: Pêwîst e mirov rabe ser piyan, dest bi meşê bike û ji bo vê divê mirov bimire!.. Her wiha wan rojan îşkence li girtiyan dihat kirin, îtîrafkarî tê ferzkirin, tecrîd tê kûrkirin. Di wê dorpêçkirinê pevrenivîsîn ku pir zehmet bû, tiştên rû didin têgihiştin, şîrovekirin û hwd. her roja diçû hê zehmettir dibû. Bi rastî jî xitimandinek bû.

Di şêwazê çalakiya ku wê gavavêtineke xurt pêk bîne, me ji îradeya xwe yeqîn dikir. Herî kêm ji bo hinek kadroyên rêber û milîtanan pirsgirêkeke wiha tune bû. Tê xwestin ku çalakî were lidarxistin, bawerî bi îradeyê jî heye, lê kesek înîsiyatîfa bibe yekemîn pêş naxe. Ji ber ku doz mezin e, erênî-neyêniya encamê jî mezin e. Tirsa, "Heke em bi ser nekevin?.." heye. Ev tirsa berpirsyartiya baweriya ku li dozeke mezin bar dike. Ha ev tirs çalakiya tê fikirîn dirêj dike. Tirsa encamê bi tu awayî hevalek nedibir gotina, "Temam êdî, ez sibe dest pê dikim" an jî "Em bidin destpêkirin". Piştî Mazlûm em gihiştibûn encama, "Em ê bidin destpêkirin". Beriya Çaran her çi qasî "lê" yan jî tirsek hebû jî ev êdî tune bibû. Êdî wê çalakî ji sedî sed hatiba destpêkirin. Her tişt, hemû guman hatibûn avêtin.

Tirs, ne ji mirinê ye, tirsa serneketinê ye. Ne tam serneketin e jî. Tirsa ji hezarî yek be jî encama wê serneketin derxe holê ye. Dema em tên ser hestên pêş dikevin jî hesta; "Li şûna ez wer bijîm, bimirim" timî pêşdetir e. Tu her saet, her deqe hîs dikî. Di ruh û hişê te de pevçûneke pir mezin rû dide. Di wê pêvajoyê de em bi xwe re gelekî ketin nav hesabpirsînan. Lê tu nikarî bêjî, "Ez ji çalakiyeke (mirineke) bi vî awayî re heme!" Hinekan, mînak wê demê min nikarîbû bêjim. Di serê min de çengela "Ya ez bi ser nekevim?.." dialiqî. Min dizanîbû serneketin bîreke kor e, xiyanet e. Tirsa wê mirov disekinîne. Tu rewşa xwe ya ketina bîra kor kêliyekê tîne ber çavan; tiştekî pir xeternak e, tu naxwazî bifikirî jî. Tu hewl didî paşeroja xwe bi wê rewşa xwe re muqayese bikî. Tu heta mûrehkên xwe dilerizî. Ji ber te ev îhtîmala qirêt kêliyek be jî di hişê xwe de derbas kiriye, xwe bi wê ketinê re muqayese kiriye îsyan dikî, hêrs û aciz dibî.

Bêguman… Tu li cem wan mirovan maye û tu bi wan re jiyaye. Te nasname û kesayeta xwe tenê bi wan re dîtiye. Tu bi saya nirxên wan tîne cem hevdu bûyî mirov. Te bi wan re pir tişt jiyaye, parve kiriye, ji vê wêdetir vî gelê Mazlûm di aliyê madî û manewî de te xwedî kiriye, te hewandiye, dema cihê wê hatiye li pey te hatiye û hwd., tu weke mirovekî ku ew tişt dîtine, tê çawa xiyanetê bikî? Paşê tê çawa rabî û ji xwe re bêjî, "Ez

hê mirov im”? Te bi çi rûyî vegerî nav wan?.. Hema her roj tu xiyanet û berxwedanê tînî beramberî hevdu û didî şerkirin. Tu di her hesabpirsînê de xiyanetê ji nû ve, ji nû ve mehkûm dikî. Tu dizanî xiyanet ejderhayekî 7 serî ye. Li beramberî her serê wî yê tu qut dikî, avhewaya guncaw a xiyanetê wî ji nû ve dide çêkirin. Lewma pêwîst e, tu maneya di kûrbûna her tu wî mehkûm dikî de heye, baş bibînî. Li Amedê, mirovê di ezmûnê re derbas bûye ma çi nemaye lêpirsîn nekiriye? Yanî tu rewşa hovîtiyê, bi şêwazekî din ê jiyanê re muqayese dikî, hewl didî dilsoziya xwe ya bi nirxan re bibînî. Heta tu dikevî nav muqayeseya, “Min baş kir ku ez bûm şoreşger, bûm endamê partiyê?” Bi xeyaleke weke, “Heke ez li derve ne şoreşger bûma, ez ê bibama xwedî gelek derfetan. Min ê jiyaneke luks jiyaba” tu xurt dikî û xwe li ber çavan re derbas dikî.

Belê, hesabpirsîn bi rastiya herî dijwar tê kirin. Her roj ku mirov wê dijî, bi qasî pir zehmet e, xweş e jî. Tu xwe baş nas dikî. Tu careke din digihêjî tehma heybetiya têkoşîn û şoreşê. Di dawiya muqayesekirin û lêpirsînê de, tevî wê hovîtiyê jî ez dihatim cihê ji bo min nuqteya herî dawî ye, di şêwazê jiyana wê kêliyê de disekinîm. Li vê hucreyê eger em tunebûna jî, heta pergala mêtinkarî û zilmê dewam kiriba, heta kesên li hemberî wê têkoşîn kiribana hebûna wê di wan hucreyan de hin kesên din hebûna. (Ew tevlîheviya bi nakok û bi pevçûn a hestan a di wan rojan de min jiya, piştî bi salan min ji hin hevalan re behs kiribû. Bi hevalên ku me her tişt bi wan re diaxivî, dema me hest û fikrên xwe yên wan rojan lêpirsîn dikir, min dît ku hema hema heman pêvajo, bi heman rengî em fikirîne û me hîs kiriye.) Mînak di nav wê tevlîheviya hestan de, ji bo kêliyekê tu xwe weke mirovê herî dewlemend ê cîhanê xeyal dikî, lê têr nake, tetmîn nake, tu red dikî. Tu dîsa bûyîna şoreşgertiyê datînî pêşiya xwe û tu êdî lê wir î. Mîna hemû rê diçin Romayê, di me de jî hemû hesabpirsîn di mayîna wek şoreşgerekî de bi dawî dibû. Di wê rewşa hovîtiyê de, nasnameya min a şoreşgerî ya min dixwest di jiyana xwe ya hucreyê de biparêzim li ser her tiştî re bû, ya min didît rastiya min bû, ez di aliyê ruhî de tetmîn

dikirim. Di vê nuqteyê de tu vê encamê werdigirî: "Madem, îdeal ev e û mayîna wek şoreşger wezîfeya esasî ye, naxwe divê ez zerarê nedim vê îdeala esasî. Li şûna ez jiyana xwe bînim rewşeke ku zerarê bidim îdealên xwe, pêwîst e, ez vê weke şemaqekê li rûyê dijmin bidim." Di van rojên giran de li hemberî xiyaneta ku dijmin ferz dikir, bi fikra îhtîmal heye li hemberî gel û partiyê bi kar bîne, beriya bikevim rojiya mirinê, min biryar da eger hewce bike ez ê dawî li jiyana xwe bînim. Min xwest encama gihiştimê bi Kemal Pîr re parve bikim. Min noteke kurt jêre şand. Min di notê wiha nivîsand: "Di nuqteya bikaranîna li hember partiyê de ez difikirim dawî li jiyana xwe bînim." Kemal piştî not xwend bi gotina, "Na, na!" bang li min kir. Kemal tiştekî cuda nedixwest. Ji rastiya rojiya mirinê yeqîn dikir. Pêvajo jî xurt bibû. Eger mirov li benda parastinan maba wê pir dereng bûya. Xeyrî û Kemal wer difikirîn ku êdî wext hatiye. Wê Karasûyan jî… Wê rojiya mirinê hatiba destpêkirin. Ya nehatibû diyarkirin roja destpêkirinê bû. Kemal ku bi gotina, "Na, na!" bang kir, dihat wateya: "Wextê çalakiya rojiya mirinê hat, divê em hemû enerjiya xwe bidin ser vê".

Piştî çalakiya Çaran hat bihîstin. Êdî çavên kesekî tiştek nedidît. Tu li ku derê yî, çi diaxivî, çi vedixwî, çawa dijî, çi tê serê te, haya te ji wan jî nîn e. Tu dibêjî qey her kes li cîhaneke din e. Di wan rojan de em ê çalakiyê hembêz bikin. Li hemberî êrîşên îdareyê, em di nav plansaziya ku em ê çalakiyê heta dawiyê çawa bi rê ve bibin de ne. Heke tu li hemberî îşkenceyê nikarîbî li ber xwe bidî, dest ji çalakiyê berdî tê li ku derê bisekinî? Wê kî tevlî bibin? Em dizanin wê Kemal û Xeyrî rêbertiyê bikin. Bi hevalên din re têkilî tên pêşxistin; kesên tevlî bibin hene. Wê Karasû jî tevlî bibe, lê kadroyên me yên din di çi rewşê de ne, wê çi bikin ji sedî sed nayê zanîn. Lê bawerî û hêviya wê tevlî bibin heye. Di wan rojan de Xeyrî careke din ji min re nivîsandibû, fikra min pirsî bû. Min jêre nivîsand, min got ku di vê merheleyê de ji me kesên tevlî bibin hebin jî êdî bila baweriya xwe bi me neyîne û şêweyê tevgera xwe li gor wê diyar bike. (Ji ber wî biryara xwe dabû û ji me re ragihandibû. Heke tenê jî

mabûya diviyabû vê wezîfeya xwe bîne cih) Eger mirov bi tena serê xwe jî mabûya diviyabû nirx, partî hatiba parastin û mirov di wê rêyê de meşiyaba. Min diyar kir ku bêdengiya me ya li hemberî vê hovîtî û qirkirina dijmin bi awayekî tê maneya mirov dibe hevparê sûcê wan. Di dawiyê de jî min wer nivîsand: “Dibe ku em tevlî çalakiyê nebin, te dît dijmin me bixîne.” Her wiha min ragihand ku hevalên yeqîn dike wê tevlî çalakiyê bibin diyar bike û biryara xwe ji wan re jî ragihîne wê di cih de be. Min not nivîsand, lê gelek tişt hatin serê wê. Bû sedema şevek bi bela. Min di hundirê pakêteke cigareyê de bi cih kir, bi fikra wê giran bike min 9-10 zeytûn jî kir hundirê paketê û devê wê girt. Di demeke ku gardiyan korîdor kontrol nedikir, min milê xwe di caxên hesinî re derbas kir û paket ber bi hucreya Xeyrî ve avêt. Ya rastî me bi vî awayî nedikir. Ji bo li derdorê belav nebe me dikir nav paçekî û diavêt. Min hinekî ecele kir, di nav paketê de min bi cih kir û avêt. Di ber hucreya Xeyrî re derbas bû, qulipî aliyê piştê yê caxên qatê û li wir ma. Derfeta ku mirov bikişîne û rake nîn e. Dibe ku hema her kêlî gardiyan bibîne. Hemû hucreyên di qatê de yên li beramberî me ketin alarmê. Xeyrî gelekî pêre mijûl bû, lê nikarîbû bigire. Min ji Xeyrî re got: “Eger tu nikaribî bigirî, biavêje erdê, bila heval ji wir bigirin.” Xeyrî vê carê ji bo bixîne ket nav hewldanê, lê bi ser ket. Lê hevalên li qata 1’ê nikarîbûn notê ji cihê lê ketiye bigirin. Êdî panîk mezin bû. Ji ber li qata jêr kontrola gardiyanan zêde bû. Eger not bikeve destê wan wê her tişt serûbin bibe. Ya herî girîng jî behsa rojiya mirinê dike. Eger bikeve destê gardiyanan ne tenê kesek wê hemû qawîş bişewite! Êdî piştî wê notê tevî îşkence û êrîşan ne me derdixin dadgehê ne jî ber rojê. Hestyariya me di asta herî jor de ye û em di nav hestên tevlîhev de ne. Ji jêr kesekî bang kir: “Not girîng e?” Min jî got: “Di hundirê wê de her tişt heye.” Got, “Temam.” Lê ev gotina wî di maneya, “em şewitîn, çûn!” de bû. Kes nikare raze. Not, ketibû pêşiya hucreya 10’ê ya li qata yekemîn a Metîn Aslan lê dima. Li 35’ê bêdengiyeke tijî rageşî û bi guman hebû. Saeta razanê hat. Gardiyan got: “Winda bibe! Bila her kes raze!” Not li holê

sekinîbû, korîdor paqij, parçeyekî biçûk ê çopê jî tune bû. Her wiha ji kunên çavdêriyê jî timî dinihêrîn. Eger gardiyan hinekî bi baldarî binihêre ne mimkun e nebîne.

Ew şev, şeveke ku tevahiya jiyana xwe nikarim ji bîr bikim. Li gor Îslamiyetê; dema mirov li ser milên xwe tabûtê ber bi goristanê ve dibin, mirî jî tabûta xwe hildigire. Dema cenaze tê veşartin û girse belav dibe, mirî ji bo rabe, dixwaze serê xwe bilind bike. Lê dema serê wî li kevir dikeve dibêje: "Heywax! Tu nabêjî yê mirî ez im." Ez jî tam di wê nuqteyê de me. Min wê şevê ev tişt hîs kir. "Yên mirî em in!" Tu dibînî ku bi rastî tu ketiye rewşa miriyan. Bandora noteke îhtîmala wê ya bê girtin zêde ye li ser qawîşan kiriye, tu bi hemû giraniya xwe hîs dikî. Tevî bandorê gelek astên wê yên cuda jî hene; eger bê girtin wê encamên ez dibêjim çêbike. Wê îdare bêje, "Ev not a kê ye?" Eger kesek lê xwedî dernekeve wê hemû qawîş îşkenceyê bibîne.

Bêguman eger not bê girtin ez ê bigirim ser xwe, lê pirsgirêk ne ev e. Mijar pêşeroja çalakiyê û girseyê ye. Ez difikirim ku mimkun e bêm kuştin jî. Min mirin ji çavan avêt, lê ya piştî wê heye. Min di notê de tiştên weke diyarkirina kesên wê tevlî rojiya mirinê bibin nivîsandibû. Wê li ser vê bisekinin. Ez difikirim bê çawa vê derbas bikim. Rewşeke wiha ye ku hê navê çalakvanan jî diyar nebûye. Ji sedî sed divê bêbersiv nemîne. Herî zêde jî li ser vê mijarê diponijîm û li çareseriyekê digeriyam. Tehlûkeya herî mezin jî wê bê fêmkirin ku em amadekariyên rojiya mirinê dikin, wê êdî kesekî nebin dadgehê, çalakiya bê lidarxistin ji raya giştî re neyê ragihandin. Wê îdareyê em rehettir fetisandiba. Tişta ez ber bi "yên mirine em in" birim, ew hewaya wê şevê ya li girtîgehê bû. Tam bêdengiyeke mirinê. Tu kes ji me ranezaye. Kesên haya wan ji notê hene, hemû bala xwe dane wê koşeya paşê ya not lê ye. Li 35'ê herî kêm em sed kes bûn. Ew westandin, bêzarî nexweşî bi hemû giraniya didomin. Lê di hewayê de kendalek, kûrbûnek, giraniyeke wer heye, tu dibêjî qey erd û asîman ketiye hev û tu di navberê de winda

bûye. Mîna li 35’ê kes najî, her kes tune bûye. Tu nuqteya windabûn, hîçbûnê dijî.

Ji bo mirov notê ji wir bigire divê Metîn û yên li cem tiştekî weke betaniyeyê biavêjin û wer bikişînin. Ji ber destê wan nagihêje. Lê eger bi betaniyeyê bikişînin dibe ku gardiyan bibîne. Eger bê dîtin jî wê bên rakin. Lewma nikarin wer bikin. Saet derbas bûn, bêdengî kûr bû. Heval ji bo fêm bikin bê ka gardiyan di hundir de ye yan na bi kaxez û naylonekê deng derdixistin. Dema ev dengê kêm dihat bihîstin gardiyan kursiyê li ser dihejîne, yan jî mîna bêje, “Ez li vir im, bila kesek tevnegere” dikuxe, hebûna xwe dide hîskirin. Kontrolên beramberî hevdu heta sibehê dewam kirin. Em di nav rageşî û bêmoraltiyeke pir mezin de ne. Tevahiya şevê min çavên xwe negirt. Ez gihiştim nuqteyeke wer ku hema hatim ber teqînê. Sînîrê min tevlîhev bû. Ez dixwazim bang li Metînan bikim û bêjim: “Êdî dest jê berdin, lanet be! Ev çi ye hûn xişexişê dikin, eger hûn nikarin bigirin, dest jê berdin, razin! Heke bê girtin jî bila bê girtin!” Ev şerê sînîr roniyên rojê hembêz kir, gardiyan hatin derî vekirin. Bêguman bi awayê asta herî jor em li ser piyan in. Ji saeta razanê ve me kincên xwe dernexistine, em bi awayekî ji operasyonê re amade disekinin. Karavana birin, hevalan hewl dan ji wê valatiyê feyde bigirin û notê werbigirin, lê dîsa jî nikarîbûn. Derî hatibûn vekirin. Li Zindana Amedê derbasî pêkanînên rojane bibûn. Em li ber caxên hesinî di sekna amadeyî de ne. Ha di wê navberê de betaniye avêtine ser notê, kişandine. Bi vî awayî me not û çalakî rizgar kir!.. Metîn û yên li cem, piştî notê digirin, bi fikra dibe ku gardiyan not dîtibe bêyî bixwînin tavilê îmha dikin. Di wan rojên ku şert û mercên pevrenivîsandinê ev qasî dijwar dibûn, sedema bêyî bixwînin şewitandin ev bû: “Eger tiştên hatine nivîsandin em zanibin, îdareyê jî dîtibe ku me wergirtiye, di îşkenceyê de mimkun e, em tehemûl nekin û tiştên me xwendine em bêjin.” Piştî xwarin hat belavkirin ji qata 3. Karasû bang kir got, “Temam! Not girtine!” Me nefeseke kûr kişand.

Ev yek ji kêliya jiyana min a herî bi şens û bi aram bû. Ya herî girîng jî ev bû ku rojiya mirinê ji ber şaşiyeke besît neket rîskê. Ya rastî weke kes îşkenceyên dijwar ên wê li min kiribana jî mewzûbehs bûn, lê li cem berjewendeyên giştî tu girîngiya wê nedima. Amadekariya ji bo çalakiyê dewam kirin. Herî dawî min ji Xeyrî noteke din wergirt. Têkildarî çalakiyê şêweyê tevgerê zelal bibû. Xeyrî bi kurtasî wiha nivîsandibû; "Tiştekî ku em zêde li dadgehan bikin nema. Me bersiv da êrîşên xayînan jî. Piştî ku koma Riha ya koma herî mezin û girîng e bersivê bide îtîrafkaran em ê dest bi çalakiyê bikin."

Ya tê behskirin ev e, tevî wê nehêlin em parastina nivîskî bikin; derfeta parastina siyasî jî her diçe ji holê hatiye rakirin. Di vê rewşê de me nikarîbû em zêde tiştekî bikin. Bersiva îtîrafkarên heyî jî hatiye dayîn, ev merheleya dadgehê jî hatiye temamkirin. Start hatibû dayîn. Di yek ji dirûşmên koma Riha de ji bo aşkerakirina biryarê em ketin nav tevgerê. Em çûn rûniştinê. Fevzî Yetkîn rabû yek-du gotin kir, heyetê ew neda axaftin. Fevzî wê behsa çalakiya Çaran kiriba. Dema ew hat bêdengkirin Xeyrî vê carê ji bo biryara rojiya mirinê aşkera bike mafê axaftinê xwest. Heyet ket ferqê ku hewayeke awarte heye, axaftina Xeyrî asteng kir. Heyetê got ku wext derbas bûye, wê mafê axaftinê nede kesekî û rûniştin bi dawî kir. Êdî diyar bû wê hin tişt pêk bên. Di girseya me û dijmin de bendewariyek hebû. Êdî alî li benda hev bûn. Çavên girseya me li ser rêberên me bûn. Lê gelekan nizanîbû wê çi rû bide, çawa rû bide. Wê ev zincîr hatiba şikandin, a dihat zanîn û hîskirin tenê ev bû.

*"Eger ez ê bi mirin û çalakiya xwe; ji partî û gelê xwe re bibim feyde, ez ê ji vê kêfxweş bibim. Tevî ku min hemû, tecrûbe û zanebûna xwe di asta herî bilind de, wekî dixwazim min kiriye xizmeta gelê xwe û bi hemû baweriya xwe min xwe fedayî vê dozê kiriye, ez nikarim bêjim min wezîfeya xwe ya li hember gelê xwe bi awayekî tam aniye cih. Lewma li ser kêla gora min, 'Li hember vî gelî deyndar mir' bila bê nivîsandin."*

**M. Xeyrî Dûrmûş**

*"Belê, ez tevlî gotinên Xeyrî dibim. Lê tiştên ez bi ser vekim hene. Diviyabû ev ne wiha ba. Diviyabû yê destpêkê miribana em bûna. Em dereng man. Ez jî dest bi rojiya mirinê dikim."*

**Kemal Pîr**

## Mirovê li Salona Dadgehê Bilind Bû: Xeyrî

Kemal û Karasû dema diçin rûniştina koma Amedê derfet dibînin bên cem hev û biaxivin. Fikra her duyan jî ev e ku çalakiyê di koma Amedê de bidin destpêkirin. Kemal ji Karasû re dibêje, "Vê fikra me ji Xeyrî re ragihîne." Karasû radigihîne, lê Xeyrî nêrîna xwe ya pêwîst e di koma Riha de be dubare dike. Karasû fikra Xeyrî ji Kemal re radigihîne… Kemal tevî ku alîgir e di koma Amedê de bê ragihandin jî dibêje, "Madem Xeyrî di koma Riha de bi israr e, bila wiha be." Li ser vê rewşa dawî Karasû li ser nêrîna xwe ya di koma Amedê de bê aşkerakirin israr nake. Wer difikire ku Kemal û Xeyrî çalakiyê aşkera bikin wê hê baştir be.

Pêşketinên rû didan, êdî tehemûla mirovan nehiştibû. Di koma Amedê de jî bi hin kesan îtîraf dabûn kirin, di wê demê de îtîrafên wan di rûniştinê de dihatin xwendin. Karasû êdî li sînorên dawî yên tehemûlê bûn. Dixwestin tavilê çalakî bê destpêkirin. Piştî van axaftinan bi çend rojan, dema koma Amedê diçe rûniştinê, îdare li korîdorê ji girtiyan S. digirin û dibin. Karasû wer dihizire ku li ser S. îtîraf tê ferzkirin yan jî wê bike û ji Xeyrî dibêje; "S. birin, eger îtîrafan bike, wê sibe di rûniştinê de bê xwendin. Ji ber ez pêre ji heman dozê hatim darizandin, ez ê hem rabim bersiv bidim hem jî rojiya mirinê aşkera bikim." Xeyrî dîsa di fikra xwe ya berê de israr dike. Di vegerê de Karasû notê ji Şener re diavêje. Dibêje: "Eger S. îtîrafan bike, ez ê rabim bêjim ku min dest bi çalakiyê kiriye. Wê Kemal jî ji sedî sed tevlî bibe. Ji ber berê soz dabû ez bawer im wê Akîf jî tevlî bibe. Xeyrî di koma Riha de bi israr e. Lê êdî tehemûla min nema."

S. ji ber nexweş e birine. Roja dîtir dema tînin rûniştinê, Karasû dest ji pêkanîna fikra xwe berdide. Hewldana daxuyaniyeke din hat kirin. Di koma Amedê de dema îtîrafên yekemîn tên xwendin Kemal êdî tehemûl nake, Ji ber dizane Karasû jî alîgir e ku hema were destpêkirin, destê xwe li Karasû dide û dibêje: "Rabe bide destpêkirin!"

Bi taybet di merheleyeke ku îtîraf dihatin xwendin, dadgehan heta ji wan dihat maf nedidan kadroyên rêber. Kemal ji ber endamê Komîteya Navendî ye tînin rûniştinan, lê di wê komê de ji tu bûyeran nedihat darizandin. Di wergirtina mafê axaftinê de Karasû hê bi avantaj bû. Ji ber dozên dihat darizandin hê zêdetir dikarîbû mafê axaftinê werbigire. Karasû ji heyetê mafê axaftinê dixwaze, tevî gelek caran hewl dide jî mafê axaftinê nadin.

Xeyrî hewl dida, çalakî bi awayekî herî bi tenduristî bê lidarxistin. Êdî çalakî wê di koma Riha de bê aşkerakirin û wer jî çêbû. Dîrok 14'ê Tîrmeha 1982'yan bû. Em birin rûniştinê. Haya me ji pêşketin û tiştên pêk werin hebû, di dilê me de bager radibûn. Xeyrî destê xwe rakir û mafê axaftinê xwest. Diyar kir ku tevî di rûniştina berî niha de mafê axaftinê xwestiye, jêre hatiye gotin, "Tê paşê biaxivî", lewma dixwaze biaxive. Dema Emrullah Kaya fêm kir nikare xwe jê xelas bike got: "Wê demê tê di dawiya rûniştinê de biaxivî." Çapemenî jî hatibû. Wê rojê îtîrafên F. Yilmaz û parastina hin hevalan wê hatiba wergirtin.

Bi qasî tê bîra min Serokê Dadgehê Bînbaşî Kemal Kavî (dibe ku Bînbaşı Hançer jî be) dadgerê rûniştinê Emrûllah Kaya, dadgerên endam; Nîhat Beyhan Ozyûrt, Niyazî Erdogan, Yuzbaşî Celalettîn Çelîk bû. Dozgerê leşkerî jî Bulent Cahît Aydogan bû. Ez ne şaş bim wê rojê di rûniştinê de ji parêzeran Erdînç Ûzûnoglû û Suleyman Demîrkapi hebûn. Parastin hatin girtin. Emrullah Kaya got: "Biryara dawî" û dixwest bêyî mafê axaftinê bide kesekî tavilê rûniştinê bi dawî bike. Xeyrî tavilê bi gotina, "We gotibû ez ê dawiya rûniştinê mafê axaftinê bidim we" mudaxele kir. Emrullah teredûtek kurt derbas kir. Xeyrî got: "Li hemberî tiştên F. Yilmaz gotine, mafê min ê bersivê çêbû. Ez dixwazim bal bikişînim ser çelexwariyên têkildarî partiyê." Emrullah rûyê xwe tirş kir û bi îfadeyeke bêçare got: "Temam were, tu çi dibêjî bêje, lê bila gotinên te kurt bin, jixwe rûniştin jî qediya, em gelekî dereng man." Ev çend rûniştine ku Xeyrî bi israr dixwest biaxive, bendewariya di girseyê de zêde kiribû. Hema her kesî hîs kir wê tiştên awarte rû bidin. Dema

Xeyrî ber bi kursiyê bersûc ve pêşde diçû hemû çavên tijî bendewarî û hêvî li ser bûn. Xeyrî bi wê sekna xwe ya aram mîna hemû heval bi xwe re dimeşand, ber bi pêşerojê ve neqil dikir. Di carekê de li salona rûniştinê hewayeke bi hêvî, coş û heyecan dest pê kir. Ew hezkirina wî ya mezin a ji hevalên xwe re, di çav û rûyê wî de dihat xuyakirin. di nav girtiyên di sekna amadeyî de rûniştî û li nivîsa "Edalet bingeha mulk e" dinihêrîn re derbas bû, meşa wî gavên dawî yên ber bi kêliya dîrokî ya wê demeke din dest pê bike dianî ziman. Mîna wiha digot: "Em ê êdî vê zilmê, her tişta we dixe cendereyê bi vê meşê parçe bikin, em ê îro jî, sibe jî qezenc bikin." Hat kursî, derbasî pêşiya mîkrofonê bû. Bêdengiyeke kurt çêbû. Deng ji kesekî dernediket.

Dest bi axaftinê kir; got, zext û îşkence hemû sînor derbas kiriye, bi bêperwatiyeke mezin êrîşî mafê jiyanê tê kirin, mirov tên qetilkirin, ji girtîgehê cenaze derdikevin, bi sedan mirov seqet mane, ji bo mirovên dixwazin rûmet û nirxên xwe biparêzin ji bilî mirinê tu rê nehatiye hiştin. Her wiha diyar kir ku bi darê zorê mirovan dikin îtîrafkar, îdare ji bo bigihêje hedefên xwe serî li komployên herî rezîl dide, heta dema girtî parêznameyê dinivîsîne wî nîşanî girtiyan didin, dibêjin: "Binihêrin, îtîrafan dinivîsîne." Da xuyakirin ku di merheleya em gihiştinê de nayê zanîn wê kî kengî bimire, bal kişand ser hovîtiya tê meşandin û piştî behsa xweşewitandina Çaran kir, zextên girtî li salonê pêre rûbirû tên anî ziman. Da xuyakirin ku mafê parastinê li girtîgehê û dadgehê tê xespkirin. Ji bo parastina girtî bê astengkirin ev her du sazî çi ji destê wan tê bi awayekî bêperwa dikin, berî niha gelek caran ev mijar hatin ziman, dadgehan guhên xwe jêre girtin, tu tiştek nehat guhertin. Her gotina Xeyrî li salonê dida. Qîrînên yekemîn ên berxwedana 14'ê Tîrmehê ya ava bû li salonê serwer bû. Heyeta dadgehê hin tişt hîs kiribûn, lê ne li benda daxuyaniyeke wiha bû. Matmayî, bêçare û ketibû rewşeke nizanîbû çi bike. Sûcdariya dîrokî ya jiyane dema bi awayekî herî aşkera "sûcdar"ek li rûyê wan dide, bêdeng dimînin û neçar dimînin guhdar bikin. Bêmudaxele guhdar kirin. Xeyrî got: "Hezar carî zêdetir cezayê hûn ê

li gor qanûnên xwe bidin me, bi me dan kişandin û didin kişandin. Li vir berdêla her gotina ji devê me derdikeve hovîtî ye. Mirov ji bo parastina rûmet û nirxên xwe canê xwe datînin holê. Van sûcên mezin ên tên kirin tevî hemû astengiyên we em ê nîşanî raya giştî ya cîhanê bikin. Ji bo sûcdariya dîrokî ya KT'ê, îşkence û hovîtiya tê pêkanîn, xiyaneta tê ferzkirin mehkûm bikin, planên wan vala derxin Mazlûm, Çaran gavên yekemîn avêtin. Wê li vir nemîne, bidome. Em dest ji parastina nasnameya xwe ya siyasî berdin, li cihekî ku ji bo parastina mirovatiya xwe hemû amûr ji holê hatine rakirin, li cihekî parastina siyasî ya em amade ne ji bo wê bi canê xwe bidin kirine rewşeke ku îmkana wê nîn e mirov bike, li cihekî ji bo dengê me bê birîn tê xwestin kilîtê li devê me bixin û her cure pêkanînên kêfî bûne asayî, ji bo me maneya jiyanekê nema. Ji bo protestokirina van polîtîka û pêkanînên hov ez radigihînim ku ji vê kêliyê û şûn ve ez dest bi rojiya mirinê dikim. Eger ez ê bi mirin û çalakiya xwe; ji partî û gelê xwe re bibim feyde, ez ê ji vê kêfxweş bibim. Tevî ku min hemû, tecrûbe û zanebûna xwe di asta herî bilind de, wekî dixwazim min kiriye xizmeta gelê xwe û bi hemû baweriya xwe min xwe fedayî vê dozê kiriye, ez nikarim bêjim min wezîfeya xwe ya li hember gelê xwe bi awayekî tam aniye cih. Lewma li ser kêla gora min, 'Li hember vî gelî deyndar mir' bila bê nivîsandin. Wê ev rûniştina min a dawî be. Herî dawî ez dixwazim vê jî bêjim: Kesên ji bo serxwebûna Kurdistanê derketine rê, eger di têkoşîna rizgariya neteweyî de ji dil bin, divê têkoşîna çekdarî esas bigirin. Kurdistan tenê bi vê rêyê dikare rizgar bibe. Şert û mercên cîhan, herêm û welêt wê mecbûr dikin."

Belê kêliyeke dîrokî ye. Xeyrî yê bû abîde, nîşan dide bê têkoşîn wê çawa bigihêje serketinê jî, wesiyetê dike. Dema mirov dîroka Kurdistanê li ber çavan digire, qîr dikir bê dorpêça piralî ya sedsalan aniye û sazîbûyîna mêtinkar a qatqatî bûye wê bi kîjan şêwazê têkoşînê bê şikandin. Belge ji dîrokê re dihişt. Li ser her tiştî serwer bû. Mirovên li salonê kiribû nav tesîreke muezem.

Di mirovan de ji lêpirsînê wêdetir jî bandorbûnek û hejandinek heye. Gotinên "Eger ez bimirim li ser kêla gora min deyndarê gelê xwe ye binivîsînin", îfadeya jiyanekê ye. Gotinên wî; dilsozî û berpirsyartiya wî ya li hemberî gel û partiyê dianî ziman. Carinan jiyan di yek-du hevokan de tê bicihkirin. Jiyanek carinan rêzikeke helbestê ye. Lê destaneke wiha, jiyaneke bûye dîrok; ew hevoka ku jiyaneke pir dewlemend a di nav gel û partiyê de cih digire û rêxistinker e, mirovatiya cîhanê, danehevên proletarya di xwe de kûr dike û derbasî pratîkê dibe tê îfadekirin, bi xwezayî mirov bandor dike, dihejîne. Ev meşa li ser dijmin hesret û xwestekên her kesî dianî zimên. Ev coşeke mezin û çavkaniya kêfxweşiyê bû. Em di nav kêliyên ku dilan zorî dida ser qefesa singê, çav ji kêfxweşî û heyecanê ximam dibûn, serbilindî û xirûrek mezin dihat hîskirin. Her wiha mirov ketibûn valatiyeke hestan jî. Cihnegirtina di nav çalakiyeke wer mezin û mafdar de, di vê mijarê de nezelalî, hembêznekirina wan kesên li paşê, ji sûcdariyê wêdetir dipelçiqand. Her kesî bi awayekî ev hestên nakok dijiya. Parêzvanên pergala faşîst a mêtinkar jî didît ku "darizandin"a Xeyrî, Xeyriyan û şerê azadî û serxwebûnê, hewldaneke vala ye, li ser kursiyên xwe biçûk û bêçare dibûn. Belê, wê kêliyê her tişt bêqîmet bibû. Mirin, heyet, dozger her tiştî maneya xwe winda kiribû. Di dengê nerm, lê bi biryar ê Xeyrî de gelek rabibû ser piyan, li hember dijminekî sekinîbû û diaxivî: "Hûn çi bikin, bikin hûn ê nikaribin min tune bikin, ez ê timî li ser piyan bim, ji sedî sed ez ê qezenc bikim." Yê wê kêliyê diaxivî ne Xeyrî bû, em hemû bûn. Li kursî Xeyrî li ber, lê gelê me hebû. Mîna dîmenekî wiha heye; li wê salonê cenaze radibin. Ya wê cenazeyê gelê Kurdistanê rabe, yan jî yê mêtinkaran. Giranî, îhtîşam û heybeta wê bandora xwe li salonê kiribû. Peyvên ji kesayeta bi gelemperî aram û nerm a Xeyrî dihat zimên, ji ber şerê li hember dijmin îfade dikir, me didît bê çawa vediguherî lehiyê. Û ew lehî ne Xeyrî em bûn. Wê kêliyê li salona dadgehê ne tenê Xeyrî hebû. Wek partî û gel em di ruh û bîra Xeyrî de bi gewde bibûn. Di dîrokê de kêliyên mezin hene. Di wan kêliyan de mafdariya dîrokî tê di mirovekî de

berçav dibe. Dema hûn lê dinihêrin gel, dema li gel dinihêrin wî dibînin. Wê kêliyê Xeyrî gel bû; gelê Kurdistanê yê mazlûm, lê ji qezenckirinê re sondxwarî. Her du bibûn yek. Salon ji me re teng dihat. Her tişta aîdî me rabibû ser piyan, ketibû sekna silavdayînê. Her tişta li pêşberî me hûrhûrî bibû. Heyeta dadgehê ya weke di hêlîna teyr de ye ji "jor" ve li girtiyan dinihêrî, serbaz û leşkerên derdora me dorpêç kiribûn, dîwarên derdora me girtibûn, esreqa mîna wê bi serê me de bê xwarê sekiniye, cihê em pêlî dikin, wê kêliyê her tişta berevajî rastiya me, dixwest tarî bike, biçûk bibû û jê çûbû. Jiyana li derveyî me sekinîbû, mîna kesekî nefes nedistand. Kêlî, dîrok a me bû.

Piştî daxuyaniya Xeyrî heyeta dadgehê helwesteke mirov hîn nebûye nîşan da. Ew kesên ku heta wê rojê ji her tiştên têkildarî hemû daxuyaniyên girtiyan digotin: "Ev pirsgirêkên îdarî ne, me eleqedar nake, pêwîst e hûn bi kolordû û îdareyê re hal bikin", di carekê de eleqedar bûn!.. Heyetê piştî daxuyaniya Xeyrî neçar ma helwesta xwe biguhere. Emrullah Kaya, yên din êdî dîtibûn her tişt qediyaye, êdî di nuqteyeke ku vegera wî nîn e de ne û cidiyeta meseleyê fêm kiribûn. Jixwe di tevahiya rûniştinan de rêberên me nas kiribûn, dîtibûn mirovên cidî û hevgirtî ne. (Bi giştî hê fermî, hê bi pîvan û bi hurmet nêzî hevalên parastina siyasî dikirin, dibûn.) Dizanîbûn heke Xeyrî dest bi rojiya mirinê dike, heta sedemên çalakiyê ji holê neyên rakirin, wê berdewam bike û bimire. Dozger bêyî gotinekê bike xwe dabû ser qoltixê xwe û bi rûyekî reş bibû, Xeyrî temaşe dikir. Dadger Niyazî Erdogan navberekê di guhê Emrullah de hin tişt got. Paşê bi kesên din re ket nav pistepistê û Emrullah got: "Xeyrî pêwîst nake tu dest bi rojiya mirinê bikî, em ê ji Fermandariya Kolordûyê re binivîsînin. Em ê bixwazin li girtîgehê şert û mercên amadekirina parêznameyê bên avakirin." Xeyrî got: "Eger hûn derfeteke wiha çêbikin, şert û mercên parêznameyê çêbikin, ez ê kêfxweş bibim. Lê êdî ez yeqîn nakim rewş biguhere. Ez ji biryara xwe venagerim." Emrullah bi rûyekî êdî tiştekî bê kirin nemaye got: "Temam Xeyrî, me te guhdar kir, tu dikarî vegerî cihê xwe." Xeyrî jî ew kêliya dîrokî ya bi mehan li

bendê bû bi dest xistibû, tişta dixwest bêje gotibû. Ji kursî veqetiya. Bi ken silav da me û derbasî cihê xwe bû. Li cihê xwe rûniştibû, lê li salonê nediyarî û şaşwazî hê dewam dikir. Ne tenê di heyeta dadgehê, di serbaz û leşkeran de jî ev hebû. Didîtin ji merheleyekê û şûn ve bend nikare avê asteng bike û bi ser ve diçe. Axa di bin linge wan de dişemite.

Çalakî îfadeya helwesta me ya rêxistinî ye. Xwezayî ye wê bi Xeyrî bi sînor nemaba. Hema piştî Xeyrî Kemal got ku dixwaze biaxive. Heyetê dîtibû bi Xeyrî re pêvajoyeke êdî nayê girtin hatiye destpêkirin, bi panîka astengkirina gavên nû yên wê rewşê hê girantir bike, nexwest mafê axaftinê bide Kemal. Ji ber her tişta tê gotin û nivîsandin dihat maneya noteke nû ji dîrokê re bê hiştin. Bandor û encamên van tiştên di vî parçeyê xweser de, wê bi wir ve bi sînor nemaba, wê qonaxeke dîrokê ava kiriba. Kemal bi israr xwesteka xwe ya axaftinê dubare kir. Emrullah got; "Kemal jixwe Xeyrî got; tê çi biaxivî, ne hewce ye." Kemal dema dît mafê axaftinê nayê dayîn got: "Belê, ez tevlî gotinên Xeyrî dibim. Lê tiştên ez bi ser vekim hene. Diviyabû ev ne wiha ba. Diviyabû yê destpêkê miribana em bûna. Em dereng man. Ez jî dest bi rojiya mirinê dikim" û li cihê xwe rûnişt. Pêwîst e mirov mane û hestyariya di gotinên Kemal de baş fêm bike. Dilsoziya wî ya bi şoreşê û gel re, coşa wî ya jiyana şoreşgerî bi heybet bû. Kemal dizanîbû pêwîst e rêberek timî di pêş de bimeşe. Hela eger mirin pêwîst bike, di wê de jî diviyabû li pêş be. Gotinên Kemal xweziya di mirinê de jî bûyîna yekemîn, jidestbernedana dorê dianî zimên. Piştî Kemal li salonê tansiyon bilind bû. Heval bi fikra, "Gelo hin kesên din ên dest bi çalakiyê bikin hene?" li hevdu dinihêrîn. Heyeta dadgehê ji bo êgir mezin nebe dema hewl dida rûniştinê bi dawî bike, Alî Çîçek destê xwe rakir.

Ne bi temamî be jî gotinên Kemal derbasî girtekan bûn. Bi bandora giraniya di hewayê de, axaftin ji her demê zêdetir derbasî girtekan bûn.

Alî jî dema mafê axaftinê xwest, Emrullah Kaya got; "Na, êdî em rûniştinê digirin." Alî bi israr bû. Nîqaşê hinekî dewam

kir. Alî dema got; “Ez ê di axaftina xwe de hin bûyeran jî aşkera bikim” Emrullah sekinî. Dema behsa bûyeran hat kirin, ew dawetî kursî kir! Alî hevalekî me yê ciwan bû. Bi dengê xwe yê ji coş û heyecanê dilerizî got: “PKK’ê ne teslîmiyet berxwedan fêrî me kir. Nîşanî me da ku rizgarî bi berxwedanê pêk tê. Lê em nebûn layiqî PKK’ê. Bi teslîmbûnê, me sûc kir. Me kesayeta berxwedêr û şerker têra xwe nîşan neda. Em ê ji niha û şûn ve sûc nekin. Ez dest bi çalakiya rojiya mirinê dikim. Ji ber ez ê di vê çalakiyê de bimirim, li ser navê partî û gelê xwe hin çalakiyên min pêk anîne dixwazim aşkera bikim” û çalakiyên tevlî bûye vegot. Destnîşan kir ku naxwaze ji çalakiyên wî pêk anîne kesek bê darizandin.

Bedrettîn Kavak ji cihê lê got: “Ez jî tevlî vegotinên hevalên xwe dibim û dest bi rojiya mirinê dikim.” Paşê jî Fûat Çavgûn, Alî Kiliç jî diyar kirin ku tevlî dibin. Bi vî awayî 14’ê Tîrmeha 1982’yan li Zindana Amedê rojiya mirinê bi 6 kesan dest pê kir.

Rojeke bi hemû gurûgeşî û zindîbûna xwe di hişê me de ye. Axaftina Xeyrî li ser min tesîreke cipcuda ya min qet nejiyabû hişt. Ez bûm şahidê dîroka me ya ruh pêve dihat. Milên Xeyrî hinekî ber bi pêş ve xwar bûn. Mîna barekî giran hildigirt disekinî. Kêliyekê ez wer fikirîm: “Xeyrî li ser kursî barê dîrokekê, pêşeroja gel hilgirtiye!..” Min hîs dikir û didît ku di sekna xwe de xwe jî, dijmin jî daniye holê û her tiştî dadgeh dike. Xeyrî hemû barê gelekî yê tê xwestin bixin gorê hilgirtiye, ew bi sukûneteke mezin bêyî guh bide tewandina milên xwe hildigire. Tu li sekna wî dinihêrî û hîs dikî ku wiha dibêje: “Belê begno, heta vir! Ji niha û şûn ve wê ev dîroka ez li ser milên xwe digirim biaxive, em ê biaxivin.” Ketiye bin cîhanên li ser me hatine hilweşandin, dixwaze hilgire, rake û biavêje.

Navberekê ji bo bibînim bê parêzer û rojnamevanên bûne şahidê çalakiyeke mezin çawa bandor bûne li wan nihêrîm. Mîna ketibûn nav efsûnbûnekê. Dizanin ku kêliyeke dîrokî ye. Mîna ketine sekna amadeyî, li mirovên ku bi hurmet û heyraniyekê dîrok dinivîsandin dinihêrîn.

## Kemal Pîr; "Vê Carê ez ê ji Sedî Sed Bimirim"

Piştî daxuyaniya çalakiyê qediya û heyet derket, em bi serbaz û gardiyanan re rûbirû man. Ew hewaya berî niha kişandibûn, gavavêtina bûn şahidê wê mîna ew cemidandibûn, bêbertek kiribûn. Bêdeng bûn, tiştek nedigotin. Bêdengiyê hê jî serweriya xwe dewam dikir. Ew dojeh, bang, heqaret û dijûnên piştî rûniştinan li hember me bi kar dianîn tune bûn. Efsûna berxwedanê ya vediciniqand ew dabûn sekinandin. Hêza ku ew vediciniqand hatibû, hêrs û qîrîniya wan paqij kiribû û biribû. Di nav xwe de bi pistepist diaxivîn. Hemû qedexe, rêzik rabibûn, çerxa dixebitî ji bo demekê sekinîbû. Te digot qey rêzikên xwe yên bi salan pêk tînin ji bîr kirine.

Belê, tam rewşeke ku heyirî mane û nizanin çi bikin. Piştî kelepçekirinê, em li wesayîtan siwar kirin. Dîsa deng tune ye. Deng ji gardiyanên li ber serê me ne nayê. Li holê mîna bêdengiya berî bagerê heye. Di dawiyê de em hatin girtîgehê. Em anîn maltaya esasî, dest bi vekirina kelepçeyan kirin. Serbazekî qîr kir û got: "Di nav we de kesekî din ê dest bi rojiya mirinê bike hebe bila bêje." Deng ji kesî derneket. Paşê her 6 heval bêyî kelepçeyên wan vekin, birin cihekî. Wê kêliyê çawîş ez jî ber bi wan ve dehf dam û got: "Wî jî bigirin."

Hemû leşker nedihatin dadgehê. Çawîş jî nizanîbû ez tevlî çalakiyê bûme yan na. Ji ber ez bi Xeyrî û Kemal re li heman qatê bûm, em bi hev re diçûn dadgehê û me parastin dikir, herhal ne fikiriye ku ez ê ji wan cuda tevbigerim, tevlî çalakiyê nebim. Min jêre got ku ez tevlî çalakiyê nebûme. Şaş ma got: "Tu çawa tevlî nebûyî?" Min dubare got ku tevlî nebûme.

Ya ez nebirim rojiya mirinê ne ku min nikarîbû xwe li ber bigirim. Qet ne ew bû ku min nedixwest biçim mirinê yan jî tirsa jê bû. Tirsa encama neyêniyeke ku min ê di çalakiyê de jiyaba bû. Ya cesareta min şikand ew tirs bû. Dema gardiyanekî li dadgehê bû, hat got: "Ev tevlî çalakiyê nebûye", çawîş îqna bû. Ez ji Xeyrî qut kirim û bi hevalên din re birim qawîşê. Di wê navberê de bi kalasên destê xwe di nav çalakvanan de dige-

riyan, gotin ji wan re digotin û hewaya ku wê îşkenceyên dijwar li wan bikin didan. Hewl didan çavên kesên din bitirsînin, nehêlin tevlî çalakiyê bibin. Piştî em birin hucreyên me Xeyrî jî birin qata 4'ê.

Şemaqek jî li kesî nedane. Tenê tehdîd kirine. Esat Oktay ji Kemal re dibêje; "Patron vê carê tê ji sedî sed bimirî ha! Weke dema berê di nîvî de hiştin nîn e, eger tu vê carê dawiya wê neyînî ez ê te perîşan bikim" û hwd. tiştan dibêje. Li hemberî hêza çalakiyê heyirî maye, kîna xwe nîşan dide. Kemal jî wiha bersiv dide; "Min ji paşerojê dest girt, ez ê vê carê ji sedî sed bimirim! Tu meraq neke!" Esat jî di zanebûna cidiyeta vê carê de ye. Esat Oktayê di guftûgoyên Rojiya Mirinê ya 1981'ê de sozên xwe yên leşkerî ji bîr kiribû û gotibû "Ez ê têkilî parêznameyên we yên siyasî nebim", paşê jî li ser esasê zext, zorî û îşkenceyê xiyanet ferz kir. Dema dît vê carê tiştekî bêje nîn e, piçekî jî bawerî pê nemaye, bêyî zêdetir biaxive bi gotina, "bibin" hevalan dişîne hucreyên wan. Wê şevê Xeyrî ji muslixa hucreyê bang li Karasû kir û got: "Me bi ser xist, me bi ser xist, bi şeş kesan me bi ser xist!"

Maneya wê ew bû: "Em ê di oxira şoreş û gel de mirinê hembêz bikin. Em ê meydanê ji dijmin re nehêlin. Wê vir wek qada şer dewam bike. Wê bi mirinên me berxwedan, jiyan pêş bikeve. Wê rabûna ser piyan a gelê me û ji nû ve vejîn nikaribe bê astengkirin. Em ê bidomînin ku bibin deng û rênîşanderê gelê xwe. Em xetê xêz dikin. Me ev bi ser xist." Karasû jî got ku wê sibehê tevlî çalakiyê bibe. Xeyrî jêre got: "Bisekine, tê paşê tevlî bibe." Îdareyê hê wê şeve îstîqaqê êvarî zêde kir!.. Bi awayekî ku qet em hîn nebibûn 3 cure xwarin anîn. Di nav de pir goşt hebû, li rex wê jî şîrînahî!.. Xwarin ev qasî zêde bû ku, piştî bi awayekî zêde li hemû hucreyan hat belavkirin jî hê xelas nebibû. Gardiyan bi awayekî zexel û bi kêf wiha bang dikir: "Tune ye kesekî hê zêde xwarinê bixwaze?"

Di şikandina çalakiyê de êdî şîdetê bandora xwe nedikir. Ji ber çalakî di rewşeke şîdetê de û li hemberî wê derketibû. Roji-ya Mirinê ya Mezin heman demê meydan xwendina li hember

şîdet û zilmê bû. Lê ev nayê maneya ku li girtîgehê dest ji şîdetê hatiye berdan. Li Girtîgeha Leşkerî ya Amedê şîdet timî hatiye meşandin. Zîhniyeta qetlîamker bi awayê herî aşkera bi astên cur bi cur hatiye nîşandan. Wê demê serî li taktîka ku rewşê nerm bikin, berxwedanê sînordar bikin û bifetisînin dan. Nedixwestin çalakî girseyî bibe û hê zêdetir mirov tevlî bibin. Xwezayî ye ku ew rewşa nerm demkî bû.

14'ê Tîrmehê qonaxa ku pêvajoya polîtîkaya hovîtî û îtîrafê ya di asta herî jor de ber bi serberjêr ve tê veguherandin. Ji ber rola dîrokî ya di pêvajoya rizgariya neteweyî ya Kurdistanê de lîstiye navê mezin heq kiriye. Aşkera ye polîtîkayên îtîrafê ji bo doza rizgariya neteweyî ya Kurdistanê çi qasî mezin û xwedî tehlûkeyeke mezin e. Ji ber li derbeyeke ya li her cure xiyanet û revoktiyê hatiye xistin mezinbûna 14'ê Tîrmehê diyar dike. Ev dîrok ji bo dîroka partî û gelê me merheleyeke girîng e. Her wiha ev aliyên wê jî hene; mirov dema ber bi mirinê dibezin, mirinê digirin bi serketî behsa wê dikin. Bûyereke mezin e ya kesên pêwîstiya wezîfeyên xwe bi mirina xwe anîne cih afirandine. Di wê dorpêçê de pêwîst e rêber rêbertiyên xwe çawa bînin cih nîşan bidin jî Rojiya Mirinê ya Mezin mînakeke balkêş e. Xeyrî dema ku got: "Em bi ser ketin, bi ser ketin, bi şeş kesan em bi ser ketin!", heyecan û coşeke mezin li vê bar kir, ma mezinbûneke kêm e?.. Ya rastî dema Xeyrî wer bang li Karasû dikir, bi awayekî agahiya mirinê (bêmiriniya xwe) jî radigihand. Me hemûyan dizanîbû di çalakiyê de mirin bivênevê ye. Wê kêliyê kes ne li bendê bû wê îdare muzakereyê bike, paşde gav biavêje. Li ser navê nirxên gel û şoreşekê maneya çûna ser mirinê bi xwezayî mezin e. Mirovên me neketibin ferqa bûyerê û fêm nekin jî 14'ê Tîrmehê dîrokek dihat nivîsandin. Di demên paşê de dema ev pêlên mezin hinekî vedikişin, pêvajo aram dibe bi perspektîfeke hê berfirehtir, bi mejiyekî hê bi tenduristî mirov paşerojê dinirxîne dibîne çalakiyên hatine lidarxistin, li ser raya giştî ya welêt û cîhanê encamên çi qasî kûr afirandine. Tu dikarî bi rehetî vê bêjî: "Ew gavên wan rojan dihatin avêtin çi gavên

mezin bûn û çi karên mezin hatine biserxistin.” 14’ê Tîrmehê çalakiyeke mezin e ya encamên wer kûr afirandiye.

Wê şevê ji bilî ku Alî Kiliç lêdan xwar bûyereke girîng çênebû. Hatibûn jimartinê, ji bilî Alî yê ketibû rojiya mirinê her kes ji bo jimartinê rabû. Ew ranebû jimartinê. A. Osman Aydin ê bi yek-du serbazan re hatibû jimartinê, çû hucreya Alî û jê pirs kir bê çima ranebûye. Alî jî got, “Ez ranabim!” A. Osman Aydin bersiv hezm nekir, deriyê wî da vekirin, Alî da ber pehînan. Pêlî singa wî kir û got: “Tê rabî ûlen!” Wî jî bersiva: “Ez ranabim” da. A. Osman piştî hinekî din lêxist jêre dijûn got û derket çû.

Hevalên ji girtîgehê hatin behsa çalakiyê ji hevalên li cem xwe re kirin. Li 35’ê kesekî ku çalakî nebihîst nema. Ji ber Akîf Yilmaz û Fûat Kav ji berê de amade bûn, çawa bihîstine biryara tevlîbûnê didin. Ev heval li qata 1’ê hucreya 7. diman. Çalakiya Mazlûm û Ferhatan ew jî kiribûn nav tevgerê. Di salvegera şehadeta Hakî de (18’ê Gulana 1982’yan) biryara xwefedakirinê didin. Lê dema dibihîzin wê rojiya mirinê dest pê bike, dest jê berdidin û li benda çalakiyê dimînin. Serê sibehê jî agahiyê didin îdareyê ku dest bi çalakiyê kirine. Bi vî awayî hejmara çalakvanan derket 8’an. Wê îdareyê em û çalakvan li cem hevdu nehiştibana. Sibeha 15’ê Tîrmehê her 8 jî girtin û birin 36’ê, di hucreyan de bi cih kirin. Piştî hatin bicihkirin A. Osman tê bang dike û dibêje; “Wê qawîşa 36. ji Apociyan re bibe gor!” Akîf jî dibêje; “Wê ji kê re bibe goristan, demên pêş dê diyar bibe.” Ji bo Xeyriyan sê qat hatibû veqetandin. (Wê navberê li 36’ê Ferhat Turk, M. Can Yuce û Muzaffer Kizartici yên ji qawîşên kesên bi werem anîbûn jî hene. Hevalên bi werem jî wê şevê li wir mane. Serê sibehê dibin qawîşa 4’an. M. Can, bi Xeyrî re axiviye; fikir û têkildarî tiştên bên kirin nêrîna wî pirs kiriye. Xeyrî jî behsa girîngiya parastinan kiriye, bi israr destnîşan kiriye ku pêwîst e ji sedî sed bi berfirehî bên kirin Can jî jêre gotiye ya pêwîst wê bê kirin û bila gumanên wî nebin.) Li 36’ê tenê kesên di rojiya mirinê de dimînin.

Jixwe çalakî bi xwe bangek e. Her tişta pêwîst e bê gotin bi çalakiyê hatiye gotin. Lê hêviyên ji bo tevlîbûnê jî ne ku nîn in. Ya hê rasttir ji bo pêşî li xiyanetê bê girtin hêviya pêwîst e, her kes a dikeve ser milê xwe pêk bîne heye. Asta Xeyriyan li holê ye. Li pêşiya girseyê dimeşin. Ew ku hêdî hêdî ber bi mirinê ve diçin, ji bo daîmîkirina vê meşê, dengê berxwedanê gur bibe di nav bendewariyan de ne. Ev jî pir xwezayî ye. Lê cidî ne. Pêwîst e dem û şert baş bên nirxandin. Têkildarî mijara tevlîbûna nav berxwedanê çûna ser kesekî, afirandina rewşeke fiîlî ya derveyî îradeya wî nîn e. Li şûna hest û bendewariyan divê aqil û mentiq derkeve pêş. Her kes di hesabpirsîna xwe de zelal bibe, ji bo bibe parçeyek berxwedanê ew bi xwe biryar bide. Jixwe her biryara ne bi tenduristî li cihekî di nav biryarê de ji sedî sed xwe nîşan dide. Li şûna mirov di nîvê rê de bikeve, ber bi nuqteyên neyênî ve biçe, pêşnexistina wê gavavêtinê hê baştir e. Me ew pêvajo bi wê serwextbûn û mentiqî digirt dest. Ya rast jî ew bû. Banga ji çalakiyeke wiha re, banga ji mirina herî zehmet re ye. Diviyabû heval pir baş fikirîbana û ev biryara girîng dabana.

Em nebêjin îdareyê ji serî heta dawî, lê heta rojên dawî hewl da li hember çalakiyê dîmenekî ku bêeleqe ye û paşguh dike nîşan bide. Dema nikarîbû çalakiyê ji holê rake, serî li taktîka ku wê paşguh bike, bêqîmet bike û bala xwe nede ser xist. Hewl dida bi vê taktîkê bandora çalakiyê bi sînor bike. Dixwest vê hewayê bide çalakvanan, “Eger hûn bimirin, bimirin. Hûn hemû tune jî bibin qet ne girîng e.” Îdare ji bo guhdarkirina axaftinên hevalan girtiyekî ji Bûcakan bi dizî dixe qata 1’ê. Girtiyê axaftinan bike rapor, bi Zazakî, Kurmancî û Tirkî dizane. Tiştên dibihîze dike not û ji îdareyê re radigihîne. Kemal F. Çavgûn û Bedrettîn Kavak li qata 4’ê, Akîf Yilmaz, Alî Çîçek û Hamît Kankiliç li qata 3., Fûat Kav, A. Kiliç, Xeyrî û Karasû li qata 2. di hucreyên vala de bi cih dikin.

Agahiya me jê tune bû ku Hamît dest bi çalakiyê kiriye. Piştî çalakiyê dibihîze bi çend rojan daxwaznameyê dinivîsîne û dest pê dike. Piştî hefteyek-du hefteyan li 35’ê tê hiştin tînin

36’ê. Karasû jî tevî Xeyrî jêre got, “Tu paşê dest pê bike” jî zêde nesekinî. 20’ê Tîrmehê dest pê kir, lê 5’ê Tebaxê birin 36’ê. Ji ber derfeta not bi dest bên şandin û stendin tune bû, ji bilî mijarên girîng bi dengê bilind diaxivin. Wê demê îspiyonkerê li qata 1’ê tiştên dibihîze dike rapor.

Haya hevalan ji îspiyonker heye û dibêjin: “Li ser tiştên hûn dibêjin baldar bin. Li qata jêr anten heye.” Û hevdu hişyar dikin. Tiştên bi kêrî îdareyê bên bi dengê bilind naaxivin, bi pistepist û notan ji hev re dibêjin. Bi ben notan ji hevdu re diavêjin.

Beriya her tiştî berxwedanê hemû rêzik û qaîde avêtin cihekî. Bi moralekî mezin çalakî dihat dewamkirin. Bi wê daneheva mezin a salan sohbet dest pê dikin. (Ew hewaya xweş ji serî heta binî timî dewam kir.) Di sohbetan de behsa paşerojê, bîranînên xweş, bûyerên mirovan dikenînin, tecrûbeyên manedar ên mirov didin fikirandin, mijarên teorîk ên cur bi cur, pirsgirêkên şoreşa Kurdistanê dikin. Piştî bêdengiya bi salan hevalan hemû fikir û nêrînên xwe yên bên parvekirin ji hev re radigihînin. Carinan serbaz diçin 36’ê û tên, lê sekna wan a esasî weke min got, paşguhkirin e. Heval jî qet guh nadin wan. Ev pir li zora îdareyê diçe, lê li hemberî biryara mirovên ku bi fedakirina jiyana xwe, li hember teslîmiyetê sekinîne dikare çi bike? Di rojên Rojiya Mirinê ya Mezin de qawîşa 36’ê ji bo me mabedeke pîroz, dibistaneke mezin û rûpelekî girîng ê têkoşîna me bû.

Bêguman, perwerde jî, rêzik jî dewam dikin. Fermanfermandarî di meriyetê de ye. Destjêberdan, dayîna hin tawîzan nîn e. Me gotibû 14’ê Tîrmehê merheleya zêde ya çalakî û berxwedanên paşerojê ye. Lê hê girse nehatiye ser hişê xwe, ranebûye ser piyan. Îşkence û hovîtî dewam dikir. Lê ne ku nermbûneke bi qismî çênebû. Mînak hema piştî çalakiyê rojnameyê didin 35’ê. Rojê yek-du rojname dianîn. Her wiha ji bo kantînê timî lîste digirtin. Xwarin zêde bû. “Perwerde”ya berê ji danê sibehê heta tevahiya rojê dewam dikir, êdî bi molayên deh deqe û nîv saetan didomandin. Ber bi rêbaza rewşê bixin asta mirov tehemûl bike û serê hovîtiyê hinekî mevred bikin diçûn.

Ji bo nebin darikê nav tirafê ku bi îhtîmam jî dixebitîn, bi awayekî li qeraxên girtîgehê qîrîn û nalînên girtiyan ên li dîwaran ketin qet kêm nebûn. Bi gumana dibe ku çalakî zêde bibe, di nav tirseke mezin de bûn!.. Bêperwatî hinekî hatibû sekinandin, lê nedixwestin nîşan bidin ku li hemberî berxwedanê paşde gav avêtine.

Ya rastî Esat ji berê de dîtibû ku axa di bin lingê wî de dişemite û dixwest pêşiya wê bigire. Şîdet xwedayê Esat bû. Bi hovîtiyê re dikarîbû heta dawiyê serî bi mirovan bide xwarkirin!.. Bi Mazlûm û Çaran re jî bi teroreke çavsor êrîş kir û ket nav hewldana fetisandina berxwedanan. Haya wî jê hebû ji bo bigihêje armanca xwe tu rêbazekî din tune ye. Ha di wan rojan de axê hêdî hêdî dest bi şemitandinê kir, tecrûbe û danehev her ku çû veguherî çalaktiyeke girseyî û rêxistinî. Ji ber kêlî bi kêlî dibû şahidê hilweşîna pergala ava kiribû ew dibehicand. Bi destpêkirina Rojiya Mirinê ya Mezin re êdî dengê Esat ê bi çingeçing nema dihat bihîstin, ew bi xwe jî nema xuya dikir. Tevî li girtîgehê jî bû, nediket qawîşan, dernediket pêşberî girtiyan. Xwedayê Amedê, li korîdorên dojeha afirandibû şîqînî ji tiliyên xwe nedianî û nedigeriya. Esat ku xuya nedikir, bêxemiya wî aliyê besît ê mijarê bû. Lê rûyê duyemîn ê madalyonê hebû. Ji bo ev hêlîna zilmê ya bi ser wan de dihat xwarê li ser piyan bigirin, rêyên valaderxistina berxwedanê peyda bikin, kolordû, MÎT û îdare di nav nîqaş û lêgerînan de bûn. Ji bo berxwedana ku xew li wan heram kiribû têk bibin, serê xwe pê diteqandin. Li ser êgir bûn.

Piştî çalakiyê dest pê kir, herî kêm bendên ji “gelo”yan ên di serê hinekan ji me de çêbibûn hilweşiyan. Êdî ji bo me her tişt qediya. Çavên me tiştek nedidît. Ew heval ku mirov dizane xwe dane ber mirinê, ji nav me birin, di me de hesta valatiyeke mezin afirand. Mîna dil, mejî, fikir, ruh, her tiştên me bi wan re biribûn. Bedena me ne li cem wan bû, lê wekî din her tişta me li cem wan bû. Em ne pêjnan dikin ne jî em dizanin em sax in yan na. Tiştên li derdora me rû didan êdî qet em eleqedar nedikirin. Tu girîngiya jiyana rojane, zext, ferman û rêzikan nemabû. Hem

haya te ji girîngiya dîrokî ya demê ya çalakiyê heye, hem jî êşa ku mirovên tu ew qasî ji wan hez dikî û hurmet didî wan ne li cem te ne dikişînî. Îdare di nav hewldanan de ye ku întibayeke mîna kesên dest bi rojiya mirinê kirine tenê hatine hiştin bide. Di vê hewldana wê de tu wer hîs dikî ku para te heye. Tu naxwazî van bi vê kêfxweş bikî. Xwesteka tevlîbûna çalakiyê, hem jî tavilê bi awayekî ku nayê astengkirin xwe li te dipêçe. Ha di nav wan hest û fikrên kûr di demeke kurt de min biryara xwe da. Diviyabû çalakî daîmî bibûya. Ez ê tevlî çalakiyê bibûma. Paşê min ev fikra xwe ji Riza Altûn re ku li qata 1'ê bû ragihand. Şener li qata 3., hucreya 7. bû. Ji ber nêzî min bû car caran em bi pistepist diaxivîn. Wî jî got ku wê tevlî bibe. Di rûniştina yekemîn de me yê her duyan biryara xwe aşkera kiriba. Ji ber yekane rêya mirov ji raya giştî re ragihîne ku çalakî didome û tiştên li girtîgehê rû didin ragihîne derve dadgeh bû. Eger beriya rûniştinê me aşkera kiriba ji sedî sed em nedibirin. Yekemîn rûniştina ez ê çûbama ez na şaş bim rastî roja 25'emîn a çalakiyê dihat. Xwesteka min dixwest zûtir tevlî bibim, ji ber roja dadgehê ya em li bendê dereng ma. Di dawiyê de ew roj hat. Ez li bendê bûm ku serê sibehê tavilê gardiyan bên derî vekin. Lê nehatin, wê rojê ez nebirim dadgehê.

Têkildarî me ne rehet bûn. Wer hesab dikin em ê dest pê bikin. Texmîn dikin bê em ê çawa çalakiyê aşkera jî bikin. Naxwazin çalakî veguheze, bi feydegirtina derfeta dadgehê em peyamê bidin derve û qawîşan. Êdî îdareyê dersa xwe girtibû û niyeta wê ya kursiyê dadgehê bide bikaranîn tune bû. Lewma bi hostetiyeke mezin tevdigerin. Êdî rewş û aciziya em têde bêterîf e. Em hêrs dibin, aciz dibin em bi gotina, “Em çawa bikin da ku dest pê bikin?” tevdigerin. Destpêkirin ne tiştek e, lê ragihandina derve pir girîng e. Heman demê ne yekser be jî rêya mirov pêşketinên têkildarî çalakiyê bigihîne partiyê ev e. Her wiha girîng e girseya me ya li girtîgehê pêşdeçûna rojiya mirinê û daîmîbûna wê zanibe. Bi kurtasî em naxwazin derfeta dadgehê dehf bidin. (Di wan rojan de partiyê bi awayekî tenduristî nizanîbû bê li girtîgehê çi rû dide. Em di nav tecrîdeke kûr de bûn.

Ji ber vê jî gelek caran agahiyên ne bi tenduristî ji partiyê re diçûn. Mînak şêwazê çalakiya Mazlûm piştî bi salan fêr bûn. Bihîstine ku Mazlûm ji aliyê îdareyê ve hatiye qetilkirin. Dîsa di çalakiya Ferhat de jî rewş wiha ye. Piştî Çaran di ziyareta me ya yekemîn de tê belavkirin ku gelek mirov hatine kuştin. Û agahiya malbatan daye partiyê ev e ku zêdetirî 30 mirov hatine gulebarankirin, kuştin. Di organên me yên weşanê de jî van agahiyan cih girtine.) Avantajek din jî, gelek malbatên piştî Xeyrî biryar aşkera kir agahî negirtin, bûyer bihîstin; ji bo hîn bibin bê ka çi heye wê bên rûniştinê. Şener got li benda koma Êlihê bin. Lewma me tevlîbûna çalakiyê taloq kir. Em li benda koma Êlihê bûn. Wê Şener di wê komê de derketiba û aşkera kiriba. Di wê navberê de min xwe dixwar. Roj wek avê derbas dibûn. Rûniştina koma Êlihê rastî roja 40'î ya rojiya mirinê dihat.

Tiştên min wan kêliyan hîs dikir, pir zehmet e bînim zimên. Ew tevlîheviya hesta me dixwest wext tavilê derbas bibe û bisekine heta mûrehkên xwe hîs dikir. Tu dixwazî wext derbas bibe; roja em li bendê çi qasî zû bê, em ê hê zûtir di nav çalakiyê de hevalan hembêz bikin. Em dixwazin wext bisekine; hevalên me di rêya mirinê de ne, em dixwazin ew bijîn. Eger em ê ji hev qut bibin, eger em ê wan bi rê bikin, em dixwazin vê bi çalakiyê bikin. Em dixwazin ew rêwîtî zû neqede, em bigihêjin wan û me jî bigire nav xwe. Em tevlîhev in. Xew nakeve çavên me. Roj derbas bûn, Dema rûniştinê hat. Şener xwe ji bo dadgehê amade kir. Lê ew jî nebirin!..

Ez li ber teqînê me. Hesta derengmayînê di dilê mirov de rûdine. Xencera teslîmiyetê hê zêdetir di dilê mirov de diçike. Her tişt di destê îdareyê de ye, îdare mirovê naxwaze nabe dadgehê. Heyet jî nabêje çima te neanî. Dema Şener jî dernexistin dadgehê, me rageşî û bendewariya xwe ya 40 rojan bi dawî kir.

## Kemal Çavên xwe Winda Dike

Dema karê dadgehê xitimî min ji Şener re got di jimartina danê êvarî de ez ê ji îdareyê re ragihînim û dest bi çalakiyê bikim. Ber bi nîvro ve pêşketineke din çêbû. Alî Kiliç dest ji çalakiyê berdaye, ji hoparlorê îdareyê ew da axaftin.

Li gor me paşê bihîst Alî di rojên 30, 32'yemîn de dest ji çalakiyê berdaye.

Îdare destpêkê dixwaze Alî bikin amûrekî plana xwe ya difikirin pêk bînin. Dema Alî zeafê nîşan dide û nikare mirinê derbas bike îdare diçe ser wê zeafê. Ya dixwaze dide kirin. Ji ber dest ji çalakiyê berdaye di nav hilweşîneke fizîkî û ruhî de ye. Dema radikin revîrê zêde ne li ser hişê xwe ye. Esat Oktay dikeve revîrê dixwaze wî teftîş bike. Jêre dibêje: "Tiştên ez dibêjim tê bikî?" Alî red dike. Wê carê serî li tehdîda mirinê dide. Jêre dibêje: "Em te tedawî nakin. Tê bimirî û biçî. Heke tu bixwazî bijî tê tişta ez dibêjim bikî" û diçe. Di teftîşeke din de bi nivîsa amade kiriye tê. Zextê lê dike û dibêje: "Yan tê vê nivîsê di teybê de bixînî, yan jî tê îtîrafê binivîsînî!" Alî careke din têk diçe. Li naveroka kaxezê dinihêre. Tevî gelek tiştên giran jî têde hene, li şûna îtîrafkariyê bike xwendinê qebûl dike. Axaftina wî dixin kasetê. Di yekemîn meha çalakiyê de ketina kesekî, Esatê bêçare bûye, kêfxweş dike û bi hêvî dike. Fikra wî ew e ku çend rojên din jî bisekine wê hin kesên din dest jê berdin. Lewma axaftina Alî dereng tê weşandin.

Tam nayê bîra min, lê Alî behs kiribû ku piştî dest ji çalakiyê berdaye ew birine salona sînemayê. Li wir bi destê wî ve bi jor ve daliqandine, xwestine tişta dixwazin pê bidin qebûlkirin. Dibêjin, "Em ê weke Alî Erek te jî bikujin" tedawiya wî asteng kirine. Lê dema ya hatiye xwestin qebûl kiriye pêre eleqedar bûne.

Weşana navendî hat kirin. Esat da destpêkirin. Ji çalakiyê û wir ve cara yekem me dengê wî dibihîst. Mîna fermandarekî serketin qezenc kiriye got: "Min guhdar bikin. Ev demeke ez çûbûm betlaneyê. Çend kesên xwe nizanin ji tunebûna min fey-

de girtine, dest bi greva birçîbûnê kirine. Tevî dest pê kirine, hin kesên niyeta wan nîn e vî karî bikin jî bi zorê tevlî çalakiyê kirine. Çi kirine ez ê ji we re nebêjim, bila mirovên hatine xapandin behs bikin. Hûn hemû wî nas dikin. Niha hûn ê wî guhdar bikin.” Paşê axaftina wî ya qeyd kirine ji teybê weşandin. Alî destpêkê xwe da naskirin. Paşê jî got: “Dema M. Xeyrî Dûrmûş rojiya mirinê aşkera kir, ez li cem Kemal Pîr rûniştîbûm. Zext li min kir. Got ku tê tevlî rojiya mirinê bibî! Ya rastî niyeta min tune bû ez tevlî bibim. Ji tirsa li girtîgehê tiştek bê serê min, rabûm û min aşkera kir ku ez ê tevlî bibim. Ji dema em birine 36’ê hemû bi dizî nan û xwarinê dixwin!.. Ez di roja 30’î de kêm mabû bimirim, lê ew hê radibin ser piyan, diaxivin, volta diavêjin. Nan û xwarinê dixwin, dema gardiyan pirs dike, dibêjin mişkan xwar. Wan timî em xapandin. Li derve her yek ji me kirin bombeyeke ji teqînê re amade. Li hundir jî wê me bişînin mirinê û li ser cesedên me qehremantiyê bikin.” Piştî axaftina Alî careke din Esat axivî û got: “Kesên tevlî rojiya mirinê bûne nikarin tiştekî bikin. Berê jî heman tişt ceribandin. Dewlet bi hêz e, tawîzê nade kesekî. Jixwe xwarinê dixwin, dibêjin, ‘Kesê dibêje Tirk im çi bextewar e.’ Ez ê hesabê ku tevlî çalakiyê bûne ji wan bipirsim. Bila kesek nebe amûrê wan.” Paşê jî cîhaza deng girt. Esat Oktay di vê axaftina xwe de ragihand ku wê bi kesekî re guftûgo û muzakereyan jî neke. Her wiha ji ber dengê di teybê de hatibû qeydkirin lewaz bû, Alî anîn, heman nivîs vê carê li ser mîkrofonê careke din pê dan xwendin.

Esat wer dihizirî ku derfeta pêngaveke dijber bi dest xistiye. Armanca wî ew bû ku moralê girseyê xera bike û desteka ji çalakiyê re asteng bike. Lê ev hê çors û paşdemayî kir. Bi awayekî acemî tevgeriya. Wer hizirîn wê tirsa mirovekî dest ji çalakiyê berdaye bixin nav gel, wê fikra, “Temam êdî ev mesele qediya, ji niha ve dest ji çalakiyê berdan”, bidin bicihkirin. Lê panîka ketiye nav û çalakiyê çi qasî cidî digire ji girtîgehê re ragihand. Lîstika Esat a dawî jî berevajî zîvirî. Axaftin her çi qasî di nav girseyê de bû sedema bêmoraltiyeke giştî jî, nefreteke muezem

çêkir. Biçûkxistina rêberên me nedihat qebûlkirin. Encama “Ji xewa mirinê ya em ketinê de divê em hişyar bibin û bên ser hişê xwe” careke din xurt bû. Ya di vê nuqteyê de hatiba kirin ew bû ku mirov bi çalakiyê bersivê bide Esat.

Pêwîst e em hinekî behsa pêkanînên ku îdare di mijara xwarinê de li hember 36’ê pêk tîne bike. Li ber her hucreya hevalekî tabldotek danîne. Lalîk li ber caxên hesînî yên qatê li pêşberî hucreyê disekinin. Her dan xwarinê dixin lalîkan, heta danê din dima. Îdareyê bi awayî hem qeyd dikir ku her dan xwarinê dide hem jî bi sorkirina birçîbûna çalakvanan ji bo şikandina îradeya wan wek çekekê bi kar dianî. Dema em bên ser mijara ku Alî dest ji çalakiyê berda jî; êdî tevî gihiştiye asta dest jê berde jî ji îdareyê re nabêje. Êdî dest pê dike bi dizî ji lalîkê xwarin û nan digire. Lê ji ber di navbera hucreyê û caxên qatê de mesafeyeke metreyek û nîvek heye, nagihêje lalîkê. Pêlavê bi ben vedike û dixwaze bi vî awayî lalîkê û nan bikişîne. Dema ben diavêje pêlav li lalîka xwarinê dikeve û deng derdikeve. Karasû, Fûat Kav û Kemal deng dibihîzin. Kemal bang dike dibêje; “Ew kî ye? Çi dike?” Kes bersivê nade. Lê heval fêm dikin ku Alî ye. Dema heman bûyer danê din jî dubare dibe, Kemal pir aciz dibe; Kemal bi israr pirsa, “Kî ye ew?” dike. Karasû dibêje; “Xwe aciz neke, dest jê berde.” Kemal, wer dihizire ku wê haya dijmin jê çêbibe, ji bo dubare nebe bang li Alî dike û dibêje: “Madem niyeta te heye tu bixwî, wê demê dest ji çalakiyê berde, vegere qawîşê.” Ji bo nekeve nav neyêniyên mezintir hişyar dikin. Jêre wiha dibêjin, “Êdî hewce nake tu li vir bimînî. Jixwe ev karê mirinê ye. Tê hem bêjî ez diçim mirinê, hem jî tê tiştên wiha bikî. Ev pir şaş e. Rojiya mirinê pevçûna îdareyê ya bi xwestekên îdareyê re ne. Eger tu teslîmî zeafên xwe bibî ev mesele qediyaye. Hem xwarin hem jî rojiya mirinê di nav hev de nabe. Jixwe pêwîst e vî şêwazê mirinê bi awayekî ku em destûrê nedin tu spekulasyonên dijmin pêk bînin. Divê tu dilxwaz bî. Lewma pêwîst nake tu li vir bimînî û wer dewam bikî. Biçe.”

Alî roja duyemîn bang li gardiyan dike, jêre dibêje ku wê dewam neke û dest jê berdide.

Dema Alî ji hoparlorê diaxive pir li zora hevalan çûye. Hevaltiya dozê, hevrêtî heye. Bi hev re ber bi mirinê ve diçin. Birçîbûn, fikir û hest tê parvekirin. Ji wan mirovên ku bûn yekpare dema yek li hember zeafa xwe têk biçe û bikeve wan rewşan bi xwezayî wê hevalan bandor bike. Bi taybet gotinên: "Kemal ez tehdîd kirim. Ez ji tirsan tevlî çalakiyê bûm." Kemal êşandiye û pir hêrs kiriye. Bi dengekî şikestî û bi hêrs gotiye: "Yaw ev qas nabe. Yanî tu derewan nekî nabe?.." li ber dikeve.

Jixwe em amade bûn. Ji bo domandina çalakiyê ji vê guncawtir zemînek nedibû. Wê biba tam mîsîlemeyek, tam bersivek. Ji bo me kêfa Esat di qirika wî de hiştiba diviyabû me heman rojê dest pê kiriba, hewaya neyênî ya hatibû afirandin ku moral xera dikir, diviyabû me berevajî kiriba. Her wiha diviyabû me nîşan daba wê pevçûn bidome, şûna kesên diçin wê bê dagirtin. Min ji Şener re got: "Em di jimartina êvarî de bêjin me dest bi rojiya mirinê kiriye" û em wer tevgeriyan. Wê şevê em di 35'ê de girtin. Serê sibehê çawîş bi kaxeza di dest de hat. Xwest em daxwaznameyê binivîsînin û îmze bikin. Diviyabû me nivîsandiba ku tu eleqeya îdareyê bi destpêkirina me ya rojiya mirinê re nîn e! Ji bo kêliyekê min ji tiştên bihîst yeqîn nekir. Mîna lêpirsîn bikim li çawîş nihêrîm, zilam cidî bû! Min hinekî bi hêrs jî got: "Ka bide, ne kaxezekê, hezar kaxezî bîne ez îmze bikin!" Ya hat xwestin min kir. Ya rastî tişta min kiribû şaş bû. Tişta ez ber bi vê şaşiyê dehf dam jî ev helwesta tewş bû. Em gihiştine çi nuqteyê ew hê bi çi re mijûl dibin, tenezûlî çi dikin! Madem hûn ji mirina me ditirsin, çima hûn van tiştan dikin? Êdî cesareta wan a tiştên dikin aşkera pêk bînin jî nemaye. Dema tu dibînî dijmin ev qasî bêçare bûye, biçûk bûye têr dike tu ya piştî wê zêde girîng nebînî. Dema min kaxez da çawîş min jêre got: "Qet ji bîr neke, eger em li vir bimirin, ne daxwaznameyek hezar daxwazname we pak nake." Bêdeng çû. Paşê heman tişt ji Şener jî xwest. Wî jî îmze kir û dayê. Zêde neçû em jî birin. Destûr nedan em tu eşyayekî bigirin cem xwe. Em ji hucreya

xwe derketin, dema em li korîdorê disekinîn, gardiyan hat cem min û got: “Te dest bi çalakiyê kir, ma tê karibî dewam bikî? Tê karibî li hemberî birçîbûn û bêaviyê li ber xwe bidî? Binihêre, li wir em avê jî nadin kesekî. Havîn e tê ji bêaviyê bimirî.” Hin tehdîdên din jî kirin. Min got ku ez ê dest jê bernedim, çalakiyê heta dawiyê dewam bikim. Em bi hev re hatin 36’ê, korîdora navber a qata 3’yemîn. Çawîş got; “Tu Deza nas dikî? Deza jî li vir e.” Min got, “Na, ez nas nakim.”

Hamît Kankiliç e. Min fêm nekir bê behsa kê dike. Ji ber min nebihîstibû ku Hamît dest bi çalakiyê kiriye. (Tecrîd ev qasî kûr bû, em di heman qawîşê de ne, lê paşê haya me jê çêbû ku hin hevalan dest bi çalakiyê kirine. Mînak Akîf tevî sibeha roja duyemîn dest pê kiriye, hinek ji me piştî mehekê pê hesiyan. Piştî ziyaretê bû. Navê kesên pere ji wan re hatibûn hatin xwendin. Ji devê serbaz şehitî navê Akîf jî xwend. Hevalek li qata jêr jî ev wek firsendekê dît û got: “Akîf di rojiya mirinê de ye, ew birin 36’ê.” Kesên ne bihîstibûn jî bihîstin.) Hasan Hayrî yê ji Partîzan û li qata 3’yemîn dima jî beriya me bi rojekê dest pê kiribû, lê haya me jê tune bû!.. Dîsa haya me ji M. Emîn Keskîn ê beriya me bi rojekê dest pê kiribû jî tune bû. Yê me jî ji bilî yek-du hevalan kesî nizanîbû. (Rojekê di vegera ziyaretê de li ser derenceyê min derfet dît û ji Îdrîs Guzel re got; “Em domandina çalakiyê biparêzin. Em amade bin.”) Mehdî Zana têkildarî em ê dest pê bikin, pistepista me bihîst. Li qata 2’yemîn bû. Derfetek dît û bang kir, got: “Muzaffer, ma amadekariyek heye? Tişt in çêdibin?” Min bi gotina: “Em tevlî rojiya mirinê dibin” bersiv da Mehdî Zana, lê her kesî ew axaftina kurt bihîst. Mehdî Zana serketin xwest.

Nedixwestin Xeyrî û hevalên li cem zanibin hema piştî çalakiyê tevlîbûn çêbûne. Dixwestin moral xera bikin. Lê piştî demekê dîtin ku ev “tedbîr” encam nade. Jixwe em jî ji dergehê hatibûn avêtin!.. Em behsa zexta îdareyê ya li hember tevlîbûnên yek yek pêş dixist bikin: Piştî Hamît ji 35’ê hat wergirtin, A. Osman wî tehdîd dike û dixwaze dest jê berde. Dema Hamît dest jê berdide dibin salona sînemayê. 6 rojan li odeya

makîneyê li ser betona tazî tê razandin, dilopek av jî nadinê. Dema nikarin berxwedêriya wî bişkînin, dibin 36'ê. Heman tehdîdan li H. Hayrî û Keskîn jî dikin. Şevekê li cihekî cuda tê hiştin û roja duyem dibin 36'ê. Roja me dest pê kir dane nîvro Riza, Karakûş, H. Baldemîr li hev dikin û diyar dikin ku dest bi çalakiyê kirine. Her wiha heman rojê zêde neçû ew jî anîn. Dîsa heman rojê hema piştî me Fevzî Yetkîn jî tevlî çalakiyê bû. Ew jî bêyî rawestînin anîn.

Beriya her tiştî ew jî "gelo"yên di serê xwe de bi encam dikin û zelal dibin. Ji ber Alî di hoparlorê de dane axaftin aciz bûne û wê êvarê me biryara destpêkirina çalakiyê ji îdareyê re ragihand wer difikirin ku kêliya guncaw hatiye, nîqaş dikin û dest bi çalakiyê dikin. Tirsa îdareyê ya ji domdariya çalakiyê û mîsîlemeya li hember helwesta Esat wan har dike. Piştî Riza ji hucreyê derdixin, li salona 35'ê çawîş bi hemû hêza xwe kulma xwe li çeneya Karakûş dide. Çeneya wî yan şikestibû yan jî derizîbû. Bi dijûn, heqaret û tehdîdan êrîşî hevalên din jî dikin.

Esat Oktay, poşman bûye Alî Kiliç daye axaftin. Fêm kiribû ku şaşiya taktîk kiriye. Rêbaza wî ya nefretê pêş dixe, mirov pir bandor kiriye, pêvajoya zelalbûnê bi lez bû û veguherî mîsîlemeyê. Êdî di îdareyê de hewayeke panîkê serwer bû. Heyirî mabûn. Tevlîbûna me ya ji çalakiyê re her çi qasî ne bi awayê komên bi rêkûpêk jî bûya ev nêrîn rûniştibû; "Wan li hev kiriye, kom kom dest pê dikin. Yê dora wî tê dest bi çalakiyê dike!"

Hevalan em bi coş û hezkirin pêşwazî kirin. Me hema dest bi sohbetê kir. Kemal weke her tim zindî, bi hereket, gurûgeş bû. Got, "Wekî din hevalên tevlî bibin hene?" Me got ku mimkun e heval tevlî bibin. Xeyrî got: "Dest jê berde Kemal, pirs neke, wê bên. Ev mesele naqede. Wê ev der bi xwînê bê avdan. Baweriya me ya bi hevalan re heye, wê bên." (Axaftineke bi heman rengî di navbera Kemal û Karasû de derbas bûye. Roja Karasû anîne 36'ê Kemal pirs dike û dibêje ku wê wekî din kî tevlî çalakiyê bibe. Karasû jî dibêje ew tevlî bûye, ji hevalekî jî xwestiye tevlî bibe, ew jî li benda dadgehê ye, wekî din ji kesekî re negotiye "tevlî" bibe, nexwestiye telkînan li kesekî bike, her

kes bi îradeya xwe tevlî vê çalakiya zor û zehmet bibe wê ya herî rast be. Kemal jî dibêje; “Te şaş kir, tê bang kiriba, kesên tevlî bûbana wê tevlî bûbana, ên dest jê berdabana wê dest jê berdabana. Destjêberdan ne girîng e, ya girîng ew e mirov bi tevlîbûneke xurt bidomîne.” Paşê yek yek rewşa hevalan pirs dike. Karasû bi fikra dibe ku îdare guhdar bike dibêje, “Her kes baş e”. Xeyrî bi heman nêzîkatiyê dibêje: “Kemal zêdetir pirs neke, heval baş in, wê bên.”

Tiştekî bi nakok nîn e. Kemal dixwaze pêvajo hê zêdetir gurûgeş û bi lez bibe. Her du jî bi hosteyî dikarin pêvajoyê binirxînin, heval nas dikirin. Nêzîkatî yan jî bêbaweriyeke Kemal a “Heval nayên!..” tune bû. Berevajî dizanîbû wê bên. Xeyrî jî ji ber giranî û cidiyeta demê dihat zanîn, wer difikirî pêwîst e mirov tevlîbûna wan di nav vê nêzîkatiyê de bigire dest. Paşê Xeyrî ji me pirs kir ku çima em dereng mane. Min jî jêre behsa rojên me yên bi aloz û rageşî û mayîna li benda dadgehê kir. Xeyrî got ku hê ji îdareyê kesek nehatiye bi wan re guftûgo nekiriye, heta ji nav me kesek nemire wê nêzî guftûgoyan nebin. Bi wê hesret û tijîbûnê, me behsa pêşketinên rojên me bêyî wan derbas kirin, nûçe û agahiyên me ji rojnameyan bihîstibûn me ji wan re ragihand. Bi cîhana derve, tiştên rû didin pir eleqedar bûn. Timî hin tişt pirs dikirin. Me got ku Îsraîlê êrîşî Lubnanê kiriye, hinekî jî bi esprî me anî ziman ku Kûpaya Cîhanê, Îtalya qezenc kir û dîsa me behsa pêşketinên girîng kirin. Wan jî pêşketinên girîng ên çil rojên ku ji me cuda jiyane bi serenavan ragihandin. Me sohbetên ku mirov ji wan têr nabe kirin. Atmosfereke gurûgeş, bi coş û kêf bû. Kemal ji Fevzî Yetkîn ê hema piştî me hat pirs kir û got: “Fevzî hela wê bûyera 33. ji serî heta dawî ji me re ragihîne, em jî zanibin.” Fevzî jî behsa çalakiya Çaran a bû şahidê wê kir. Bi vî awayî em hemû cara yekem bi awayekî komîserhev hîn bûn. Qet nedihat bîra me ku li hemberî me mirovên 40 roj in birçî ne, hinekî din nêzî mirinê dibin û dibe ku her kêlî mirin were hene. Jixwe mirin têk çûbû, ji me dûr bû. Jiyan bi mirinê re diraqisî. Bi taybet Kemal bi kesayeta xwe ya bi coş timî ruhê çalakvanan gurûgeş dikir. Xeyrî zêde

nediaxivî, lê bi kesayeta xwe ya aram û bi biryar bawerî dida. Her tişt ketibû nav hev û bibû yekpare. Wê hewaya germ heta dawiyê dewam kir. Me xeyal, hêviyên xwe yên ji jiyanê, bîranînên xwe yên nayên jibîrkirin, di wan sohbetên xwe yên mirov ji wan têr nedibû ji hevdu re radigihand. Li 36'ê cîhan û jiyaneke xweşik û bedew a wê careke din nehatiba dîtin hebû.

Tişta ew cîhan ji hevdu qut kirin, dîwarê di navbera berxwedan û teslîmiyetê de bû. Di cîhana berxwedanê de her tişt hatiye avêtin, hemû zincîr hatine şikandin, tam hewayeke cejnê heye, tam hewayeke azadiyê heye. Em vê di bîr û hişê xwe de dijîn. Ev hewaya xweşik û bedew bi xwîna me tê afirandin. Em dizanin berdêla wê mirin e. Mirin li ber derî ye, li benda kêliya wê yekî ji nav me bigire ye. Me êş û qolinca qutkirina zincîrên lingê me girtibûn, demeke dirêj kişandibû. Lê li cihê em jê hatin me hemû parçe kiribûn û avêtibûn, di nav me de kêf û coşa wê heye. Bi mayîna li wir, bi parçekirina hemû rêzikên dijmin ferz kirine tu dibînî te derbeke mezin lê daye, meydanê lê dixwînî û serbilindiya wê heye.

Qawîşa 36. li gor armanca bikaranîna wê di nav qirêjiyê de bû. Dema bêpariya ji paqijiyê ya di rojên çalakiyê de jî tevlî wê qirêjiya giştî bû, dîmen hê balkêştir bû. Qata jêr bi ava lexemê û qirêjiyê tijî ye. Demsala herî germ a Amedê ye. Bêhneke ku mirov difetisîne. Li her cihî mişk hene. Mişkan hingî xwarinên li ber hucreyan dihatin danîn dixwarin bibûn weke pisîkan. Ew bêhna wan a mirov nikarîbû tehemûl bike ketibû her cihî. Mişkan di nav lalîkan de bi cirîdan dilîstin, a nedixwarin jî belav dikirin. Wisa bibû ku êdî li xwarinê nedinihêrîn. Neditirsiyan jî, hîn bibûn, bi şev û roj digeriyan. Bi hesinan ve hildikişiyan, li ser me digeriyan. Mişk, bermahiyên xwarinê, qirêjî û bêavî hatibûn rex hevdu, bi hewaya mirinê ya hêdî hêdî nêz dibû re bibû yek, hewayeke giran a bêterîf û mirov nikarîbû tehemûl bike ava bibû. Bi kurtasî bêhna mirinê ji 36'ê dihat. (Dema beden êdî xwe dixwe û rûnê xwe winda dike weke mirovekî di gorê de dirize bêhn jê tê. Ew bêhna dehşet û menfûr a ji devê mirov derdikeve jî bêtehemûltiyeke cuda ye.) Hewaya dijwar û giran.

Dilê mirov li hev dikeve, tu li kîjan alî dinihêrî hildiweşe. Ji ber derfet nîn e mirov banyo bike, kincan biguhere jî ew bêhna giran ketibû beden, kinc, livîn û her tiştên li derdorê. Li ser hevalan hê jî kincên 14'ê Tîrmehê li xwe kiribûn hebûn. Por û rih ketibû nav hevdu. Beden bibûn hêlîna spiyan. Keriyên pêşiyan ên bi wizînî difiriyan hebûn. Mîna artêşekê êrîşî bedena me dikirin û weke maran bi me vedidan. Xwîna di bedena birçî de yek jî wan dimijand. Bi taybet bêaviyê em mehf dikirin. Îdare ji bo îradeya çalakvanan şikandiba û di nav êşan de ew şandibana mirinê ava ku yekane tişta ji dev werdigirtin weke çek bi kar dianî! Ji ber av dernediket qatên jor heval zêdetir bandor dibûn. Di havîna Amedê de dema mirov bêav tê hiştin bê çi qasî zor û zehmet e ez nikarim vebêjim. Îdareyê piştî bi rojan bîdoneke biçûk a avê û tasek danî ber her hucreyê. Ava di bîdonê de carinan bi rojan nedihat guhertin. Germ dibû bêhna naylonê jê dihat. Carinan jî diqediya, bi rojan bidon nedihat dagirtin. Carinan av dihat. Kêm jî be herî zêde qata duyemîn jê feyde digirt. Di vê navberê de têkildarî bêaviyê ez behsa bûyereke ku di navbera Xeyrî û Fûat Çavgûn ê li qata 4. rû da bikim. Ava Fûat qediyabû. Bi rojan nedan. Rojên 45'ê yên çalakiyê bûn. Heval ji bêaviyê bêhal e û dinale. Nalînên wî kezeba me dişewitand. Xeyrî tehemûl nekir, bang li Fûat kir, jêre got: "Eger tu karibî ben berdî jêr ez hinek av ji te re bişînim." Hucreyên wan li heman hîzayê bûn. Fûat jî taqeta xwe ya herî dawî bi kar anî û hewl da ya tê xwestin bike, lê ji ber benê Fûat berdabû jêr li ber caxên qatê bû û ji hucreyê dûr bû, Xeyrî nikarîbû bigire. Gelek caran gomlekê xwe di nav caxên hesinî de derbas kir û hewl da ben ber bi xwe ve bikişîne, lê bi ser neket. Di dawiyê de Fûat ben kişand, bi bêaviya xwe ve ma. Bedrettîn Kavak, Fûat Çavgûn ên li qata 4. ji ber bêaviyê beriya her kesî rewşa wan giran bû û rakirin nexweşxaneyê. Roja me dest bi çalakiyê kir, Riza, Hamît, Karakûş, H. Hayrî, Şener û Keskîn kirin hucreya 1'ê ya qata 2'yemîn. Paşê jî bi bîdonan av bi ser wan de dakirin. Heval bi kincên şil heta sibehê ricifîn.

Wê demê li 36'ê 14-15 kes di rojiya mirinê de bûn. Ne sirûd, lê stranên şoreşgerî dihatin gotin. Mînak, strana "Ozgurluk Mahkûmlari/Mahkûmên Azadiyê". Piranî kesên dengê wan xweş stranên dihatin xwestin digotin. Tesadûfek bû ku di nav me de zêde kesên stranên Kurdî zanîbana tune bûn, bi giştî bi Tirkî dihat gotin. Dengê H. Hayrî xweş bû, hê zêdetir pê didan gotin. Car caran ji bo min pêşniyar dihat kirin. Eleqeyeke min a taybet ji bo stranên Rihayê hebûn. Stranên ku Xeyrî ji wan hez dikir hebûn. Herî zêde ji strana "Aglama yar aglama/Megirî yarê megirî" hez dikir.

Kemal jî pir ji stranên Riha hez dikir. Strana "Urfaliyim ezelden gonlum geçmez guzelden/Ez ji berê de Rihayî me dilê min dest ji yarê bernade" hez dikir. Dema kesekî dengê wî bi şewat didît pê dida gotin. Me jî strana ku tenê dizanîbû "Eşkiya dunyaya hukumdar olmaz/Eşqiya nabe hukumdarê cîhanê" pê da gotin. Dengê wî nexweş bû, lê me pê da gotin. Çend rêzikên straneke Kurdî jî dizanîbû. Car caran ew jî digot.

Îdareyê nikarîbû yekser asteng bike. Bersiva her tişta digot û dikir dihat dayîn. Hê zêdetir serî li rêbaza ku hin tiştan asteng bikin, tacîz bikin didan. Îdareyê bi awayekî dualî êrîş dikir. Yekemîn, dixwest di nav şertên fizîkî yên neyênî yên afirandiye de me zeîf bixe û bi lez hilweşîne. Ya duyemîn polîtîkaya tacîz û xemsariyê ye. Rojekê gardiyanê li ber derî dijûnan ji Fûat Kav re dibêje, jin û dê dan ser hev. Wê demê Kemal bi hêrs bang dike û dibêje; "Gardiyan, gardiyan!.. Êdî tu nikarî dijûnan ji me re bêjî, em azad in!" Berê xwe dan rêbazekî din ê psîkolojîk. Her car dihatin bi devkî êrîşî Kemal dikirin. Rojekê doktorê li 36'ê digere got; "Kemal tu xwarinê dixwî." Kemal pir hêrs bû û gotina, "Yê dixwe ez di jin û dayika wî" kir. Doktor li hember dijûna giran dengê xwe nekir û çû. Careke din dema doktor heman tişt got, Kemal got: "Ez niha çi bêjim, tê yeqîn nekî. Dema ez bimirim tê fêm bikî ku ew tiştên tu dibêjî ne rast in."

Navê doktor Orhan Ozcanli bû. Li ser navê îdareyê tenê ew li holê digeriya. Di nîqaşeke din a bi Kemal re got: "Tu nikarî di rojiya mirinê de bimirî." Kemal got; "Heta daxwazên me neyên

cih, kolordû bi me re li ser maseyê rûnene, guftûgoyê neke, ez weke Kemal Pîr dest ji çalakiyê bernadim. An ez ê bimirim an em ê bi ser bikevin."

Kemal tevî rêber bû gurûgeş, zindî û ji axaftinê hez dikir. Xeyrî pir kêm diaxivî, car caran mudaxeleyî axaftina Kemal dikir. Digot: "Kemal bi axaftina zêde xwe newestîne, tê zû bikevî." Kemal jî digot: "Doktor berde em hinekî biaxivin. Ev du sal in kilît li devê me dane. Beriya em bimirin têra xwe bi hevalan re biaxivin, em stranan bêjin, mîna em diçin dawetê, em biçin mirinê." Sempatîk bû jî. Hê zêdetir dihat pêre sohbet dikir. Di nav sohbetan de li ber hev didan. Dîsa rojekê, A. Osman, bi sedyeyê Kemal dibe îdareyê. Ji Kemal re dibêje: "Kemal dest ji rojiya mirinê bernede, eger tu dest jê berdî ez ê weke segan te mehf bikim!.." Kemal giran diaxive, dijûnan dibêje. Dibêje ku wê ji sedî sed çalakiyê bidomîne. Îdare bi propagandayên dijber ên di nav leşkeran de wan sor dike, ji wan re digotin ku tu mirovek nikare ew qasî birçî bimîne, ji sedî sed bi dizî xwarinê dixwin. Leşkeran jî yeqîn nedikirin ku mirovek 45-50 rojan bêyî xwarinê bixwe dikare bijî, ji propagandayan bandor dibûn. Car caran bi gotina, "Hûn xwarinê dixwin, hûn kê dixapînin!" heval tacîz dikirin. Rojekê di lêgerînê de -car caran lêgerîn dikirin, her tişt belav dikirin, kinc, pêşgîr, bardax û hwd. diavêtin derve. Kesên destpêkê tevlî çalakiyê bibûn dema eşyayên wiha bi xwe re biribûn dengê xwe dernexistibûn- di hucreya Akîf de qaşilê hêkê dibînin. Hêk beriya bi mehan avêtine wir. Dema gardiyan qaşil dibîne bi dengekî bilind dibêje; "Akîf Yilmaz bi dizî hêk xwariye, bila xebera we jê hebe!" Akîf jî dibêje; "Dema ez bimirim hûn ê fêm bikin, ez niha tiştekî ji we re nabêjim." Îdare ji bo lekeyê li çalakiyê bide, serî li hemû rê û rêbazan dida. Dema em çûn 36'ê, min hinekî jî hezn û xemgîniya ku bûm şahidê şert û mercên derveyî mirovatiyê jiya. Ew qirêjî, mişk, spî, pêşî, bêavî, bîdonên vala yên avê, rewşa korîdoran. Mirov pir bandor dike. Ava ku bi rojan di bîdonên naylon de dima êdî nema dihat vexwarin. Mişk li ser bîdonan, li derdora devikê wê digeriyan, heval neçar diman ji wê avê vexwin. Doşek jî nedabûn Xeyrî.

Tevahiya çalakiyê bêdoşek raza! Jixwe mirov nikarîbû ji tişta em li ser radizan bêjin doşek jî, lê ya Xeyrî ew jî nebû. (Doşek, bi salan ji aliyê kesên li hucreyê ji bin çavan dianîn dihatin bikaranîn, ji qirêjiyê reng guhertibûn. Hundirê wan tijî spî bûn. Bêhna mîzê ji wan dihat.) Tenê betaniyeyeke wî hebû qat dikir û li bin xwe dirêj dikir. Kesên tevlî rojiya mirinê bûne, kesên demên dirêj tevlî greva birçîbûnê bûne dizanin. Her roj beden dihele. Di rojên pêş de tu timî dirêjkirî yî, her cihê te di nav êş û birînan de ye. Hestî derdikevin derve. Eger livîn hişk be hê xerabtir e, her tişt di mirov de diçin. Tu li kîjan rexî razî raze tu rehet nakî. Heta rakirin nexweşxaneyê jî Xeyrî di vî halî de raza. Me ji devê wî gilî û gazinceke tenê jî nebihîst. Demeke dirêj ji hevalan re jî negotiye ku bêdoşek e. Ya rastî eger xwestiba wê îdareyê dabayê, lê ji ber rûmeta wî ranedikir ji dijminekî wer qirêj livînê bixwaze, daxwazeke wî ya wer çênebû. Bêguman mirov di rewşên wiha de êşên mezin dikişîne. Li gorî sêrê di grevên birçîbûnê yên demdirêj de sînîr li ser piyan e. Mirov di aliyê sînîr de pir hesas dibe. Tu dibînî ku şane şane tu diçî mirinê. Çûna te ya ber bi mirinê ve dema bi bêderfetiyên tu di nav de dibe yek êdî tiştek nayê tehemûlkirin. Rojên destpêkê ji bo em adepteyî hewaya 36'ê bibin me pir zehmetî kişand. Bi demê re em hînî awartebûna li wir bûn. Em hinekî fêrî wê hewaya bêhnpêketî bûn. Bi awayekî rêkûpêk cigare nedidan hevalan. Dema em ji 35'ê hatin nehiştin em çend paket cigare jî bi xwe re bînin. Ez bi gomlekê havînê yê li ser xwe hatim. Hemû ew qas bû.

Ji nexweşxaneya leşkerî jî doktor hatibûn, xwestine hevalan muayene bikin, lê li şûna wezîfeya mirovî yan jî hewcedariyên pîşeyî bînin cih, hê zêdetir li gor daxwazên îdareyê tevgeriyane. Ji bo şikandina çalakiyê telkîn kirine. Eger ji bo bicihanîna wezîfeya xwe hatibana, yekemîn karê ku kiribana ew bû ku mudaxeleyî şert û mercên derveyî mirovatiyê yên li 36'ê bikin. Qet guh nedane wan şert û mercan. Ev "ziyaret" ji bilî bicihanîna formalîteyan ne tiştekî din bû. Li tansiyona hevalan nihêrîne. Destpêkê heval fikirîne ku kontrola tansiyonê ne pêwîst e, lê

paşê qebûl kirine. Doktor di “telkîn”an de bi devê îdareyê diaxivin. Piştî em çûn wir, Dr. Orhan Ozcanli hat, bi Kemal re hema tiştên dihat zanîn axivî. Kemal jî jêre got; “Dest ji xwarinê berde, cigare nayê dayîn. Em dixwazin cigareyê bikişînin.”

Destpêkê dema hevalan cigare dikişand, îdareyê dengê xwe dernexistiye, heta destûr dane ku mîqdarekî bikirin jî. Lê dema qediyaye ji nû ve rojên bêcigare dest pê kirine. Doktor, li ser daxwaza Kemal berê xwe dide leşker û jêre dibêje; “Heke bixwazin cigareyê bikişînin bidin wan. Jixwe dimirin, wê mirina wan bi lez bike. Jehr e, bidin wan bila bikişînin.”

Car caran doktor dihat, tacîz dikir. Behsa tehlûkeyên rojiya mirinê dikir, hewl dida rewşa madî û manewî ya hevalan fêr bibe, diçû ji îdareyê re, ji serqesaban re dikir rapor. “Pêşniyar” dikir. Rojekê ji Kemal re got: “Were dest ji vê rojiya mirinê berde, ez ê kebap û pîrzola îkramî te bikim.” Li hemberî vê nêzîkatiya ne cidî Kemal pir aciz bû û bi gotina: “Tu çi dibêjî, ma tu me zarok dihesibînî? Em tevlî çalakiyeke ku qedera welatekî diyar bike bûne, tu behsa kebapê dikî!” bi ser de hêrs bû.

Beriya em biçin 36’ê îdare dibêje: “Çima hûn ketine rojiya mirinê, xwestekên xwe bi daxwaznameyekê binivîsînin.” Wê navberê Kemal pêşniyar dike ku Xeyrî li ser navê her kesî daxwaznameyeke hevpar binivîsîne, guncaw tê dîtin. Xeyrî dinivîsîne û bi awayekî ku her kes bibihîze dixwîne. Kemal dibêje, “Doktor te giranî daye mijara parastinê, divê tu destnîşan bikî pêkanîn û zext bên rakirin, yek jî divê em wekî xwe bên qebûlkirin.” Dema hevalên din jî tevlî Kemal dibin, Xeyrî li ser nêrînan daxwaznameyê ji nû ve amade dike û dide îdareyê.

Têkildarî çalakiya 14’ê Tîrmehê ya armanc dikir ku kîjan pirsgirêka bingehîn çareser bike, lîsteyeke wer dirêj a xwestekên zêde û bi detay tune bûn. Di şert û mercên wan rojan de em li ser çend pirsgirêk û xwestekên esasî yên hewce bûn tavilê û ji sedî sed hatibana çareserkirin diponijîn. Jixwe ne ku îdare û kolordûyê nizanîbû bê daxwazên me çi ne. Xeyrî dema li dadgehê çalakî aşkera kir bal kişandibû ser parastinê, îtîrafan, hovîtî û zextan. Van çarçoveya daxwazên me diyar dikir. Xeyrî di

daxwaznameyê de van bi rêz dike: Pêwîst e îşkence bê bidawîkirin, mafê parastinê bê naskirin, pêdiviyên xwezayî wek hêmanên zext û îşkenceyê neyên bikaranîn, hevdîtinên bi parêzer û malbatan re bên normalkirin. Di rojên pêş ên çalakiyê de -herhal hema piştî çûna me ya 36'ê ye- îdareyê Kemal, Xeyrî, Fûat Kav û Alî cuda cuda biriye revîrê. Rayedar ji wan pirs dikin bê çima tevlî çalakiyê bûne. Ew jî behsa zextan, tiştên rû didin û daxwazan dikin. Carekê jêre gotine, "Eger hûn dixwazin bi ziyaretvanên xwe re hevdîtinê bikin daxwaznameyê binivîsînin." Kemal di daxwaznameya xwe de dibêje: "Ez dixwazim bi ziyaretvanên xwe re hevdîtinê pêk bînim. Lê ez di îdareyê de cesareta me bîne cem hev nabînim." Bêguman hevdîtin nedan çêkirin.

************

Roj derbas dibin. Tenduristiya hevalan xera bû. Beden ku zindîbûna xwe winda dikir, bandora xwe li ser deng jî dikir. Deng lewaz bibûn. Êdî em di rojên pêncî, yên çalakiyê de bûn. Kemal çavên xwe winda kirin, êdî nedidît. Lê nexwest bi îdareyê bide hîskirin. Ya rastî ew demek bû her diçû melekeya dîtinê kêm dibû. Bi fikra eger bêje ku nabîne mimkun e heval bandor bibin veşart. Gumana wî ew bû ku eger haya îdareyê jê çêbibe wê bibin nexweşxaneyê û ji hevalên xwe qut bibe. Lê piştî çavên xwe bi temamî winda kir, pêwîst dît ku agahiyê bide me. Bi dengekî nizm got: "Hevalno, çavên min nabînin." Ji bo îdare nebihîze û fêm neke bi çend peyvên tek-tûk ên bi Kurdî dizanîbû agahî da me. Rewşa Kemal ji bo me çavkaniyeke cuda ya êşê bû. Carinan ji bo cigareyê pê bixe bi deqeyan mijûl dibû. Ji ber nedidît û bêtaqetiyê darikên kîbrîtê yên pêdixist nikarîbû bibe ber cigareya xwe. Di her hewldana neserketî de bi gotina, "Ax! Ax!" ku li ber diket, giranî û xemgîniya em dibûn şahidê wê di dilê me de rûnişt. Carekê bi şeş darikên kibrîtekê cigare tenê ji nivê wê pêxist. Kemal di rojên dawî yên bêtaqet ma jî tevger û gurûgeşbûna xwe tevî her tiştî parast, tiştên di hucreya

xwe de dikir ji me re digot. Mînak digot: “Hevalno ez niha radibim ser piyan, min bi destekî xwe daye dîwar, ez diçim tuvaletê, ez li bardaxa xwe digerim, vaye min dît. Aha ji destê min ket û hwd.” Di rojên dawî de bû, dema xwe dirêjî tasa li ser bîdonê ya li derve kir, tas xist. Tas zîvirî û çû, nikarîbû bigire. Gardiyanan jî neda. Heta birin nexweşxaneyê 3-4 rojan av venexwar. Rojeke din jî dema li kibrîta xwe digeriya ji sedîrê ket erdê, tevahiya rojê wer ma. Gardiyan, êvarê ew rakirin danîn ser sedîrê. Di wê pêvajoyê de rojekê Alî Çîçek bang kir û got; “Kekê Kemal, êdî çavên te nabînin, saeta xwe ji min re bişîne.” Bêdengiyekê xwe da ser qawîşê. Van gotinên Alî bi me da hîskirin ku mirina ji me dûr disekine nêzî me ye. Mîna em ji ser hişê çûbûn. Lê rastî ew bû. Kemal bi dengê xwe yê timî şên got; “Bila li cem min be, eger ez bimirim wê ji xwarziyên min re bibe bîranîn.” Alî jî israr nekir. Kemal, tehemûl nekir û got: “Alî ez saeta xwe ji te re dişînim, eger ez bimirim bila bidin xwarziyên min.”

Doktor hatibû. Cigareyek da Kemal û êgir dirêj kir, dema Kemal destê xwe bir devereke cuda doktor rewş fêm kir. Doktor got: “Kemal çavên te nabîne.” Wî jî got: “Na, ez dibînim.” Doktor ji bo yeqîn bike çar tiliyên xwe rakir û got ku ew çend in. Kemal got, “Yek.” Rewş ji îdareyê re hat ragihandin. Dema hat fêmkirin ku roj û saetên wî yên dawî nêz dibin, ji bo bibin nexweşxaneyê hatin birin. Dema ew ji hucreyê derxistin got, “Xeyrî! Hevalno! Min dibin, bila agahiya we jê hebe!” Nedixwest biçe. Got: “Ez dixwazim li vir li cem hevalên xwe bimirim, min berdin.” Lê birin. (Kemal berê gotibû: “Hevalno, dema em birin nexweşxaneyê, eger bi zorê serûmê bidin me em şûşeyan bişkînin. Eger careke din bidin min ez ê giliyê doktoran bikim. Her wiha kê ji me bibin, em bang bikin û bêjin, hevalno min dibin. Em agahiyê bidin hev.” Yê destpêkê bang kir ew bû.) 6’ê Îlona 1982’yan bû. 10’ê mehê hatin Xeyrî birin, 11’ê mehê Akîf û hevalên din ên rewşa wan giran birin. Kemal piştî rakirin nexweşxaneyê bi rojekê, 7’ê Îlonê, Xeyrî saetên destpêkê yên 13’ê Îlonê, Akîf 15’ê Îlonê, Alî 17’ê Îlonê şehîd ketin.

Bunyeya Xeyrî ji berê de zeîf bû, lê hê baş bû. Hema hemû organên wî dixebitîn. Hevalên din jî bi heman rengî. Ji ber av derneket qata 4’emîn, hê zêdetir bêav man Kemal zûtir ket.

## Xeyrî di Hucreya Mirinê de ye

Heval Xeyrî nêrînên xwe, pêşniyarên xwe yên têkildarî rêxistinbûnê nivîsandibû û ji Karasû re ragihandibû. Em mijarên wiha hê zêdetir bi Xeyrî re diaxivîn. Kemal got; "Xeyrî, tu ji hevalan re bêje, bê wê çi bikin." Xeyrî neket nav nêzîkatiyeke mîna, piştî me rêxistinê wiha ava bikin, di berpirsyartiya vî hevalî de bixebitin. Her wiha hê nedihat zanîn bê wê kî bimire jî. Me kêm zêde dizanîbû nêrîna Xeyriyan a têkildarî kadroyên mirov dikare wezîfedar bike. Di me de feraseta rêbertî hinekî cuda ye. Ji kadroyan wê kî wezîfeyê hilgire bi esasî mijara têkoşîn û pratîkê ye. Kadroyên me di nav pratîkê de pêş dikevin û xwe didin qebûlkirin. Em zêde nedifikirîn ku wê di xeleka rêbertî de zêde valatî jî çêbibe. Tu carî gumaneke me ya wiha çênebû. Bi qasî wan ne kamil û gihîştî bin jî têra xwe hevalên me yên ew berpirsyartî hilgirtibana hebûn. Bi giştî ew tişt digot: "Dema me dest bi çalakiyê kir, bi rastiya em ê bimirin ketin rê. Feraseteke me ya weke wê lihevkirinek çêbibe û em ê sax xelas bibin qet çênebû. Me dizanîbû wê pêvajo pir dijwar derbas bibe. Ez niha jî wer difikirim. Wê windahiyên me zêde çêbibin. Dema ez li menzereya giştî, helwesta dijmin dinihêrim, dibînim ku wer bi mirina 4-5 kesan wê nexwazin rewşê bi dawî bikin. Lê ev jî misoger e dijmin jî piştî nuqteyekê wê neçar bimîne bisekine. Nikarin zêdetir bibin, nikarin ev qas mirî rakin. Wê li derve deng vede, wê bala mirovan bikişîne ser vê dojehê!" Nêrîna me jî ew bû ku wê pêvajo hê girantir derbas bibe, herî kêm piştî kesên herî dawî tevlî çalakiyê bûne bimirin, dibe ku dijmin bê rawestandin. Me digot: "Eger çalakî berdewamî be wê bi komên sêyemîn û çaremîn re ji bo guftûgoyan rûnin." Jixwe Girtîgeha Leşkerî ya Amedê taybetiya xwe ya bûyîna qutiya girtî hê didomand. Raya giştî ya cîhanê tiştên rû didan nizanîbû. Bi qasî têr dikir cûnta nehatibû teşhîrkirin, di tevlîbûna çalakiyê de girsebûyîn jî nehatibû pêşxistin. Yek ji mijara Xeyrî pêre mijûl dibû jî li girtîgehê pêşeroja hebûna partiya me bû. Digot: "Ev qas di hucreyan de hatine bicihkirin, wê ev çawa bibin? Min pir

dide fikirandin.” Dîsa carekê got: “Qet nebe kesên di hucreyê de hatibana rizgarkirin, mafê axaftinê hatiba bidestxistin, mesele hatiba çareserkirin, tenê li ser vî esasî jî mirov dikare lihevkirinê bike.” Xeyrî, wer difikirî ku bi rizgarkirina pêkhateya milîtan, wê pêşeroja girtîgehê jî bê rizgarkirin. Me li hember nêzîkatiya wî ya têkildarî parastina siyasî got: “Qebûl nakin, eger ji bo hucreyan qebûl bikin, wê mecbûr bibin ji bo giştî girtîgehê jî qebûl bikin.” Xeyrî di rojên pêş de jî fikir û nêrînên xwe yên giştî aşkera dikir. Jixwe di eniya îdareyê de tiştekî zelal tune bû. Di pêşketina pêvajoyê de gelek feydeya wan nîqaş û nêrînan ji bo me çêbûn, hişê me vekir.

Piştî Akîfan Karasû birin nexweşxaneyê. Rewşa wî jî cidî bû. Dema hevsengiya ruhî ya Hamît Kankiliç hejiya ew jî girtin û birin. Piştî Karasû yek bi yek em derxistin revîrê. Dema em çûn revîrê, sertabîbê girtîgehê jî di nav de em bi komek doktor re rûbirû hatin. Em muayene kirin. Ez, Şener, H. Hayrî, yek-du hevalên din li revîrê desteserkirin. Sertabîb got; “Hûn çi dixwazin? Daxwazên xwe ji min re ragihînin, ez ê bibim kolordûyê.” Wisa xuya dikir ku kolordûyê ew weke amûr wezîfedar kiribû. Dema sertabîb got, li ser navê kolordûyê hatiye, em fikirîn ku rewş cidî ye, hevalan jiyana xwe ji dest daye, me destpêkê rewşa kesên rakirine nexweşxaneyê pirsî û me got: “Kesên mirî hene?” Nexwestin bêjin. Lê ji axaftina neyekser a sertabîb me fêm kir ku Kemal jiyana xwe ji dest daye. Sertabîb got: “Ez ê daxwazên we bixim zerfekê, li cem we devê wê bigirim, bêyî bi kesî bidim xwendin yekser radestî kolordûyê bikim.” Li ser vê yekê min çar xwestekên esasî yên min berê behsa wan kiribû nivîsand. Sertabîb wergirt kir hundirê zerfê û devê wê girt. Li ber çûnê got: “Di vê navberê de em hevalên we yên li nexweşxaneyê dibînin. Di serî de Mûstafa Karasû. Rewşa wî pir giran e. Ew jî bêyî bi we re hevdîtinê pêk bînin naxwazin dest ji rojiya mirinê berdin. Me serûm dayê, qebûl kir. Heta bi we re hevdîtinê pêk bîne em hewl didin zindî bigirin. Îro Şemî ye, em karibin roja Duşemê hûn ê wî bibînin. Înşaallah heta wê rojê tiştek neyê serê wî.” Ji me re jî got: “Hûn jî navberekê ava bi

şekir vexwin, bila tenduristiya we, bedena we texrîb nebe.” Me red kir. Ez ne şaş bim ev hevdîtin roja 24-25’emîn a em tevlî çalakiyê bibûn pêk hat. Di nav koma ji nexweşxaneyê hat psîkologek jî hebû. Ez girtim birim odeya rexê. Dest bi axaftinê kir, got: “Hûn çi dikin? Hûn vala vala diçin mirinê. Dibe ku rojname bi yek-du hevokan behsa we bikin, hûn ê paşê bên jibîrkirin. Dengê we, peyama hûn dixwazin bidin wê negihêje kesekî. Eger pirsgirêkên we hebin, hewl bidin wan beriya hûn bimirin çareser bikin. Her wiha divê bê zanîn ku ne mimkun e mirov her pirsgirêkê çareser bike. Divê mirov hin rêzik, rêvebernameyan qebûl bike. Tiştên hûn îro derdixin pêş pirsgirêk in? Pêvajoyeke leşkerî ye, divê mirov li gor disîplîn û rêzikan tevbigere.” Zilam hewl dida têkildarî mijara em ê vala û neheq bimirin me îqna bike! Hinekî bi hêrs min got: “Ez nizanim çima hiştine hûn bi me re guftûgoyê bikin. Lê rastî ev e ku em di aliyê derûnî de pir bi tenduristî ne. Weke ew an jî hûn difikirin tu nexweşiyeke me ya ruhî nîn e. Kesên pirsgirêkên wan ên ruhî hene ew in. Çalakiya me ya rojiya mirinê, yek ji çalakiyên herî mafdar ên di dîrokê de rû dane û hatine dîtin. Ji bo me bê jiyan çi qasî pîroz e hûn nizanin. Kêfxweşiya me ya jiyanê mezin e, em pir ji jiyanê hez dikin, em dixwazin bidomînin. Lê eger di bin îşkence û hovîtiyê de, em mecbûr bimînin jiyaneke her roj bi sedan carî mirov dimire bidomînin, wê demê wê çi maneya jiyanê bimîne? Mirineke bi rûmet hezar carî li şûna jiyaneke wiha tê tercîhkirin.” Paşê jî min qirêjiya karê dike nîşan da, min got: “Wek mirovekî û hekîmekî di zemîneke ku îşkence û hovîtî didome, li şûna hûn piştgiriyê bidin mirovên rûmetê temsîl dikin, reşkirina mafdariya têkoşînê, tê maneya alîgirtina îşkenceyê. Eger hûn dixwazin em dest jê berdin û dibêjin, ‘Ev çalakî ne mafdar e’, wê demê wê li cîhanê ya mafdar çi be? Bi vî awayî gotina we li gor min nemirovbûn e. Eger hûn dixwazin em di mijarên cuda de biaxivin û nîqaş bikin, fermo werin rûnin em biaxivin. Aqil, hiş û mejiyê me jî di cihê xwe de ye. Me xwe winda nekiriye. Lê eger hûn wer bihizirin ku pirsgirêkên me yên derûnî hene, wê demê tiştekî ez bi te re biaxivim tune ye.”

Jixwe zilam piştî tiştên min guhdar kir, qet neaxivî. Got: “Temam, hûn dikarin derkevin.” Ez ji odeyê derketim, paşê jî H. Hayrî derbasî hundir kirin. Bi wî re bi kurtasî axivî. Bang li hevalên din kir. Dema em birin revîrê ustegmen pehîn li me da. Jixwe em bi zor û zehmet dimeşin, dixwest em hê bi leztir bimeşin. Dema dît em nameşin, bi kîna xwe ya tijî bûye em dan ber pehînan. Em li ser derenceyê bûn. Eger me xwe bi hin cihan ve negirtiba em ê bi pehînekê gêr bibina, dibe ku hin deverên me şikestibana. Em ji qata 3’yemîn dadikevin qata 1’emîn. Di wê navberê de min jî çend pehîn xwarin. Dema doktoran muayene kir şopên derbê dîtin. Sertabîb bi israr got: “Li te xistin?” Te digot qey tiştekî nayê zanîn, di wê dojehê de ma gotina çend pehînan heye? Mirov li ber çavan dimirin. Min jî got: “Na.” Paşê dîsa em birin hucreyên me. Heta roja Sêşemê em li 36’ê man. Me sohbetên xwe, ew hewaya germ a hevalan dewrî me kirin û çûn dewam kir.

Tiştên sertabîb têkildarî Karasû digot rast bûn. Rewşa wî pir giran bû. Piştî Xeyriyan çûbû. Li wir dibihîze ku Kemal û Xeyrî şehîd ketine. Wî li cem Akîf radizînin. Ew dibêje ku her du heval şehîd ketine. Akîf bûye şahidê kêliyên dawî yên Xeyrî. Dema canê xwe ji dest dide dîtiye. Bi qasî nîv saetê dinale û paşê jiyana xwe ji dest dide. Dema tê fêmkirin ku şehîd ketiye, tên dibin. Xeyrî beriya şehîd bikeve ji Akîf re têkildarî çalakiyê fikra xwe wiha tîne ziman, dibêje: “Dema em mirin, eger hin tawîzan bidin, dest ji çalakiyê berdin, bila hemû heval nemirin.” Me Xeyrî di roja 61’ê de winda kir. Akîf jî rojên xwe yên dawî dijî. Dema Akîf dibin nexweşxaneyê ew birine odeya ku girtiyên nexweş têde dimînin. Li odeyê kesekî ji Partîzan jî heye. Li gor vegotina wî; “Gardiyanek bardaxek xoşav datîne ser maseya Akîf. Ji ber heval êdî melekeya xwe ya dîtinê winda kiriye, dibêje qey av e û vedixwe. Dema fêm dike ne av e bi aciziyeke mezin bardaxê diavêje erdê û wiha bang dike: “Van tiştan nedin me.” Piştî demeke kurt Akîf ji odeyê derdixin diavêjin hucreya mirinê. Mirovên seg wan gez dikin, har dibin û li ber mirinê diavêjin vê odeyê. Her cih di nav qirêjiyê de ye. Heval li ser

livînên tijî şopên xwînê û bêhna mîzê ji wan tê dirêj kirine. Di vê odeyê de Karasû, dibe şahidê şehadeta Akîf û Alî. Akîf di kêliyên xwe yên dawî de êdî nikare biaxive. Hucreya mirinê di bin dagirkeriya mêşan de ye. Mêş êrîşî ser wan dikin. Karasû ji ber hinekî taqeta wî heye kêm be jî dikare xwe biparêze. Lê Akîf xwe teslîmî mêşan dike! Bi sedan dikevin çav û guhên wî.

Karasû muzakereyan pêk tîne. Dema kesên pêwendîdar roja Şemiyê ji bo guftûgoyan tên, her çar heval jî şehîd ketine. Karasû di hucreya mirinê de bi tena xwe ye. Di koma tê guftûgoyan midûrê girtîgehê, sertabîb, serokê kurmay ê kolordû û çend serbaz in. Kesên diaxivin sertabîb û Bîrol Şen e. Dibêjin, wê şert û mercên li girtîgehê bên rastkirin, dest ji çalakiyê berdin, eger bibînin ku soz nehatine cih, dikarin careke din dest bi çalakiyê bikin. Karasû dibêje; "Heta ez bi hevalan re hevdîtinê nekim, nikarim biryarê bidim." Ew jî dibêjin; "Îro Şemî ye, dawiya hefteyê ye, niha fermandar nîn e, her kes di betlaneyê de ye. Roja Duşemê yan jî Sêşemê em ê hevalê te bînin. Vê navberê bila serûmê li te bidin." Karasû dibêje; "Nabe, ji sedî sed wan bînin, eger neyên ez nikarim tiştekî bêjim." Ji doktoran Seydî Paksut jî di nav koma guftûgoyan de ye. Paksut dibêje: "Ji bo der heqê rewşa we ya tenduristiyê de agahiyan digirin ji kolordûyê bang li min kirine. Fermandarê kolordûyê û rayedarên din gotin ku pêwîst e li girtîgehê ber bi sererastkirinan biçin. Wê her tişt bê rastkirin. Rewşa te xerab e. Tenê heta Duşem û Sêşemê tê sax bimînî." Karasû dîsa red dike.

Koma guftûgoyan pir israr dike. Dibêjin, "Eger tu tiştekî negirî nabe. Em ê neçin. Heta hevalên te yên tu bi wan re biaxivî werin divê tu bijî. Rewşa te krîtîk e, qet nebe em serûmekê li te bidin. Ji dev jî bardaxeke şîr an jî xoşavê vexwe." Heval jî herî dawî qebûl dike ku serûmekê lê bidin. Roja Duşemê dema malbata wî jî tê, jêre dibêjin, "Em ê te bi sedyeyê bibin, tê bihejî" û bi israr bardaxek şîr didinê. Heta bi me re axivî mudaxeleya bi sînor a Karasû qebûl kiriye ev e; şûşeyeke serûm, bardaxek şîr.

Sertabîb Yarbay Îbrahîm Tûran; dibêje wê êdî parastina siyasî serbest be, wê li girtîgehê derfetên wê bên afirandin, wê rojname û pirtûkên ne qedexe bên girtîgehê, wê li kesekî nexin, bi qasî pêwîst dike wê xwarin bê çêkirin, wê hevdîtinên bi parêzer û malbatan re bên sererastkirin û hwd. tiştan tîne zimên. Li hember wê ji me dixwaze em hefteyê 3 rojan "perwerde"yê bikin, li gor ferman-fermandarî tevbigerin. Karasû, encama çalakiya 1981'ê bi bîr dixe û dibêje, "Hûn êdî nikarin me bixapînin." Sertabîb dibêje wê şopdarê sozên hatine dayîn be. Hatina wan a girtîgehê û axaftina bi me re piştî vê hevdîtinê bû.

Akîf beriya şehîd bikeve saeta xwe ya destan dide Karasû û dixwaze bişîne ji malbata wî re. Di kêliyên dawî yên Akîf de kef ji devê wî derketiye, li ser rûyê tijî mêş bûne. Dema hatiye fêmkirin ku şehîd ketiye gardiyan agahiyê dide doktor. Piştî demekê doktor bi dosyaya di destê xwe de tê. Nebza Akîf digire, dilê wî guhdar dike, dema diyar dike ku şehîd ketiye mirina wî derbasî girtekê dike.

Kesên di Rojiya Mirinê de şehîd dikevin jî derbasî girtekan dikin. Tu sedemeke ku hinceteke din jî binivîsînin nîn e. Aliyekî wê ye bê veşartin jî nemaye, her wiha çalakî dewam dike, derdoreke berfireh bihîstiye. (Li Amedê sedema mirina kesên di rojiya mirinê de mirin, xwe şewitandin nehat berevajîkirin, ya rastî derbasî girtekan hat kirin.) Paşê jî cenazeyê Akîf datînin ser sedyeyê û dibin. Karasû li hucreya mirinê bi tena xwe rojeke din jî derbas dike. Roja dîtir Alî Çîçek tînin datînin ser livînê ji Akîf vala bûye. Êdî Alî jî li ber mirinê ye. Hişê xwe winda kiriye. Xwestine serûmê lê bidin, lê nikarin. Tevî bedena wî serûmê qebûl nake, rehekî ku derziya serûmê lê bidin nedîtine. Doktor ji Karasû re dibêjin ku Alî miriyekî sax e. Alî di kêliyên xwe yên dawî de tenê dikare milên xwe bihejîne. Weke di yên din de bedena wî xwe bi xwe xwariye, her cihê wî reş û şîn û xera bûye. Doktor ji bo serûmê lê bixe ji lingê wî rehekî qut dike û dixwaze ji wir bidiyê. Alî nikare mudaxele bike û bedena wî di bin dagirkeriya mêşan de ye. Zêde naçe jî jiyana xwe ji dest dide. Dema tê fêmkirin ku jiyana xwe ji dest daye li ser sedyeyê

dibin. Girteka mirina wî li cihekî tê amadekirin. Karasû wê şevê li hucreya mirinê bi tena xwe derbas dike

************

Em hemû birin nexweşxaneyê. Karasû ji bo hevdîtinê navê Şener daye. Roja em çûn, birin cem Karasû. Karasû, di guftûgoyan de daxwazên ku kolordûyê qebûl kirine û tiştên ji wan dixwazin radigihîne. Diyar dike ku sertabîb û midûrê girtîgehê ji bo bicihanîna peymanê soza "leşkerî, şeref, namûsê" dane. Paşê jî dibêje: "Biçe van ji hevalên din re ragihîne, biaxivin, bigihêjin encamekê û ji min re ragihînin." Her wiha vê jî bi ser axaftina xwe ve zêde dike: "Ji bo ez bi we re hevdîtinê bikim, min wergirtina serûmê qebûl kir. Bila agahiya we jê hebe." Dema Karasû û Şener diaxivin ekîba guftûgoyan jî li cem wan e, Şener beriya me anîne, diçe cem Fûat Kav û hevalên din pêşketinan ji wan re radigihîne, nêrîna wan digire. Paşê jî hat cem me, em axivîn. Em gihiştin encama ku dikarin çalakiyê bi dawî bikin. Şener nêrîna me ji Karasû re ragihand. Ew jî dibêje mirov dikare dest jê berde.

Dema Şener diçe nêrîna hevalan digire dibîne ku hinekan dest ji çalakiyê berdane. Yên li ber qeraxa mirinê lê çalakî domandin Karasû û Fûat Kav bûn. Şener nêrîna kesên dest ji çalakiyê berdane jî digire. Ew jî dibêjin, "Hûn dizanin, çawa guncaw be wer bikin."

************

Vê carê em ne di rewşa mîna ya piştî çalakiya Mazlûm de bûn. Em bi wan re bi ser ketibûn, em bi coş bûn. Hevalên me ku ji dil çûn ser mirineke wer zehmet, ji bo îdealên xwe mirin kirin netiştek, bi şêwazê xwe yê herî bi heybet bi ser ketin, me serbilindî û temaşekirina rûmeta wê jiya. Her çi qasî hezna me mezin jî bû, moralê me bi heybet bû. Lê windakirina wan, hesta valatiya di hundirê me de afirand jî mezin bû. Mîna ne çûbûn mirinê,

çûbûn cejnê. Bi rehetî û hizûra bûyîna zilamê dozê mirin hembêz kirin. Di sohbetên me yên 36'ê de Kemal maneya li jiyanê bar dikir wiha destnîşan dikir: "Em pir ji jiyanê hez dikin. Em ev qasî hez dikin ku bi qasî di oxira wê de zanibin bimirin." Di rojên pêncî yên çalakiyê de cigareyek danê. Pêxist, piştî çend nefes kişand got, "Ox. Min di tevahiya jiyana xwe de ji cigareyê ev qasî tehm nestendibû." Ya rastî di wan rojên pêş de mirov zêde tehmê ji cigareyê nagire. Di wan gotinên wî de maneyeke kûr a tehm û zewqa jiyanê hebû. Manedayîna her tişta hêmana jiyanê ye, ew bi zanebûn û xwestek jiyîn, mirov jiyanê di asta herî jor û bi awayekî herî serwextbûyî de têbigihêje, ji her kêlî û saniyeya wê tehm û zewqê bigire dianî zimên. Di teslîmiyetê de jiyan ne ya me bû. Di berxwedanê de maneya xwe dîtibû. Ev diyarkirinek bû. Diyarkirineke ku pêwîst e bê jiyîn û encamên wê bên dîtin. Me ew jiyabû û encamên wê dîtibû. Dijmin nikarîbû pêşketina me rawestîne û hatibû rê. Jiyîna vê hestê ruhê mirov têr dikir. Hevrêyên me nîşan dabûn ku mirov dikare ji bo afirandina jiyaneke bedew bi kêfxweşî biçe mirinê. Dirûşmên, "Berxwedan jiyan e!", "Em di mirinan de ji nû ve çêdibin!" Di me de maneya xwe ya pratîk wer dîtibû. Bi berxwedaneke bi heybet, bi can û xwîn hundirê van têgînan hatibû dagirtin. Piştî Rojiya Mirinê ya Mezin li pêşiya me deriyê pêvajo û jiyaneke nû vebibû.

************

Yek ji serketina herî mezin a Rojiya Mirinê ya Mezin jî ev bû ku Esat Oktay girt û avêt. Sertabîb di axaftinên xwe yên bi me re timî digot, "Êdî Esat Oktay nîn e. Ew ji wezîfeyê wergirtin." Me zêde îhtîmal nedida û me yeqîn nedikir. Lê rast bû. Ya rastî wergirtina wî ya ji girtîgehê ne ecêb bû. Zilmê derbeyeke xeternak û xedar xwaribû. Wê "xweda"yê wê jî girtiba. Şîdeta ku yekane zimanê Esat Oktay bû êdî kar nedikir. Her çi qasî bi temamî mirin nehat hilweşandin jî, ev ne dûr bû. Me şert û mercên ku ew mîna berê wezîfeya xwe bidomîne ji holê raki-

ribû. Kolordûyê ji bo ocaxa zilmê ya êdî nayê veşartin, aşkera bûye ji nû ve bixe meriyetê, kêm be jî bertekan nerm bike, bala li ser belav bike serzebaniyê dojehê wergirt û mîna berpirsyar hemû ew in ku nîşan dide, hê aqilane dîtibû. Mirovekî ev qasî deşîfre bûye, destê wî ketiye xwîna ew qas mirovan, bûye sembola zilmê ku li ser wezîfeya xwe bimîne wê zêde ne bi feyde bûya.

Ew qasî ku bûye hedefa aşkera û wezîfeya xwe dewam kiriba, pirsgirêka ewlehiya canê wî jî bi xwe re dianî. Hevalên ku di rojên çalakiyê de diçûn rûniştinan tiştên li girtîgehê rû didan deşîfre dikirin. Hewl dane berpirsyaran û pirsgirêkan derbasî girtekan bikin. Bi taybet rojiya mirinê hatiye destnîşankirin, hatiye gotin ku wê berpirsyar îşkencekar bin. Bi vê kanalê re pêşketin ji raya giştî re hatiye ragihandin. Rojiya mirinê ya bi biryar dewam kiriye, di nav girseya me de hê zêdetir deng vedaye, di aliyê tevlîbûnê de gav dihatin avêtin. Dema em li nexweşxaneyê bûn Mûstafa Çepîk anîn. Beriya 8 rojan dest bi çalakiyê kiriye neanîne 26’ê, ji me cuda girtine. Kolordûyê dema dîtiye wê tevlîbûn bidomin bêyî çalakî zêde dirêj bike xwestiye bi dawî bike. Zêdebûna mirinan wê pêvajo ji bo wan anîba rewşeke ku mirov nikare ji nav derkeve. Her wiha bi esasî jî armanc kirine hevalên rêber tune bikin. Bêavhiştin, di nav şert û mercên derveyî mirovatiyê de ku dihiştin hemû ji bo îmhaya fizîkî ya hevalên rêber bû. Di vê nuqteyê de gihiştibûn armanca xwe. Piştî ew mirin, dîtin wê mirin û çalakî bidomin, wê li derve û di nav raya giştî ya cîhanê de hê zêdetir deng vede, bala mirovan bê ser Girtîgeha Leşkerî ya Amedê. Ji bo astengkirina wê jî ji nuqteyekê û şûn ve -jixwe ev nuqte ji bo wan tunekirina hevalên rêber bû- ji bo rojiya mirinê rawestînin ketin nav tevgerê. Ji axaftina ziyaretvanan me kêm-zêde dengvedan û encamên li derve yên çalakiyê fêm dikir.

Belê, her ku çalakî pêş diket û mirin nêz dibûn kolordû ji bo li hember me weke çekekê bi kar bîne ziyaretvan dianîn nexweşxaneyê. Dixwestin ji dilsozî hezkirina malbatên me ya li hember me feyde bigirin. Malbatên pê dihesiyan ku zarokên

wan li nexweşxaneyê ne, haya wan ji rewşa tenduristiya wan nîn e li gor bendewariya kolordûyê dihatin ber deriyê nexweşxaneyê. Ji bo me bibînin pir bi xwestek bûn. Kolordûyê ji malbatan re dij-propaganda dikir ku wê şert û mercên girtîgehê sererast bibin, bi berxwedanê wê tiştek neyê guhertin û em ê vala vala bimirin. Ji malbatan re digotin: “Ji zarokên xwe re bêjin bila dest ji çalakiyê berdin” û ew dişandin cem me. Malbatan bi xwesteka xwe û hinekî jî bi tesîra propagandayê re telkîn li me dikirin. Serê xwe datanîn ser singa me, li ber me digeriyan, digiriyan. Bi vî awayî dest pê dikirin ku em dest ji çalakiyê berdin. Fêmkirin û têgihiştina wan a mafdariya meşa me ya ber bi mirinê ve pirsgirêkeke serwextbûnê bû. Heta ew serwextbûn çênebûba bêguman wê xwestibana em dest jê berdin. Bi xwezayî dema ev dixwestin, jî ne di wê zanebûnê de bûn ku ev xwestek piranî li gor berjewendiyên îdareyê ye. Ji bo wan wê kêliyê ya girîng ew bû ku em sax bin. Ne besît e, zarokên wan ên pir ji wan hez dikin li ber çavên wan dihelin, roj bi roj diçin mirinê. Di bin wî barê giran de dipelçiqin, diqehirin. Min behs kiribû, bavê min ê min qet nedîtibû ku giriyaye bi rondikên xwe yên mîna baranê weke lehiya hezkirinê hat serê xwe danî ser min. Dayika Karakûş jî bi gotina, “Dest ji çalakiyê berdin, xwe nekujin” giriyabû. Hemû çalakvan bi dîmenên heman rengî re rûbirû man. Malbata Karasû ji Stenbolê wergirtine û anîne. Fermandariya Rêveberiya Awarte ya Stenbolê wesayîtek leşkerî dişîne mala wan. Dibêjin, “Kurê we miriye, biçin cenazeyê wî bînin.” Xizmên wan ên li Edeneyê û hin deverên din jî anîne nexweşxaneyê. Serbazekî ji bavê wî re gotiye kurê te herî zêde ji kê hez dike.

Dema dibêje herî zêde ji xwişka xwe hez dike, wê jî tînin. Ji xwişka wî re dibêjin, “Ji birayê xwe re bêje bila dest ji çalakiyê berdê.” (Di berxwedana Çileya 1984’an de xizmên Karasû yên li Elmanyayê jî tînin!..) Malbat li ber nexweşxaneyê kom dibe. Çavên hemûyan tijî rondik in. Apê Xidir tabût jî çêkiriye. Lê tê fêmkirin ku Karasû sax e. Paşê ji wan re dibêjin; “Kurê we dibe

ku çend rojan bijî yan nejî! Jêre bêjin bila dest ji çalakiyê berde" û dibin cem Karasû.

Ji bo wan şert û mercên qirêj ên ji hevalan re rewa tên dîtin ji malbatan veşêrin, Karasû ji hucreya mirinê derdixin, li qata jor li ser livînekî paqij û çarşevek spî li ser, dirêj dikin. Ode ronî ye û her cih pir paqij e. Hevdîtin di wan şert û mercan de tê kirin. Em hinekî behsa bavê Kemal bikin. Piştî Kemal şehîd dikeve ji malbata wî ya li bajarê Gumuşhane dimîne re dibêjin, "Werin cenazeyê kurê xwe bigirin." Bavê wî tê. Di hevdîtina bi parêzer re dibêje: "Ya rastî diviyabû Kemalê min, li vir li van axan razaba. Welatê wî yê rastî vir e. Kurê min ji vir hez kir, ji bo vir şer kir, li vir mir. Diviyabû kurê min li van xakan hatiba veşartin. Lê ji ber dayika wî got, 'Biçe Kemalê min bîne, ez dixwazim cara dawî bibinim.' Ez dibim." Bavê wî rastiya Kemal fêm kiribû. Tiştên digot rast bûn. Ew parçeyekî me, parçeyekî gelê me bû. Di rojên çalakiyê de Kemal ji Karasû re wesiyet dike û dibêje, "Eger şehîd bikevim, divê li Amedê bêm veşartin." Di çarçoveya ku min behs kir, me dest ji çalakiyê berda. Tevî van çar xalan soz dan ku wê hin pêdiviyên me jî bên bicihanîn.

Bi qasî tê bîra min çalakî di roja 68'emîn de bi encam bibû. Piştî çalakiyê bi qasî 15 rojan em li nexweşxaneyê man. Ya rastî me dixwest em vegerin girtîgehê û di nav hevalan de bimînin. Li nexweşxaneyê zêde derfetên tedawiyê jî tune bûn. Vegera me ya girtîgehê bi her awayî wê baş ba.

Em hemû li nexweşxaneyê bûn. Piştî me dest ji çalakiyê berda hin hevalên ku rewşa wan baş bû, birin girtîgehê. Keskîn, Çavgûn, Fûat Kav, Karasû, Şener, H. Baldemîr. Karakûş, H. Hayrî û ez li wir bûn. Navberekê midûrê girtîgehê hat nexweşxaneyê, ji me re got: "Zarokno êdî werin girtîgehê, wir ji vê derê hê baştir e, em ê ji we re odeyeke cuda û revîrê amade bikin." Ez ne şaş bim cejn bû, hatibû cejna me pîroz bike! Me ji ser sertabîb re got: "Me bişînin girtîgehê. Lê pêwîst e hûn jî bên, we navbeynkarî kir, hûn şahidê axaftinên di navbera me û kolordûyê de ne, divê hûn bişopînin ka soz hatine bicihanîn an na;

eger nehatibin bicihanîn wezîfeya we ye hûn bidin pey. Hûn ê bên şert û mercên me bibînin, bibin şahid. Em ê çavdêriyên xwe ji we re ragihînin. Ji ber em yeqîn nakin ku sozên hatine dayîn werin bicihanîn." Sertabîb got: "Temam, ez soz didim, ez ê piştî demekê werim. Ji min re jî gotin, li girtîgehê ji bo we revîr amade kirine. Hûn ê li wir demekê di kontrola tibî de bimînin, îstirehet bikin, paşê dê we bibin qawîşa we." Kesên rewşa wan giran li wir man. Di roja 15'emîn de em anîn girtîgehê. Rojiya Mirinê ya Mezin bi dawî bûye, li pey xwe 4 nemir hiştiye, bi hestên xemgîn bi daxwaza demeke nû bidin destpêkirin em vegeriyabûn Zindana Amedê.

## Encamên Rojiya Mirinê ya Mezin

Em ji nexweşxaneyê anîn, ne em birin 35’ê ne jî revîrê. Revîra ku midûr amade kiribû 36 bû!.. Em paşde anîbûn cihê ku me rojiya mirinê dewam dikir. Em li qata 4. bi cih kirin. Qata jêr ji nû ve ji bo kesên di bin çavan de derdiketin hatibû amade-kirin. Roja dîtir Dr. Orhan Ozcanli derket hat. Got: “Hûn ê li gor rêzikan tevbigerin? Em zanibin da ku em biryar bidin ka em we tedawî bikin an na.”

Dema hat cem me, me jêre got ku pirsgirêka mîdeyê ya hin hevalan heye û me derman xwest. Wî dîsa pirsa hûn ê li gor rêzikan tevbigerin yan na kir.

Me lome kir ku doktorek wer nêz dibe û tedawiyê bi rêzi-kan ve girê dide. Lê me dizanîbû ji doktorekî zêdetir li ser navê îdareyê tê diaxive. Me jêre got, em ê li gor rêzikên me di lihev-kirinê de qebûl kirine tevbigerin, ne hewce ye careke din pirs bike. Me di lihevkirinê de gotibû ku em ê li gor rêzikan tevbi-gerin, lê îdareyê dixwest emîn be ka em di pratîkê de pêk tînin an na, di vî alî de tirsa wê hebû. Ji bo helwesta me fêr bibin dok-tor şandibûn.

************

Rojiya Mirinê ya Mezin bi temamî zincîra ferman-fermandarî neşikandibû. Ji ber çalakiyê çarçoveya teng a kadro derbas nekiribû teslîmiyet ji holê ranekiribû. Lê şertên wê ha-tibûn afirandin. Encamên wê pir mezin bûn. Di wan şert û mer-can de bi kadroyeke teng, di tarîtiya 12’ê Îlonê, demeke ku xwe pir xurt hîs dikir dijmin ji bo muzakereyan rûnişt. Bi awayekî ya têk çû, ne îdareya girtîgehê, rejîma 12’ê Îlonê bû. Çalakiyê ew anîn ser maseya muzakerayan. Paşdexistina dijmin ev peyama esasî da girseya me: Tenê û tenê bi berxwedanê encam tê girtin. Baweriya bi berxwedanê re zêde bibû, çeka rojiya mirinê jî ji rizandinê xelas bibû. Em li vir hinekî behsa lihevkirinê jî bikin. Ya di bingeha lihevkirinê de çi ye? Hêz e. Lihevkirin, encameke

ku tewazuna hêzan derxistiye holê ye. Yê xurt wê hewl bide tewazunê veguherîne lehê xwe. Lihevkirina me pêk anî jî di xwesertiya xwe de divê mirov li ser vî esasî bigire dest. Hêza me têr nekiribû em teslîmiyetê hilweşînin. Hêza dijmin jî têr nekiribû çalakiyê bişkîne, bi tawîzdayînan neçar mabû paşde gav biavêje. Cihê dijmin paşde gav avêt, û cihê em pêşde çûn "lihevkirin" bû û ne mayînde bû. Ne rast bû mirov li sozên artêşeke faşîst û pêkhênerên wê yên hoste yên polîtîkaya heta dawiyê nîjadperest, nihêrîba û tevgeriyaba.

Weke me behs kir, sozdayîn, bidestxistina hin mafan zêde tiştekî îfade nake. Ya girîng bi qasî wergirtina wan xwedîderketin û bikaranîna wan e jî. Lê wê demê girseya me ne di wê astê de bû. Li Amedê dijmin ku girse ev qasî kiriye nav pencê xwe, polîtîkaya xiyanetê dimeşîne wê çawa ji bo sozên dane dest jê berde? Ma mimkun e? Dest jê bernade. Heta em mafê xwe yên me bi dest xistine neparêzin, xeta berxwedêr serwer nekin, li pêşberî wî nebin hêz û tewazunê veneguherînin lehê xwe, dijmin dest ji helwesta xwe bernade. Lê ev di girseya me de nîn e. Mafên hatibûn wergirtin, û lihevkirin hemû girseya girtîgehê digirt nav xwe. Lê ji ber girse li ber xwe nedida û xwedî lê dernediket maf nehatin bicihanîn. Lê êdî pêşiya me vebibû, hat nîşandan ku mirov dikare encam bigire, di demeke dijmin herî xurt e, dikare bê paşdexistin. Ji bo me bejahî xuya dikir.

Piştî çalakiyê têkilî kesên anîbûn 36'ê nedibûn? Bi sirûd û îşkenceyê nedihatin ser me. (Şert û merc ku bi tena serê xwe îşkenceyeke giran bû mijareke cuda ye.) Tenê dema serbaz dihatin em radibûn ser piyan. Li gor qawîşan li 35'ê nermbûn di asteke cidî de bû. Sirûd bi dengekî lewaz dihatin gotin, dema wê û îşkence kêm bibû. Lihevkirin bi awayekî li 35'ê û li cem me hat pêkanîn. Lê di qawîşan de ji bilî guhertineke bi sînor nermbûnek çênebû. Îşkence, "perwerde", rewşa mahşerî bi heman leza xwe dewam kir. Ev nayê wê maneyê ku li qawîşan zêde tiştek nehat guhertin. Girseyê bi qismî be jî tirsa xwe derbas kiriye, wekî berê serê xwe natewîne. Otorîteya îdareyê derbeke mezin xwariye. Her çi qasî otorîte bi awayekî berçav

didome jî, girse dihat ser hişê xwe û çûna serberjêr a îdareyê dewam dikir. Tu rêzik çar çar nehatin pêkanîn. Dema em ji nexweşxaneyê hatin, me dît ku her tişt wekî berê didome. Lê îşkence û gotina sirûdan li gor demên berê hinekî kêm bûye. Parêzname, bi şertê behsa pêkanînên li girtîgehê neyê kirin, dikare bê amadekirin û parastina nivîskî bê kirin.

Weke min got em bêhêvî nebûn. Em neketin nav reşbînî û çavşikestineke wiha. Panîkeke weke, "Êdî dijmin li gor peymanê tevnagere, em ê niha çi bikin?" nîn e. Me didît bê bi hêza heyî encam û guhertina tê afirandin çi ye. Haya me jê hebû ku me bi 14'ê Tîrmehê re li hedefe xistibû. Di aliyê me de erênî bû. Dema me ev lihevkirin çêkir me berxwedaneke nû danîbû pêşiya xwe. Eger lihevkirin hatiba pêkanîn jî teslîmiyet nedihat parçekirin û avêtin. Hesabê me ev bû ku em şert û mercên wê biafirînin, nefesê werbigirin, xwe rêxistin bikin û derbasî berxwedanê bibin. Em nikarîbûn bikevin safbûna ku wê dijmin li gor peymanê tevbigere. Wê hêz, têkoşîn û berxwedanê her tişt diyar kiriba. Ya esasî ku me dixwest em tavilê ji nexweşxaneyê biçin ev bû ku em bi hevalan re bibin yek, pêvajoyeke nû bidin destpêkirin, hewl bidin lihevkirina heyî bidin pêkanîn, heta ji destê me hatiba me ji vê feyde girtiba. Piştî peymanê kesê çavên wî tirsiyan, ket nav reşbîniyê û xiyanet kir tenê Karakûş bû. Dijmin dema li ser sozên dabû nesekinî, em hê zêdetir tûjtir bûn û pêvajo bi lez kir.

Heta teslîmiyet dewam kiriba, her çi qasî îdare ji berxwedanê tirsiyaba jî garantiya tiştekî tune bû, dikarî bê ser me jî. Me ew hesab kir û piştî Karasû ji nexweşxaneyê hat, me ji hev re nivîsand û me nîqaş kir. Me ev biryar girt: "Heke werin ser me, wekî berê rêzikan ferz bikin, îşkence bê kirin, wek kesên li 36'ê em ê li hember derkevin." Piştî demekê mutaalaya doza esasî hat. Amadekariyên parêznameyê hatin kirin. Îdare ji bo astengkirina parêznameyan li qawîşan hovîtî pêş xist. Me rewşa dawî di nav xwe de nîqaş kir. Kesên ji me çûn dadgehê rewşa kesên li 35'ê hîn bûn. Me nîqaş kir û me biryar girt, bi çalakiyeke nû bi rojiya mirinê em mudaxeleyî pêvajoyê bikin.

Di vê demê de -Sibata 1983'yan- Karakûş xiyanet kiribû. Îdareyê bi cesareta wergirt hê zêdetir diçû ser qawîşan. Hevalên li 35'ê jî nîqaş dikin. Ji bo çalakiyê di nav hewldanan de ne. Me biryara rojiya mirinê ragihand û me xwest dest bi amadekariyan bikin.

Belê, wê pêla mezin paşê hatiba. Yan me yê gavavêtina bi Mazlûm dest pê kiribû domandiba, pêvajo bi awayekî layiqî wan bi encam kiriba, yan jî ji berê hê xerabtir em ê di tarîtiya teslîmiyetê de hatibana veşartin. Em di nuqteyeke ku vegera wê tune de ne. Me ruh, hiş û dilê xwe daye berxwedanê. Li gor demên berê em li dadgehan hê çalak bûn, em her tiştî hê berfirehtir aşkera dikin, teşhîr dikin. Ne dadgehan ne îdareyê dikarîbû me asteng bike, tevî hemû hewldanên wan jî me paşde gav neavêt.

Sala 1982, bû saleke ku qedera Amedê hatibû diyarkirin, pêşeroja wê hatibû xêzkirin. Ya rastî ev mijareke pir berfireh a nîqaş û lêkolînê bû. Em tevgereke wiha ne ku di aliyê îdeolojîk-polîtîk de berxwedan esas girtiye. Me berxwedan di aliyê fikir de timî hilgirt û em ketin nav hewldana jêre mafê jiyana pratîk bidin qezenckirin. Li ser vî esasî jî em pir pêşde çûn. Dîroka me ya têkoşînê îspata wê ye. Gavavêtina ya li Kurdistan a nikare were astengkirin, pêşketina me ya gihişt asta gelbûyînê û meşa ber bi pêvajoyeke serxwebûnê, ya rastî ji ber diyarkirinên me yên îdeolojîk-polîtîk derbasî pratîkê bûn, hêza me û xeta me ya partiyê ya serbixwe esas hat girtin û hat pêkanîn. Ev pêşketina li ser esasekî rast a di nav têkoşîna pratîk de gav bi gav çêbû. Girseya me ya ketibû girtîgehê jî ne xerîbê vê pêvajoyê û pratîkê bû. Cewhera berxwedêr a PKK'ê têra xwe xurt e. Xwezayî ye mirovekî li qadên têkoşînê yên germ ku jiyan herî gurûgeş û herikbar e berxwedan pêş xistiye, li hundir jî wê pevçûna parastina cewhera xwe pêş bixe. Di aliyê fikrî de ku me teslîmiyet qebûl nekir, berxwedanên xurt û bi heybet bi me da jiyandin. Qismek ji pêvajoyê ya di nav teslîmiyeteke kûr de derbas bû lekeyê li heybeta berxwedanê nade. Em dibînin di dîrokê de mirovatiyê qet rotayeke dûz neşopandiye. Ketin û rabûn,

kêmasî, serketin û hwd. gelek tiştan rû daye. Em li şoreşa Bolşevîk dinihêrin, têkçûna şoreşa 1905'an û paşdeketina pêla şoreşgerî, zehmetiyên rû dan dibe zemîna ku şoreşa 1917'an xwe dispêriyê û şekil girtiye. Şoreş li ser hemû têkilî û nakokiyên pêvajoya berê bilind dibe. Lenîn dibêje, "Şoreşa 1905'an prova û zemîna şoreşa 1917'an e." Dîsa Komuna Parîs a di aliyê dîroka mirovatiyê de xwedî girîngiyekê ye heye. Komuna Parîsê têkçûnek e, lê êrîşeke bi heybet û cesaret a bindestan e. Dema mirov weke ceribandina daye mirovatiyê û tovê yekemîn ê cîhana nû ya dide jiyîn û hewl dide ava bike bifikire, ji mezinbûn û heybeta xwe tiştekî winda nake. Berxwedana 1981'ê ya Amedê her çi qasî bi têkçûnê bi encam bû jî bû yekemîn zemîna me ya xurt. 14'ê Tîrmehan li ser wê bilind bûn. 14'ê Tîrmehan mîras û ezmûna me ya em ê di pêşerojê de li ser bimeşin. 14'ê Tîrmehê bi dersên mezin tijî ye. Pratîka me îspata ku em teslîmiyetê di fikir û ruh de qebûl nakin. 14'ê Tîrmehê careke din nîşan da ku; li Amedê tenê mirov dema berdêlên mezin bide ber çavan dikare dîwarê zilmê xera bike. Mirinê pêşiya berxwedanê vekiribû, derketin nîşan dabû. Di ser teslîmiyetê re ku salek derbas nebû gavavêtina Mazlûm, du meh derbas nebû çalakiya Çaran, piştî wî Rojiya Mirinê ya Mezin û şehîdên me. Belê 1982 ji bo me saleke mezin e.

************

Rewşa xwe; bêrêxistinî, ew panîka li giştî, tirs, qutifandin, girseya baweriya bi xwe winda kir, çekeke bi hêz a weke rojiya mirinê ya bi awayekî hosteyî me bi kar neanî û kontrola dijmin a stendina bêhnê jî zehmet kiribû me behs kir. Dema van hemûyan şertên çalakiya girseyî ji holê rakir ji bo rawestandina xiyanetê û afirandina zemîna berxwedanê Mazlûm, Ferhat mecbûrî bûn, di maneya hûn dibêjin de xwesertiyek nîn e. Xelekên pêvajoyê bûn ên hevdu temam dikirin. Eger mirov wan her duyan ji hevdu qut bike, li derveyî dema dîrokî bigire dest wê me ber bi encamên şaş ve bibe. Ev çalakî di şert û mercên wê rojê

de ji bo pêvajo bê xurtkirin, herikîn bê guhertin hatibû pêşxistin. Demeke wiha ye ku diviyabû ji sedî sed gavên diyar bên avêtin. Ma mimkun e mirov amadekariyên demdirêj pêk bîne! Êdî mirov bi demê re diket nav pêşbaziyê û peyama hatiba dayîn li pêşiya şêwazê çalakiyê bû. Jixwe şêwazên çalakiyê jî têra xwe bi heybet bûn. Di wê nuqteyê de Mazlûm peyameke. Ferhat Kûrtay, Necmî Oner, Mahmût Zengîn, Eşref Anyik (Çaran) şoreşa alê ne. 14'ê Tîrmehê tê maneya mirov pêvajoyê vediguherîne maratonekê. Ji bo rojiya mirinê demek dirêj didome, hem li hundir hem li derve girseyan li gor şêwazên çalakiyê yên din hê kûrtir bandor dike, dihejîne, rêxistin dike. Xweşewitandin an jî çalakiyên di carekê de û hê cuda yên demkurt di avakirina girseyê de bi qasî bi rojiya mirinê ne bi bandor in. Di nav şert û mercên wan rojan de ev çalakî ji aliyekî ve ji bo rawestandina êrîşên dijmin, ji aliyekî ve jî dayîna perspektîfên ji bo girseya me bê ser hişê xwe û nîşandana gavavêtinê ne. Di vê çarçoveyê de 14'ê Tîrmehê pirek e. Roja beriya çalakî ji tevgera kadro ya teng derdikevin û girseyî dibin.

Berxwedana Tîrmehê ruhê Amedê ye. Îfadeya herî zêde ya polîtîkaya me ya berxwedanê ye. Eger 14'ê Tîrmehê neyê fêmkirin ya piştî wê qet nayê fêmkirin. Yê Mazlûm fêm neke jî nikare Tîrmehê fêm bike. Berxwedan ketine nav hev û hevdu temam kirine. Yek ji encama herî girîng a Rojiya Mirinê ya Mezin afirandiye ev e ku pêkhateya me ya rêxistinî ya dihat xwestin bi teslîmiyetê re were belavkirin ji nû ve hat avakirin. Ji bo berdewamkirin û mayîndebûna berxwedanê pêkhateya rêxistinî mecbûrî ye. Her du jî girêdayî hev in û di nav hev de ne. Pêwîst e mirov têkiliyên di navbera rêbertî, rêxistin û berxwedanê de rast fêm bike. Em dizanin ku eger berxwedan nebe û xeta hewce dike neyê şopandin, wê rêbertiya ku hukim li ser girseyê dike û bandor dike, dixe nav tevgerê, xwe dide qebûlkirin jî nebe. Eger hebe jî ji bilî ku wek nimûneyekê, lewaz û bêtesîr be wêdetir naçe. Di me de rêxistinbûneke ku bi berxwedanê re dibe yek û berçav dibe heye. Ev bingeh her çi qasî ne gihiştî be jî li Amedê hat danîn û pêşxistin. Rojiya Mirinê ya Mezin di nav çalakiya

xwe de tevî ku berxwedan domdar kir, rêxistinbûn û rêbertî jî domdar kir.

Şêwazên mirinê yên rêberê me, mezinbûna wan a di mudaxeleya pêvajoya dîrokî de, xwedî wê hêzê bûn ku rêxistinbûn û rêbertiyê domdar bike. Her wiha heta gihiştine asta şehîdbûnê mirovên li pey wan tên perwerde kirine, rê nîşanî wan kirine. Rêbertiya ku al ji wan dewr girtiye li ser zemîneke wiha bilind bûye, otorîteya şoreşgerî temsîl kiriye. Bi hembêzkirina pêvajoyê re meş dewam kiriye. Hewl dane bibin xwendekarên layiqî Xeyrî, Kemal û Mazlûman. Her wiha 14'ê Tîrmehê tevî rizgarkirina partiyê rêya parastina mirovatî û nasnameya siyasî jî nîşan daye.

************

Çûyîna serberjêr dewam dikir. Xiyanet û îtîraf tevî Mazlûm û Çaran jî nehatibû rawestandin. Lê pêvajoya Rojiya Mirinê ya Mezin pêvajo berevajî kir. Ji xiyanetê re got bisekine. Polîtîkaya xiyanetê ya dijmin hat paşdexistin. Hişt ku mirovên me bên ser hişê xwe û mejiyên wan vebin. Bi cesaret û moralê da gelek mirovên ku berê îtîrafkarî kiribûn, bûne amûrê vê polîtîkaya dijmin îtîrafên xwe paşde kişandin. Bi zext û îşkenceyê bê çawa îtîraf bi wan dane amadekirin, lîstikên heyî li dadgehê teşhîr kirin. 14'ê Tîrmehê ji bo girseya me biherike berxwedanê, xwe li wir terîf bike bûye faktoreke mezin. Çalakiyên beriya Rojiya Mirinê li hemberî keleha dijmin, li hemberî eniya wê ya bi her awayî mayîn kiribû ku derbên xurt bûn û di dijmin de hejandin afirand, Rojiya Mirinê ya Mezin bi wê leza ku ji wê hejandinê wergirt di keleha dijmin de qewareke mezin vekir û serê tûnelê xuya kir. Êdî em ê ji tengasiyê xelas bibûna. Bi xwespartina van çeperan em ketin êrîşa dijber.

Belê, ji bo partiya me jî encamên wê mezin bûn. Partiya me ji 14'ê Tîrmehê piştgiriyeke mezin wergirtiye, ders derxistine. Peyama herî xurt a hatiye wergirtin ev e; di şertên herî zor û

zehmet de jî hatiye nîşandan ku dilsozî û baweriya bi partiyê, gel û şoreşê re di asta herî jor de wê bê temsîlkirin.

14'ê Tîrmehê bersiva herî bi heybet e ya ji faşîzmê re, hovîtiya bi xwîn a mêtinkariya Tirk re. Ne tenê li girtîgehê li derve jî di rawestandina polîtîkayên xiyanetê yên tên xwestin li xaka Kurdistan û di nav gelê me de bidin jiyandin, bi her awayî hatiye dîtin û fêmkirin ku pêwîst e ruhê 14'ê Tîrmehê bê nîşandan. Rojiya Mirinê ya Mezin tenê derbe li polîtîkayên zindanê yên faşîzmê nexistiye, di aşkerakirina polîtîkaya tunekirinê ya neteweyî ya li ser Kurdistanê tê ferzkirin û helwestgirtina li hemberî wê de bûye rênîşander. Li derve ku partiya me bi ruh û can têkoşîna daniye pêşiya xwe ji bo vê polîtîkaya xwe pêş bixe feydeya 14'ê Tîrmehê mezin e. Li hemberî mêtinkarên Tirk û hevkarên wan ên di her astê de ku di nav partiya me de bi destên hin hêmanan komplo û provokasyonan dikin, hewl didin xeta berxwedanê ya pêwîst e li ser esasê têkoşîna çekdarî ya rizgariya neteweyî bê meşandin tesfiye bikin, li şûna wê reformîzmê bi cih bikin jî 14'ê Tîrmehê bersivek e. Yekîtî û yekparebûna rêxistinî ya partiyê ku hat parastin û xurtkirin feydeyeke diyarker a 14'ê Tîrmehê çêbû. Xeta me ya şoreşgerî û serbixwe ya di kadro û şervanên partiyê de hat jiyandin, endamên partiyê ku li derdora Rêbertiya Partiyê bûn xelek, di zelaliya xeta îdeolojîk a partiyê de ji rêderketinan hat parastin pareke girîng a 14'ê Tîrmehê heye. Di biryara vegera Kurdistanê, di gerîla û kadroyên me yên li ser xaka me şer dikin ku mirov dikare ji bo dozekê bimire û rizgarî tenê berhema mirovên şervan ên bi fedakariyeke wiha xwe gurçûpêç kirine bi 14'ê Tîrmehê re hê zêdetir diyarker bûye û di hevalên me de ev ruh û serwextbûna vê berxwedanê xwe pê gurçûpêç kiriye bûye navenda kişandinê. Ji dost û dijminan re jî wiha hat gotin: "Her tişt neqediya!" Ya di tabûtan de hat nivîsandin û bû al ev bû. Peyama, "Em tên, vedigerin welatê xwe, xaka xwe çiyayên xwe. Dijmin her tişt neqedandiye. Em ê hêviyan bidin jiyîn. Şer bidomînin. Li hemberî gel û dîrokê gotina me heye. Gotinên dawî berxwedêr dibêjin. Em ê li ber xwe bidin. Me dest ji şer bernedaye" bi ce-

nazeyên me bi xwefedakirineke wiha hatibû dayîn. 14'ê Tîrmehê tecrîda kûr a dijmin afirandibû parçe kiribû. 14'ê Tîrmehê bibû çalakiya herî bi bandor a hişt zilma li Girtîgeha Leşkerî ya Amedê didome li hember raya giştî ya cîhanê bê teşhîrkirin. Têkoşîna me ya rizgariya neteweyî û partiya me bi vê çalakiya xwe prestîjeke mezin bi dest xist, hurmet û rêzdariya xwe zêde kiriye, hê zêdetir hatiye zanîn, naskirin û axaftin. Mijara ku şoreşger kesên mirov ji wan yeqîn dike, tên bawerkirin, baweriya bi şoreş û sosyalîzmê re ne vala ye û pûçbûna dijpropagandaya bûrjûvaziyê herî baş xwe bi wê xwefedakirinê anî zimên. Bi kurtasî ruhê 14'ê Tîrmehê veguherî propagandaya çekdarî, gerîla û pêngava 15'ê Tebaxê.

Her çi qasî Mazlûm lidarxistina çalakiyê ji me veşartibe û em agahdar nekiribin jî, li gor cewhera biryara berxwedanê ya navendî tevgeriyaye û bûye rênîşanderê me. Me nîqaşên xwe yên di wê pêvajoyê de bi berfirehî vegotibû. Naveroka çalakiya Çaran jî bi heman rengî ye. Ev çalakî pêkanîna xeta partiya me ye.

Weke min got di nav çalakiyê de ne gihîştî be jî kadroyek kakil û rêber ava bû û ev bû bingeha pêkhateya me ya rêxistinî. Hevalên me yên rêber ji nav me veqetiyan, lê tunebûna wan di berxwedan û rêxistinbûna me de qutbûnek çênekir. Xeleka rêbertiyê ya nû li ser esasê 14'ê Tîrmehê rêya pêvajoyê diyar kir. Xwe wek otorîte da qebûlkirin. Ev otorîteya şoreşgerî ne tenê di pêkhateya PKK'ê de, bû otorîteyeke ji aliyê hemû girseya girtîgehê, heta dijmin ve jî hat qebûlkirin. Kadroyên ku rêveberî ava kirin, hevalên rêveber ên asta duyemîn bûn ku berê jî li girtîgehê piştî hevalên rêber dihatin. Her wiha li derve jî di astên cuda yên partiyê de wezîfe wergirtibûn û rêveberî kiribûn. Yanî kakilekî ku xwe îspat kiribû û bawerî dida. Têkildarî mijara bûyîna otorîte û rêxistinbûnê de ji bilî pirsgirêka kapasîte tu zehmetî û tengasiyeke me ya herî biçûk jî tune bû. 35 dîsa dilê qawîşan û cihekî ku hemû çav li ser bûn. 35 bi terkîba xwe dîsa di asta rêber de bû û navenda kar û xebatê bû. Ne têkiliyeke wesayetê ya mîna ji bav derbasî kur dibe. Rêbertiyeke ku di nav

çalakiya pratîk de dihat ezmûnkirin û xwe îspat kiribû. Her wiha cihê feraseteke rêbertî ya li ser esasê wesayetê di têkiliyên şoreşgerî de nabe. Ev tiştekî ku em xerîbê wê bûn. Kadroyê kakil ava bûye, bingeha rêxistinbûnê hatiye danîn, lê wek organîk hê hemû girtîgeh hembêz nekiriye. Tecrîd dewam dikir. Dema rêbertî, navend hatiba afirand wê girêdana organîk jî hatiba avakirin. Piştî çalakiyê di aliyê rêxistinî de pêkhateyeke ku girtîgeh hembêz kiriba hebû. Yek jî bi çalakiya 14'ê Tîrmehê re careke din bi awayekî herî aşkera hat dîtin ku bê kendala di navbera zimanbazî û rêbertiya şoreşgerî de çi qasî kûr e. Me gotibû ku li girtîgehê "rêber"ên di her astê de teslîmiyetê dijîn hene. Pêvajoya Amedê bi awayekî bênîqaş derxistiye holê bê du ferasetên cuda yên rêbertiyê li hemberî hevdu çawa bi cih bûne. Rêbertiya şoreşgerî û "rêbertî"ya di gotinê de maye di pratîkê de ji hev qut bûye û zelal bûye. Rêbertiya ji gel û girseyan re bê tê çi maneyê ku Xeyrî, Kemal û Mazlûm anîn zimên; hatiye dîtin bê rêberên sexte jî çawa ketine asteke ji rêzê. Xwezayî ye ku piştî Xeyriyan otorîteya şoreşgerî û rêbertî li hemberî dijmin wê kevneşopiya li ser bilind dibe parastiba. Tersî vê wê tenê ne bêhurmetiya li hember şehîdên me be, wê bêhurmetiya li hemberî gelê me û nirxên me yên şoreşgerî jî be. Di zemîna ku rêberên şoreşger vekirine rêxistinbûna me domdar bûye, bûye sedem ku baweriya bi şoreş û partiyê re bi awayekî neşike xurt kiriye.

Têkildarî mijara hin kesên ku dibêjin, "Di rojiya mirinê de kadroyên rêber belesebeb mirin!.." Li rûyê me aşkera kesek neparêze jî, şîroveyên wer qirêj û erîş hatine guhê me. Ev nêzîkatî ji bilî teqwiyeya ji propagandayên dijmin re yên ji bo berxwedanê leke bike pêş dixe tu maneyeke wê nabe. Ev gotinên Kemal ên dema diçû mirinê ji rêderketinan re bersiv e: "(…) Dibe ku hinek bedbext bêjin ku me întihar jî kiriye. Lê bi qasî di oxira wê de biçin mirinê, em qîmet didin jiyanê û jê hez dikin." Dema mirov encamên mezin ên 14'ê Tîrmehê li hundir û derve afirandine li ber çavan digire, tê dîtin ku bê ev nêzîkatî hewldana berevajîkirina serwextbûna girseyan e. Ji derveyî spekulasyonên tên kirin em bi mentiqeke saxlem bipirsin: "Winda-

kirina kesayet û rêberên wer xurt ji bo pêvajoyeke wiha hewce ye?” Xeyrî, Mazlûm, Kemal kadroyên me yên damezrîner û rêber in. Di demeke ku pêwîst e mirov rêbertiya şoreşê biparêze û xurt bike li pey hevdu çûna van mirovan guncaw e? Me got; dîrok di hin wextan de wer bi lez dibe, kûr dibe ku bûyerek, mirovek dikare bibe analîzkerê hemû pêvajoyê yan jî çûna berevajî wê. Şehîdbûna rêberên me ji bo gel û partiya me windahiyeke pir mezin e. Lê wek encameke taybetmendiyên dîrokî-civakî-çandî yên civaka Kurdistanê her gava ji bo rizgariya neteweyî tê avêtin diviyabû bi rêbertî bûya. Her gava dîrokî di me de diyardeyeke mezin a rêbertiyê ye. Gava pêş û dîrokî, derketina ji nav neyênî û tarîtiyê rêbertiyeke mezin hewce kiriye. Mirovekî ji rêzê nikarîbû çalakiya Mazlûm pêk bîne. Gaveke wiha ya di nav şert û mercên dîrokî de, rêbertiyeke mezin mecbûrî dikir. Ji ber vê sedemê di her gavavêtinê de bi serwextbûneke mezin, fedakarî û qehremantî gav avêtin. Jixwe PKK bi tena serê xwe tevgereke mezin a rêbertiyê ye. Her gavavêtina ji tunebûnê ber bi vejînê ve tê avêtin bi rêbertî ye. Di bin de îmzeya rêberên me heye. Ji derveyî vê ne mimkun e. Li welatên din tevgerên ji ber xwe ve, çalakiyên girseyî hene. Lê di me de her gava ji bo serxwebûnê tê avêtin, her gotina tê kirin, her girêka tê hûnandin bi hewldan û mudaxeleyên rêbertî hatin afirandin. Di vê çarçoveyê de rêbertiya Xeyrî û Kemal ji derveyî îfadeya berçav a pêkhateya giştî û taybetmendiya me ne tiştekî din e. Êdî şehîdên me bûn rêxistin, xet û gel. Heke wan di wê merheleya dîrokê de rêbertî bi vî awayî pêk neanîbana wê bibana ji rêzê, winda bibana û çûbana. Wan bi rastî ne mirin jiyan, yekparebûna bi mirovatiyê re û mezinbûn hilbijartin. Wek gel û rêxistina şer ku me xwe ji nû ve ava kir, pêş xist û em hatin van rojan bi jiyandina tiştên me ji wan dewr girt gengaz bû. Hin dem û bûyer qet hewce nake rêber bên windakirin. Heta dibe ku çûna mirinê ya rêberan şaş jî be. Lê hin dem û bûyer hene ku hemû pêvajoya dîrokî di wan de zêde dibe û pev diçe. Şoreşgerek, milîtanek partiyê eger hewce bike divê zanibe bimire. 14’ê

Tîrmehê demeke wiha ye. Û ew wek rêberên partiyê li cihê ku pêwîst e mirov bimire zanîbûn bimirin.

Dij-şoreş timî ji girseyan re peyama ku bawerî bi şoreşger û çepgiran nayê, li hemberî zor û zehmetiyan dipelçiqin, mirov nikare li pey wan bimeşe dide, her wiha nîzama wê çi qasî xurt-bi qudret e û li hemberî wê serî nayê rakirin dide. Bi kurtasî hewl dide hêviyên bi şoreş û pêşerojê re bişkîne. Baş e, bersiva partiya me çi bû? Çi neqlî civakê hat kirin? Hat diyarkirin ku şoreşger qet jî ne mirovên rojên rehet, mirovên dozê yên rojên zehmet in, eger pêwîst bike bi mirina xwe doza xwe diparêzin, li pişt dîwarên beton û caxên hesinî jî bin berxwedanê didomînin, ew der dikarin bên teqandin, bigihêjin mirovatiyê û gel, her wiha li şûna tunebûn û xiyanetê hêvî zindî hatin hiştin û banga berxwedanê neqlî gel hat kirin. Li hemberî hemû dij-propagandayên dijmin rêberên me bi berxwedanê bûne bersiva herî mezin.

************

Mirina îdeolojîk mirina herî xerab e. Me mirineke wiha tu carî qebûl nekir. Xeta partiyê û îdeolojiya me sedema hebûna me bû. Di pêvojoya ku îdeolojî jiyanê hembêz bike, di nav jiyanê de maneya xwe ya rast bibîne, eger mirina fizîkî bê û mirov wê nehilbijêre dibe ku rêya diçe mirinê veke. Helbet me yê mirina fizîkî tercîh kiriba. Berpirsyartiyên me û îdealên me ferman dida ku em wer tevbigerin. Û li ser vî esasî me li ber xwe da, me bi vê nêrînê li mirin û jiyanê dinihêrî. Yanî eger em bi vî awayî neçûbana ser mirinê dibe ku me bi temamî rêxistin winda kiriba. Encamên ku van mirinan derxist holê, di pratîkê de temsîla rast a xetekê, bi mirinan afirandina jiyanê, ji nû ve afirandina pêşerojê, danîna bingeha kesayetên rêberên şerker-milîtan, rêbertiya gel, dilsozî û sedeqeta bi gel re bi pratîkê di jiyanê de bi cih bibe. Ev her biçe veguhere rêxistinê, ji kadroyên wê neqlî gel bibe û bigihêje asta gelbûyînê. Hevalên me yên Rêber bi awayekî fizîkî ji nav me çûn, lê wek berxwedan û şer

bi me re, bi gel re dijîn. Û weke meşaleya rênîşandera gelê me û partiya me dijîn.

************

Me bihîst ku van komên derveyî me di mijara tevlî çalakiyên me bibin, piştgiriyê bidin an jî çalakiyên bi şêwazên cuda li dar bixin de hewldaneke herî biçûk jî nekirine, hin caran em bi xwe jî bûn şahid. (Tenê ji Partîzan kesek tevlî bibû û piştgirî dabû.) Xwehiştina ji însafa dijmin re dewam kirin. Beriya çalakiyê li qawîşan bi qasî ku bêjin: “Ev sîxur in. Li girtîgehê provokasyanê dikin. Lewma timî dibêjin berxwedan, îsyanê dixwazin û hwd.” pêşde diçin. Me di çalakiyê û piştî wê de jî rewşên wer balkêş dîtin. Kemal behs kiribû; yek ji kesên pêşeng ê DDKD’ê Orhan Guler, li Lubnanê makaleyek nivîsandiye û daye weşandin. Di makaleye de îdîa kiriye ku Kemal sîxur e. DDKD, Ozgurluk Yolû ev spekulasyon bi zanebûn belav dikirin. Di nav partiya me de ji ber hevalên Tirk hebûn, ev kadroyên bi hêz û bi kesayet ku li Kurdistanê dixebitîn wek sixurtiyê propaganda dikirin. Ji bo Kemal têra xwe kirin. Spekulasyon neqlî girtîgehê kirin. Alîgirên me û mirovên ji gel bi gotina, “Vaye ew mirovên we behsa wan dikir, wiha dizanin bimirin! Madem hûn komunîst in, qehreman in, hûn xwe ji bo kîjan rojê vedişêrin, hûn çi dikin?” li rûyê wan dixistin. Dîsa ji Ozgurluk Yolû Nazîf Kalelî ji bo kesên di rojiya mirinê de dikare bêje; “Ev xwarinê dixwin, namirin!..” Kesekî ku xwe wek şoreşger dihesibîne dikare bi devê Esat Oktay biaxive. Wek rêxistin û şexs girseya girtîgehê jî wan baş nas dike. Rêberên rastî ku berxwedan diafirandin, tîpên sexte jî spekulasyon pêş dixistin. Ji ber çepil diavêtin teslîmiyetê berxwedan weke kabûsekî didîtin. Mirovên rêber ku ber bi mirinê ve diçûn nedixwestin pûçbûn û hîçbûna wan derkeve holê maskeya wan bi temamî bikeve. Dixwestin maneya ku mirovên egîd ber bi mirinê ve diçin û mirina wan reş bikin. Çalakiyê careke din bi awayekî ku qet nikaribin veşêrin rûyê wan derxist holê. Em ji Nûrettîn Elhuseynî, Orhan Guler

bigirin heta pêşengên din ên DDKD'ê hema hemûyan ev çalakiyên bi heybet ên hevalên me wek întîhar nirxandin, xwestin naveroka wê vala bikin.

Belê, gotinên berê bi vî awayî bûn: "Provokasyon çêkirin, dijmin har kirin. Sedema hovîtî û îşkenceyê PKK ye." Ketin rewşeke ku li deverên em lê nema dikarîbûn vê biparêzin. Lê li derve dest ji reşkirina PKK'ê û berxwedanên wê bernedan. (Di nav wan de hin hêmanên durist, ji ber tiştên ku berê digotin êş dikşandin.) Ji bo berxwedana me afirandiye biçûk nîşan bidin, tiştên ku dijmin cesaret nedikir gotin. Ji bo teslîmiyet û bêruhtiya xwe veşêrin, dîrokê berevajî bikin gotin; "Van bi awayekî fermî întîhar kirin!.." Bi kurtasî em dest ji tevlîbûna wan a berxwedanê berdin, xwedî li berxwedanê derneketin; xwedî li rêxistinên xwe jî derneketin û parastina siyasî nekirin.

Wek kom Partîzan û bi qasî ez zanim ji Kawa yek-du kesan Îlona 1983'yan parastina siyasî kirin. Ji derveyî wan di tevahiya pêvajoya hovîtiyê de kesî parastina siyasî nekir, me nebihîst.

Partîzanî wê demê li 35'ê çend kes bûn. Weke gelemperî di nav wan de jî pevrenivîsin û têkilî pir bi sînor bû. Li gor H. Hayrî behs dikir; bi hevalê xwe yê li qata jêr ketiye têkiliyê û biryara tevlîbûna çalakiyê dane. (Agahiya wan ji hevalên li qawîşê nîn e.) Beriya tevlî çalakiyê bibin, hevalê wî yê li qata jêr ji bo lêpirsînê birin polîs. H. Hayrî wer dihizire ku ji ber hevalê wî tevlî rojiya mirinê bûye ji 35'ê birine. Li ser vê yekê bi tena xwe dest bi rojiya mirinê dike.


Ji çepa Tirk kes tevlî nebû. Li girtîgehê ji HK, Dev-Yol, TKEP'ê mirov hebûn. Bi giştî bi germî û erênî li çalakiyên me dinihêrîn. Dema hevalan parastinên me li dadgehan dikir li qawîşan behs dikir bi eleqeyeke nêzîk dişopandin û erênî bandor dibûn.

Qaçaxçî jî di nav de, welatparêzên din jî pir kûr û erênî bandor dibûn. Kesên digotin, "Ez ê êdî ji bo PKK'ê şer bikim, a ji destê min bê ez ê bikim, ev mirovên doza xwe ne" ne kêm bûn. Nirxandina Mehdî Zana yê li 35'ê dima û me helwesta wî dizanîbû erênî bû. Teqdîr dikir. Piştî şehadeta hevalan bang li

me kir û wiha got: “Ez rizgariya gelê Kurd dibînim. Heke mirov ji bo Kurdistanê xwe bi saxî dişewitînin, bi kêf ber bi mirinên wer zor û zehmet ve diçin, wê ev gel ji sedî sed rizgar bibe. Baweriya min hê xurtir bû.” Necmettîn Buyukkaya jî ji bo parastinên me yên li dadgehan nirxandina; “Hûn dîrokekê çêdikin, dîrokekê dinivîsînin” kiribû. Em vê jî bi ser ve zêde bikin; “rêber”ên berê yên bûne populer, Mumtaz Kotan, Nurettîn Elhuseynî, Mahmût Çikman. O. Çetînler anîn nav çalakiyê, 35’ê. Ne ku haya îdareyê ji helwesta wan li cem polîs û girtîgehê tune bû. Ne helwesteke wan a şoreşgerî ne jî hewldaneke wan a çalakiyan hatibû dîtin. Îdareyê armanc dikir nîşanî 35’ê bide û peyama, “Binihêrin ev tevlî tiştekî nabin, vê jiyanê qebûl dike, hûn jî tevlî nebin û rehet bisekinin!..” bide. Weke di tabloya me xêz kir Rojiya Mirinê ya Mezin bi temamî parçeyekî dîroka PKK’ê ye.

## Kurtejiyana Şehîdên Rojiya Mirinê ya Mezin

**M. Xeyrî Dûrmûş:**



Sala 1955'an li Qumik a Çewlikê ji dayik bû. Yek ji damezrînerê partiya me û endamê Komîteya Navendî ye. Di salên ku xwendekarê lîseyê bû fikrên şoreşgerî nas kiriye, sala 1975'an hatiye Enqereyê, li Fakulteya Tibê ya Zanîngeha Hacettepe dest bi xwendinê kiriye. Wan salan di nav lêgerînan de ye. Li aliyekî ku di nav têkoşîna şoreşgerî de cih digire, li aliyê din jî li ser şoreşa Kurdistanê jî diponije. Di rojên ku lêgerînên wî di astên jor de ne Serok Apo nas dike. Êdî gihiştiye hizûra ku ya lê digere dîtiye, bi xwestek û coş xwe daye xwendinê, lêgerînan. Bi taybet bi tevkariya Serok Apo di demeke kurt de wek kesekî kamil, gihîştî û bi gurçûpêç xwe amade kiriye vegere welêt.

Sala 1977'an vegeriyaye Kurdistanê, welat û gelê xwe hembêz kiriye, di têkoşîna me ya rizgariya neteweyî de bi asta xwe ya rêber cih girtiye.

Sala 1978'an tevlî Yekemîn Kongreya PKK'ê (Kongreya Damezrandinê) bûye, wek endamê Komîteya Navendî bi awayekî aktîf wezîfe wergirtiye. Demekê li herêma Riha ya pratîka germ a têkoşînê bi awayekî herî zêde lê rû dida xebat meşand.

Xeyrî bi her awayî xwedî kesayeteke bandorker bû. Kesayeta wî hizûr û bawerî dida mirov. Mirov nikare behsa hezkirina wî ya mezin a ji mirovan re bike. Bi eşqeke mezin girêdayî welêt û gelê xwe bû. Tebesûma ji dil a qet ji ser rûyê wî kêm nedibû xweşikbûna wî ya hundir derdixist derve. Qîmetê dida mirov bi qasî îfadeya hezkirina kûr a di dilê wî de bû, nîşandana kesayeta wî ya zane bû jî. Kesayeteke mezin bû bi fikir û nirxên

şoreşgerî hatibû strandin. Tecrûbe û zanebûna xwe ku dikir xizmeta şoreş û partiyê rêxistinkarekî bi hêz bû. Xwedî wê tecrûbeyê bû ku ji pirsgirêkan re çareseriyên lezgîn pêş bixe. Xwedî jîrtiyeke çalak bû. Rêberekî partiyê û gel ê hesta berpirsyartiya wî xurt bû. Afirînertiyên proletaryaya cîhanê bi şaşnebariyeke mezin kiribû rêber, ne tenê yê gelê Kurdistanê nirx û zarokekî gerdûnî yê mirovatiyê bû.

Tu carî xwe ji mirovan aciz nedikir. Aram, bi xweşbîn, her kes guhdar dikir, tişt didan fêrkirin, dixwest fêr bibe, dilnizm, û li pişt kesayeta xwe ya aram weke sûlaveke bi coş bû. Her kesê didît û nas kir dikir bin bandora xwe, mirovan rêz û hurmet didanê. Di her kesî de şopeke erênî dihişt. Kesekî ew nas kiribe, pêre axivîbe ne mimkun e wî ji bîr bike.

Dema ji bo kontrola xebatên me hat herêmê bi baweriya ku dida mîna îmana mirov teze dibû, me xwe di rewşeke wê kes nikaribe pêşiya me bigire de didît. Mirovan di kesayeta wî ya şoreşgerî de pêşeroj, serxwebûn û azadiya Kurdistan didît. Bi kesayeta xwe ya bi sebir, kamil û pêkhêner timî bû navenda kişandinê. Duristî û jidilbûna wî her cihê diçûyê ronî dikir. Xeyrî dilekî mezin ê partî û şoreşê bû.


Piştî tevlî nav refan bû ji bilî jiyana partiyê tu jiyaneke wî çênebû. Têkiliyên pergalê yên berê di ruh û hişê xwe de ziwa kir. Bi disîplîn bû. Xwe tevlî partiyê û têkoşînê kiribû, her tiştên xwe feda kiribû. Li hemberî bêxemî, şaşiyên ku bi zanebûn dihatin dubarekirin, bêhestyarî, helwestên lîberal bêtawîz di nav helwesteke rexneyî de bû. Li hemberî neyêniyan, paşverûtî û rizandinan bêtehemûl bû. Di çûna ser şaşiyan de bêteredût bû. Ji bo başî û rastî derkevin holê çeka rexneyê jî bi hosteyî bi kar dianî. Tu hevalek ji ber Xeyrî ew rexne kiriye, ew jî neçar maye rexnedayînê bide, aciziyeke herî biçûk jî nîşan nedida. Ew pêvajoya îqnayê, kir dersek. Tecrûbeya wî ya îqnayê xurt bû. Çavkaniya wî ya jiyanê, dewlemendiya wî ya herî berfireh gelê wî û hevrêyên wî yên partiyê bûn.

Wî rêbertiya teorîk û pratîk a berxwedana zindana kiriye, dema dîrokî baş fêm kiriye, ya divê bê kirin nîşan dida û ma-

mostayekî timî çareserî diafirand. Xeyrî û rêberên din tevî şoreşa Kurdistanê di şexsê xwe de berçav kirin, her tiştên pêvajoya zindanê bûn. Xeyrî siberojên bi berxwedanê mizgîniya wê tê dayîn û pêşeroja me ne. Amed Xeyrî ne, Xeyrî Amed in.

Ew bersiva herî mezin in a gelê me daye dîrokê. Mirov çi qasî behsa wan bike jî wê tiştên em dibêjin timî kêm bimînin. Ew rûmeta mirovatiyê û jiyana rastî bûn a gel bi awayekî herî baş xwe di wan de didît. Dilsoziya Xeyrî ya bi dozê re ew qasî mezin bû ku, dema jiyana xwe weke guleyekê dida ber lûleya çekê û berdida ser dijmin jî digot, “Li ser kêla gora min, li hemberî gelê xwe bi awayekî deyndar mir binivîsînin.” Ya di Xeyriyan de tê jiyîn hêvî û xweşikiya şoreşê û rizgariya mirovatiyê ye.

**Kemal Pîr:**



Sala 1952'yan li gundê Guzelolûk ê girêdayî navçeya Torûl a Gumuşhane, ji dayik bûye. Zarokekî malbateke xizan e. Lê derfeta xwendinê dibîne. Lîseyê li Samsûnê diqedîne. Li Fakulteya Ziman Dîrok Cografya ya Enqere qeyda xwe çêdike.

Ev salên piştî dema 12'ê Adarê ye. Pêvajoya ku tevgera şoreşger xwe ji nû ve komî ser hev dike. Kemal, di salên zanîngehê de fikrên şoreşgerî nas dike, dipejirîne. Xwedî kesayeteke çalak, bi tevger û nayê girtin e, di têkoşîna antî-faşîst de li refên herî pêş bû.

Li Enqereyê ji bo ciwanên şoreşger komî ser hev bibin wezîfeyên aktîf wergirt. Li Komeleya Hîndekariya Bilind a Demokratîk a Enqerê (ADYOD)'ê de bi Serok Apo re ye. Naskirina Serok Apo qonaxeke girîng a têkoşîna wî ye. Kemal bi qasî teoriya şoreşgerî, bi coşa ku pirsgirêkên şoreşa Kurdistanê jî fêr bibe tijî ye. Ev xwesteka fêrbûnê ya Kemal di demeke kurt de hukma li ser teoriye tîne. Di demeke ku pirsgirêka Kurdistanê tê nîqaşkirin, welatê me wek mêtingeh e tê nirxandin, bêyî bikeve nav tu teredûtan tercîha xwe kir. Bi berpirsyartiyeke mezin a şoreşgerî çûye ser pirsgirêkê, di pêvajoya hilberîna fikrî de cidiyet û baweriya di navbera wan de ew kiriye şervanekî şoreşa Kurdistanê. Hatiye fêmkirin ku heta Kurdistan azad nebe wê Tirkiye jî azad nebe, Kemalîzm ji fikrê xwe avêtiye û bûye yek ji kadroyên pêşeng ê di koma kakil a yekemîn a PKK'ê de cih girtiye.

Di demeke li Tirkiyeyê Kemalîzm di nav refên çepê de mil bi mil digeriya, parastina rizgariya neteweyî ya Kurdistanê mîna, "milliyetgirî, parçekirina refên çepê û hwd." dihat dîtin,

hema bi yek carê li ser vê têkoşîna mafdar ku dihat xêzkirin û paşçavkirin, ev gavavêtina Kemal têra xwe manedar bû. Dîsa di wan rojên li Kurdistanê têkildarî rizgariya Neteweyî bawerî û hêvî nemabûn, gel dûrî rastiya xwe ketibû, ketibû nav tarîtiyê, ev gavavêtina Kemal hê manedartir dibe. Kemal ku yek ji mînakên mezin ê enternasyonalîzma proleter e, xwe bi nirxên şoreşgerî gurçûpêç kiriye, bandorên her cure jiderketin û sosyal-şoven ên îdeolojiya bûrjûva yên di nav refên çepê de bi lez avêtiye, bi hemû hebûna xwe, xwe fedayî têkoşîna rizgariya Kurdistanê kiriye. Ew sal dema ku PKK'ê jî bi nasname bibû. Bi PKK'ya sosyalîzm kiriye rêber di dîroka gelê me de, demeke nû, rûpelekî nû vekiriye. Kemal, yek ji rêberên bi şens e yê ev rûpelê nû vekiriye û têkoşîna rizgariya neteweyî daye destpêkirin. Heman demê rêberên wek Kemal, Hakî Karer ên bi eslê xwe ne Kurd in, di avabûna tevgera me de feydeyên wan ên mezin çêbûne. Tevî Tirk in jî di asta rêber de ku tevlî vê pevçûnê bûn, nûnertiya bi hosteyî ya ruhê enternasyonal e.

Kemal, bi koma kakil re lêkolîn û lêgerînên xwe yên îdeolojîk dewam kiriye, xwe bi hosteyî perwerde kiriye. Li Enqereyê piştî xebatên koma aktîf, sala 1976'an di merheleya xebat neqlî Kurdistanê hatin kirin, dîsa di herî pêş de meşiyaye. Tevî bi Kurdî nizanîbû jî ev di xebatên xwe de wek astengî nedît. Li Kurdistanê di nav xebateke zêde û pêl bi pel de bû. Di pêşxistina xebatan de westîn, destgiranî û dudilî tune bû. Ew tevger e, coş e, çalakî ye. Ew taybetmendiyên Kemal hema ji aliyê hemû derdorên çep dihat zanîn û naskirin. Ezm û xwesteka têkoşînê ya di Kemal de, hemû birûskên dijmin kişand ser xwe. Xewna bi tirs a mêtinkaran bû. Ew bi qasî çalakvanekî mezin bû, ajîtorekî bi heybet, propagandarekî çalak û rêxistinkarek e jî. Lê bêguman taybetmendiya wî ya herî mezin ev e ku mirovekî çalakiyan e.

Li cihê ku Kemal lê her tişt diket nav tevgerê. Ruhê wî yê di qalibê xwe de hilnayê her kesê li derdorê radikir ser piyan. Her gava diavêt vediguherî çalakiyeke nû. Cihê Kemal, li cem qutifandin û tunebûnan nîn bû. Li cihê lê te digot qey bager heye. Û

wê bagerê mirov û milîtan digirt nav xwe û bi xwe re dibir. Coşa ji Kemal çiya, kevir, her tişta bi can bêcan dimeşand, dikir nav tevgerê. Di kesên li cem xwe rabûneke ruhî ya mezin û xwe dîtina di nav atmosfera şoreşê de dida jiyîn.

Ji ber van taybetmendiyên xwe Kemal, li Kurdistanê efsaneyek e. Kesayeta pêwîst e ya şoreşê be, ya gelê me lê digere û mirovê dozê ye. Xebata Kemal a demkurt lê zêde ya li Kurdistanê tiştên kirin têr kir bibe hedefa dijmin. Sala 1977'an dema çû Enqereyê bi çekê hat girtin, şandin Girtîgeha Kizilcahamam. Ji bo ji wir bişînin Ordu-Ûlûbey hewldan hatin kirin. Di payîza 1977'an de hat revandin.

Piştî reviya vegeriya Kurdistanê. Û Kemal bi kesayeta xwe ya têkoşer a kesî nikarîbû pêşî lê bigire, bi hemû leza xwe ket nav şer û pevçûnan. Sala 1978'an ji nû ve hat girtin. Ev zêdetir dewam kir. Ji Girtîgeha Rihayê ji aliyê partiya me ve hat revandin, payîza sala 1979'an Kemal dîsa di nav şer û pevçûna bênavber de bû.

Kemal derket derveyî welêt, ji bo taybetmendiyên xwe yên fermandariyê pêş bixe, perwerdeya xwe ya leşkeri-siyasî dewam kir. Bi Rêbertiya Partiyê re li ser plansaziya dema nû û amadekariyên wê xebitîn. Bi wezîfeya rêxistinbûna leşkerî û rêxistinbûna şerê gerîla vegeriya Kurdistanê.

Li welêt li herêmên me xebat dimeşand digeriya, ji bo hêza me bibîne û rewşê fêm bike bi tempoyeke zêde dixebitî, rêxistin dikir. Hê sala 1978'an li hemberî Silêmaniyan li Hîlwanê li ser amadekariyên têkoşînê û rêxistinbûnê Kemal hebû. Û di nav êrîşa yekemîn a li hemberî serçeteyan de cih girtibû. Kurdistan nas kiribû. Dizanîbû wê tevgera me li ku derê xurt bibe, li ku derê em ê bi astengiyan re rûbirû werin. Di vê dema ku xebat dimeşand, di nav pevçûnên zêde de tê Siwêregê, mudaxeleyên destpêkê dike. Dema di nav wan xebat û rêxistinbûnên zêde de ye û bi demê re di nav pêşbaziyekê de ye bêşensî careke din xwe bi stûyê wî ve digire. Di Tebaxa 1980'ê de tê girtin. Dema dibîne kontrola rê heye ji ajokarê wesayîtê disekinîne re dibêje ku dewam bike û bi lez nuqteya kontrolê derbas bike. Wesayîta

têde servekirî ye. Dema ajokar bi lez diçe ji wesayîtê dikevin. Û bi hevalê din ê li cem dikevin erdê ji ser hişê xwe diçin. Leşker tên dema ew ne li ser hişê xwe ne wan “digirin!” Kemal di lêpirsîna polîsan de tevî îşkenceyên giran jî demeke dirêj qebûl nake ku Kemal Pîr e. Lê dema nasnameya wî îspat bû, got: “Belê ez Kemal Pîr im, lê ez ê îfadeyê nedim we.” Û di lêpirsîna polîsan de berxwedana xwe ya bi heybet pêş xist.


Ji ber me behsa jiyana Kemal a li Girtîgeha Amedê kir, em li vir behs nakin. Ew, pêvajo bi xwe ye. Herikîna ber bi erêniyê ye, berxwedan e, şoreş e, navê bawerî û meşa ber bi pêşerojê ye. Di Kemal de guman û hesabên şexsî tune ne. Meşvan û milîtanê demdirêj ê sosyalîzmê ye. Li Amedê jî tenê PKK, şoreşger-demokratên din hurmet nedidanê, dijmin bi qasî ku ji biryardariya wî nefret dikir û li hember nasnameya wî ya berxwedêr xwedî kîn bû, di nav hurmeteke venedişart jî de bû.

Di rojeke ku dema pêla îtîrafkariyê serê xwe digirt û diçû, Esat Oktay ji Kemal re got, “Patron, ez êdî ne bi masiyên biçûk, bi masiyên mezin re mijûl dibim.” Kemal jêre gotibû, “Dasiyên masiyên mezin mezin in, di qirika mirovan de dimînin!” Di berxwedana 1981’ê de faşîst Mevlut Çawîş got: “Kemal, eger tu di rojiya mirinê de bimirî, ez ê şûşeyekî mezin ê şerebê bigirim û li ber serê te bi qulteqult vexwim!” Kemal jî jêre got, “Eger ez bimirim, tu û yuzbaşiyê te Esat jî hûn ê ji cenazeyê min bitirsin û vir terk bikin.” Carekê Esat Oktay, li ber hucreya Kemal got, “Patron, Mazlûm xwe daliqand, tu jî bi ben xwe nadaliqînî?” Û benê ku seriyekî wî bi caxên hesinî ve girêdayî bû kişand qut kir. Kemal jî ev bersiv daye: “Ben nikarîbû te bikişîne, wê çawa min bikişîne?” Zarokê mezin ê proletaryaya Tirk Kemal, ji yekîtî û şoreşa gelên Rojhilata Navîn re di nav bawerî û dilsoziyeke mezin de bû. Timî diyar dikir ku wê bibe motorê PKK û şoreşa Kurdistanê. Baweriya xwe ya bi yekîtiya gelan ku bi jiyana xwe danî holê û ev li hember dijmin jî di anîna zimên de xwe qet paşde neda. Rojekê dadger Emrullah Kaya di rûniştinê de jêre got, “Tu Tirkî çi karê te di nav wan de heye?” Kemal got, “Bi van mirovan re fikra me gihişt hevdu, ez ne alîgir im ku

gel parçe bibin. Li ser esasekî azad gelê Tirk jî di nav de ez alîgirê federasyona Rojhilata Navîn im. Ji ber min ev di PKK'ê, vê xetê de şoreş û pêşeroj dît ez li vir im."

Gelên ku Kemal Pîrên enternasyonalîstê mezin ên di pira herî mezin a navbera gelê Tirk û Kurd de hatiye avakirin navê yekîtiyê ye derxistine û dane jiyîn ji sedî sed wê şoreşê bi dest bixin. Û gotin nikarin wan bînin zimên. Ew têkoşîn û şoreşa ku dijîn û bilind dibin.

**Akîf Yilmaz:**



Sala 1956'an li gundê Beşîktaş ê bajarê Erdexanê di malbateke xizan de çavên xwe li dinyayê vekir. Tevî xizaniya xwe jî bavê Akîf wî dişîne dibistanê. Kesayeta Akîf bi berteka li hemberî derdora lê mezin dibe tê strandin.

Di temenekî ciwan de fikrên şoreşgerî nas dike. Piştî ku PKK'ê xebatên xwe neqlî welêt kir, ekola rizgariya neteweyî ya hemdem nas kiriye û di demeke kurt de cihê xwe di nav refan de girtiye.

Durist û dilsoziya wî ya bi hevrêyan re mezin e. Ji dil hez dikir, dilsoz bû. Bi ser ketibû ku bibe yek ji mînakên bijarte yê bi her tiştê xwe, xwe fedayî gel, partiyê û şoreşê kiribû. Dixwend, lêkolîn dikir û bi birçîbûneke mezin dida pey zanînê. Bi jirtî, sedeqet, duristî, disîplîn û taybetmendiyên xwe yên din ên erênî yek ji hevalên me yê di nav têkoşînê de bal dikişand. Di demeke kurt de gihişt asteke ku wezîfeyên cidî werbigire. Ji bo Sekreteriya Herêmê ya Amedê ya Partiyê hat tayînkirin. Ji ber dema operasyon zêde bûn, deşîfre bû, li herêma Mêrdînê hat wezîfedarkirin. Havîna 1980'î dema çû Amedê hat girtin.

Akîf di dema xwe ya herî bi berhem de ket girtîgehê, di jiyana xwe ya girtîgehê de jî bi jîrtî, dilnizmî û disîplîna xwe hezkirin û hurmeta hevalên xwe qezenc kir. Di rojên girtîgehê de hem bi perwerdeya xwe hem jî bi ya hevalên xwe re mijûl bû, gelek wezîfe wergirt.


Taybetmendiyên bûyîna rêberê gel, meziyetên erênî di şexsê xwe de nîşan daye, ji bo serketina sosyalîzmê û têkoşîna rizgariya neteweyî bi baweriyeke mezin xwe bi pêşerojê ve girê dabû. Di serê wî de têkildarî serketina şoreşê teredûteke herî

biçûk jî tune bû. Ji “gelo”yan dûr bû. Ji ber mirovekî şoreşê bû yê ji bo serketinê derketibû rê. Û kedkarekî mezin ê wê şoreşê ye. Xwe bi her awayî tevlî şoreşê kiriye, bi jiyan û fikreke din re girêdaneke wî ya herî biçûk jî nemaye. Dilek bû yê ji bo partî, şoreş û sosyalîzmê lê dida.

Ji destpêkê ve li kursiyên dadgehê wek endamekî partiyê parastina siyasî kir, li hemberî dijminê mêtinkar, li kursiyên wê, bû dengê gelê me û şoreşê, zanîbû nirxên şoreşgerî temsîl bike.

Akîf ji destpêkê ve di nav berxwedana zindanê de cih girt. Akîf, ji bo partiyê jiyaye, wek endamekî partiyê zanîbû jiyana xwe bi rûmet pêşkêşî şoreşê bike.

**Alî Çîçek:**



Sala 1961'ê li gundê Karahaydar ê girêdayî navçeya Hîlwan a Rihayê ji dayik bû. Xwendina xwe ya navîn temam kir. Di wan salan de têkoşîna me li herêmê pêş diket. Alî, li Edeneyê ket girtîgehê. Li wir Kemal Pîr nas kir. Sempatiya wî ya bi PKK'ê re veguherî girêdaneke ku nayê qutkirin. Kemal ew pir bandor kiribû. Piştî ji girtîgehê derket êdî neferekî têkoşînê bû.

Alî pir ciwan bû. Lê bi cesaret û egîdiya xwe dihat naskirin. Xwedî kesayeteke paqij bû. Kîna wî ya neteweyî û çînî di asteke nedihat girtin de bû. Li Rihayê di belavkirina rêxistinbûna faşîst de bi awayekî aktîf cih girt. Çalakvanekî mezin bû. Di çalakiyên tevlî bû, li pey hevdu derbên mezin li rêxistinbûn û derdorên sîxur û faşîst da. Dawiya 1979'an hat Hîlwana pevçûn lê dijwar bûn. Kesayeta xwe ya milîtanî li wir bi awayekî herî baş pêş xist. Dîsa ji bo hin çalakiyan hevalan ew şand Rihayê. Û li Rihayê hat girtin. Jiyana partiyê ya Alî ya li derve pir kêm e. Lê yek ji mirovên çalakî û tevkariyeke mezin di wê dema kurt de bi cih kir.

Dema ket destê polîsan, tevî agahiyên li hember û îşkenceyên giran jî tu tiştek qebûl nekir. Îfade neda, di îşkenceyan de bi awayekî layiqî şoreşgerekî helwesteke bi rûmet nîşan da.

Jiyana wî ya girtîgehê jî mînak e. Her çi qasî teoriya Marksîst bi kûrahî fêr nebû jî, ruh û cewhera wê di navenda jiyana xwe de bi cih kiribû. Bi xwesteka fêrbûnê tijî bû! Timî dixwest xwe perwerde bike. Dilsoziya wî ya bi partiyê û hevrêyên wî re, sedeqet û hezkirina wî bêsînor bû. Wî şêwazê jiyaneke cuda di fikra xwe de kuştibû. Qet nefikirî ji derveyî jiyana partiyê jiyanek heye û mayîna li wir qet nefikirî. Bi ka-

milbûn, pêkhateya xwe ya berxwedêr û cesareta xwe ji aliyê hemû hevalên xwe ve dihat hezkirin. Ji ber taybetmendiyên xwe yên bijarte cihekî wî yê taybet li cem Kemal hebû. Xeyrî digot: “Alî stêrka sor a partiya me ye. Layiqî her cure eleqetê ye.”

Li girtîgehê jî bi kesayeta xwe ya milîtan û berxwedêr li herî pêş bû. Di nav hemû berxwedanan de cih girt. Gelek caran diyar kir wê di her çalakiya ji bo şikandina zincîra teslîmiyetê de cih bigire. Û di Rojiya Mirinê ya Mezin de mîna biçe dawetê ber bi mirinê ve beziya. Di vê maratona bi zehmet a weke rojiya mirinê de bi rûmet li pêş bû.

Alî di şoreşê de guleyeke gel e yê li ber luleya çekê ye. Rêbertiyek û gelekî xwedî zarokên wan ên bi qîmet ên timî wer amade hene, kî dikare li hember serketina wan bibe asteng? Alî li Kurdistanê bilindahî û teyrê şoreşa Kurdistanê ye.

“Demeke wiha ye ku diviyabû ji sedî sed gavên diyar bên avêtin… Jixwe şêwazên çalakiyê jî têra bi heybet bûn. Di wê nuqteyê de Mazlûm peyameke. Ferhat Kûrtay, Necmî Oner, Mahmût Zengîn, Eşref Anyik (Çaran) şoreşa alê ne. 14‘‘ê Tîrmehê tê maneya mirov pêvajoyê vediguherîne marato-nekê.”

Muzaffer Ayata